

K.T.  
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

ÇIROKA KURDÎ YA HONERÎ PEYDABUN Û WERAR LI DESTPÊKÊ TA SALA  
1939

TEZA LÎSANS A BILIND

Amadekar

Karzan farhan SORI

Şêwirmend

Öğrt. Üyesi Kemal KAYE

VAN - 2019

T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

BAŞLANGIÇTAN 1939 A KADAR KÜRTÇE SANATSAL HİKAYESİNİN  
OLUŞUM VE GELİŞİMİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Hazırlayan

Karzan farhan SORI

Danışman

Öğrt. Üyesi Kemal KAYE

VAN - 2019



T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA danışmanlığında, Karzan Farhan Sori SORİ tarafından hazırlanan “Çiroka Kurdî Ya Honerî Peydabun û Werar Li Destpêkê Ta Sala 1939)” adlı bu çalışma, 20/08/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

**Başkan(Danışman)** : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza: .....

**ÜYE** : Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ

İmza: .....

**ÜYE** : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

**ÜYE** : .....

İmza: .....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

  
Dr. Öğr. Üyesi Nesrin SÖNMEZ  
Enstitü Müdür Vekili

**KURTE**  
**ÇÎROKA KURDÎ YA HONERÎ PEYDABUN Û WERAR LI DESTPÊKÊ TA**  
**SALA 1939**

Çîroka honerî yêk ji layenên pexşana edebî ye ku weke janreke edebî yê serbixwe di nava wêjeya cîhanê de tê naskirin, honereke taze û binirx e û li hemî dinyayê de girîng tê dîtin. Pirsê bingehên a vê lêkolînê ew e ku gelo çîroka honerî ya Kurdî ji kengî pê ve û li serkêşîya kê dest pê dibe? Ev vekolîn bi rêbaza wesfî, şîrovekarî û dîrokî asta çîroka Kurdî ji hêla honerî ve ji destpêkê heya sala 1939an dîyar dibe û hewleke zanistî ye ji bo dîyarkirin û hilsengandina berhemên çîroka honerî ya Kurdî.

Lêkolerî hewl daye ku çîroka honerî ya Kurdî bi rengekî gelemperî bide naskirin û serhildana vê di nava gelê Kurd de û her wisa geşedanên vê di qonaxên hestîtyar de bide nîşandan. Di çarçoveya vê xebatê de mirov digehe vê encamê ku çîroka honerî di wejeya Kurdî da xwedî ciheke girîng e û li gor siruşt û pêdivîyên civakî, siyasî, aborî û hwd. yê jîyana hevçerx, xwe pêş dixe. Her wisa karîya bi borîna serdem û qonaxan, bi têgeh û çarçove û teknîkeke nû, cihê xwe di nava meydana wêjeyî da xurt bike û bigîştî mirov dikare bêje ku li gor daneyên vê lêkolînê janreke serkeftî bûye.

**Peyvên Sereke:** Çîrok, Çîroka Honerî, Wêjeya Kurdî, Kovar, Rojname, Werar.

## ÖZET

### BAŞLANGIÇTAN 1939 A KADAR KÜRTÇE SANATSAL HİKAYESİNİN OLUŞUM VE GELİŞİMİ

Sanatsal hikaye dünyanın en bağımsız branşlarından biri olarak bilinen nesir edebiyatının bir türüdür. Bu hikaye türü tüm dünyada modern, değerli ve ilgi çekicidir. Bu araştırmanın temel sorusu; Kürt sanatsal hikayesi tam olarak ne zaman ve hangi liderliğin altında başladı? sorusudur. Bu çalışma betimsel, analitik ve tarihi çalışmalarla Kürt sanatsal hikayesini başlangıç tarihinden 1939 yılına kadar ortaya koymaktadır. Bu çalışma Kürt sanatsal hikayesinin eserlerini\çalışmalarını ortaya çıkarmak ve değerlendirmek amacıyla yapılmış bilimsel bir çalışmadır. Araştırmacı, Kürt sanatsal hikayesini genel anlamda ve kökeni olan Kürt toplumu içerisinde tanımlamaya çalışmasının yanısıra Kürt sanatsal hikayesinin gelişimlerini ve tecrübe ettiği hassas dönemlerini tanımlamaya çalışmıştır. Bu çalışma çerçevesinde bizler Kürt edebiyatında Kürt sanatsal hikayesinin modern hayatın sosyal, politik ve ekonomik vb. olgularına göre önemli bir yere sahip olduğunu ve önemli gelişmeler olduğunu çıkarabiliriz. Geçen yıllar ve dönemlere rağmen Kürt sanatsal hikayesi modern sanatsal hikaye alayışından ve tarzından başarıyla geçebilmiş ve günümüz edebiyat alanında önemli bir şekilde varlığına devam edebilmiştir. Genel anlamda, bu çalışmanın bilgilerine dayanarak söyleyebiliriz ki sanatsal hikaye tarzı başarılı bir edebiyat alt dalıdır.

**Anahtar Kelimeler:** Hikaye, Sanatsal Hikaye, Kürt Edebiyatı, Dergi, Gazete, Gelişme

## **ABSTRACT**

### **KURDISH ARTISTIC STORY ORIGINS AND EVOLUTION FROM THE BEGINNING UNTIL 1939**

The artistic story is an aspect of literary prose, known as one of the world's independent branches. It is a modern, valuable and interesting art all over the world. The main question of the research is that, when did the Kurdish artistic story begin and under whose leadership it began? This paper, through descriptive, analytical and historical study, shows the Kurdish story from the beginning until the year 1939. It is a scientific attempt to show and evaluate the works of the Kurdish artistic story. The researcher tried to identify the Kurdish artistic story in general and its origin in the Kurdish society also its developments and the sensitive stages it experienced. Within the framework of this struggle, we conclude that the artistic story in the Kurdish literature has an important position and develops according to the social, political, economic, etc. of the modern civilized life. As well as over the stages and ages, it was able through a modern artistic concept and context to exist significantly in the literary field. In general, we can say that according to the data of this research, it is a successful subfield.

**KEY WORDS:** Story, Artistic Story, Kurdish Literature, Magazine, Newspaper, Development

## NAVEROK

<b>KURTE</b> .....	<b>I</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>II</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>III</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>VI</b>
<b>SPASÎ</b> .....	<b>VII</b>
<b>2 DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
2.1 RÊ Û RÊBAZÊN VEKOLÎNÊ .....	1
2.2 GIRÎNGÎYA VEKOLÎNÊ .....	1
2.3 SINURÊ VEKOLÎNÊ .....	2
2.4 ARÎŞA VEKOLÎNÊ .....	2
2.5 PIŞKÊN VEKOLÎNÊ .....	2
<b>3 ÇÎROKA HONERÎ</b> .....	<b>3</b>
3.1 NASANDINA Û PÊNASEYÊN ÇÎROKÊ .....	3
3.2 RGEZÊN (ÇÎROK)Ê .....	6
3.2.1 <i>Nav û Nişan</i> .....	6
3.2.2 <i>Babet</i> .....	7
3.2.3 <i>Kesayetî</i> .....	8
3.2.4 <i>Bûyer</i> .....	11
3.2.5 <i>Cih</i> .....	12
3.2.6 <i>Dem</i> .....	14
3.2.7 <i>Dîyalog</i> .....	15
3.2.8 <i>Monolog</i> .....	17
<b>4 ÇÎROKA HONERÎ YA KURDÎ</b> .....	<b>20</b>
4.1 PEYDABÛN Û WERARA ÇÎROKA HONERÎ YA KURDÎ .....	20
4.1.1 <i>Boçûna Yekem</i> .....	22
4.1.2 <i>Boçûna Duyem</i> .....	23
4.1.3 <i>Boçûna Sêyem</i> .....	24
4.2 DÎYARKIRINA YEKEM ÇÎROKA HONERÎ YA KURDÎ .....	26
4.3 TAYBETMENDÎYÊN ÇÎROKA HONERÎ YA KURDÎ .....	36
4.4 CUDAHİYÊN DI NAVBERA ÇÎROKA FOLKLORÎ Û ÇÎROKA HONERÎ YA KURDÎ DA .....	42
4.5 NUNERÊN ÇÎROKNIVÎSÊN KURD .....	52
4.5.1 <i>Fuadê Temo</i> .....	53

4.5.2	<i>Cemîl Saîb (1887-1951)</i> .....	57
4.5.3	<i>Celadet Elî Bedirxa (1893-1951)</i> .....	60
4.5.4	<i>Ehmed Muxtar Begî Caf (1896-1935)</i> .....	65
4.5.5	<i>Osamn Sebrî (1905-1993)</i> .....	69
4.5.6	<i>Pîremêrd (1867-1950)</i> .....	72
4.5.7	<i>Mihemed Elî Kurdî (1905-1957)</i> .....	80
4.5.8	<i>Wezîrê Nadirî (1911-1946)</i> .....	84
4.5.9	<i>Sîras (1902-1983)</i> .....	88
	<b>ENCAM</b> .....	<b>96</b>
	<b>ÇAVKANÎ</b> .....	<b>97</b>



## PÊŞGOTIN

Weke dîyar vê dawîyê rexneya edebî ya Kurdî giringîyeke taybet daye babetê çîrokê, lewra tê dîtîn ku çendîn lêkolînên cihêreng li ser çîroka Kurdî hatîne kirin û çendîn layenên çîrokê weke mijarên vekolînan hatine hilbijartin, weke layenên civakî, derûnî, sîyasî, aborî. Lê belê eger bi hûrgilî li wan vekolînan bê mêzekirin, gelek ji wan ji sînore çîrokê derkeftine. Sedemê vê çendê jî dîyarnekirina sînore vekolînê û her wisa dîyarnekirina mijareke taybet di derbate çîrokê de ye. Ji ber vê çendê jî me bi fer dît ku van xalên li jor berçav wer bigrîn. Di vê lêkolînê de ji bo cara yekemîn sînorek hatîye dîyarkirin (destpêk heya sala 1939an) û babet jî bi tenê “çîroka honerî” ya Kurdî ye, û dê vekolîn di vê derbarê de bi hûrgilî bê encamdan. Ji ber ku piştî sala 1939an guherînên berçav li ser çapemenîyê peyda bûn û tê dîtîn ku çendîn kovar û rojnameyên nû yên Kurdî derkeftin, mîna “Gelawêj, Ronahî, Roja Nû, Stêr û hwd.”.

Dema meriv di derbare çîroka Kurdî de lêkolînan dike, digehe vê encamê ku xebatên teng û agahîyên pir sinordar û hindik di ve derbare de hene. Lê belê dema em li ser mijara xwe xebitîn, em rastî daneyên balkêş û xebatên têkildarî çîroka Kurdî û her wisa çîroka honerî ya Kurdî hatin. Bêguman, divê em bînin ziman ev rewşa em behs dikin taybet e bi zimane u wejeya Kurdî u giringîya vê xebatê ew e ku me xebatên di li ser çîroka honerî ya Kurdî dane nasîn û her wisa rengvedana hizra wan di nava çîrokan û serdem û qonaxan têda hatîne nivîsanidîn.

Ji bo vê xebatê me ji çavkanîyên zimanê Kurdî, Erebî, Turkî û Rosî mifa wergirtîye. Her wisa ji bo vê xebatê me çavkanîyên xwe ji Rojname, Kovar, malperên Kurdî û pirtûkên pertûkxaneyên zanîngeha Akrê, Duhokê, pertûkxaneya Bedirxanîyan, pertûkxaneya Umer Meruf Berzincî girtîye.

## SPASÎ

Ez bi vi awayî rêz û pêzanînên xwe digehîname guhê hemî wan kesên ku bi dilnizmî û mezinatîya xwe di heyama nivîsînê vê lêkolînê de alîkarîya min kirin. Di nav wan de jî birêz Kemal Kaya mamosteyê şêwermend, Birêz Remezan Hacî û hemî yên din.

Her wisa bi dil spasîya dayik û bêvên xwe dikim ku hertim piştevanên min bûne, û spasî û pêzanînên xwe tînim ziman ji bo hevjinê xwe ya delal ku ji roja destpêka hevjinîyê pê ve hertim bi fedakarîyên xwe rêxweşkerê serkeftinên min bûye.

Di dawîyê de spasîya wan hevalan dikim yên Silêmanîyê, Duhokê û Akrê û Wanê alîkarîya min kirin.

## 1 DESTPÊK

Çîroka honerî ya Kurdî ligel borîna demî û peydabûna azadîya raderbirînê û pêşketina çapemanîyê (rojname, kovar, pirtûk) karîye peş bikeve û têgeh û formên nû kevtine nava vê janra wêjeyî da. Çîrok girîngtirîn û karîgertirîn cûreyê wêjeyê ye di cîhanê de, vegutina bûyerekê ye bi rêya devkî an nivîskî tê derbirîn. Çîrok bûyeran bi kurtahî û bi hûnandineke hêsan û bi zimanekî xweş tînine ziman. Di çîrokê de bahsa bûyera tê kirin. Ew bûyer yan ew rewş jî bi merivan tê girêdan, cih û demê bûyerê bi renekê balkêş tê danan û bala meriv bi alîyê xwe ve dikêşe. Çîrok di dîrokê de li koçk û dîwanan hatîye gotin, lê çîroka honerî çavkanîya xwe ji hizra nivîskarî digre. Ev awayê çîrokê di sedsala 19an de û di dema romantîzmê de dest pkirîye û li Ewropayê bi reneke nûjen derketîye holê. Çîroknivîsên mîna (Ogel, Dostoyevsky, Chekhov û hwd.) di pêşketina çîrokê de cih girtine û di edebîyatê de roleke girîng hebûne lê di wêjeya Kurdî de Fuadê Temo bûye pêşengê çîroka honerî ya Kurdî.

### 1.1 Rê û Rêbazên Vekolînê

Ev vekolîne bi rêbazên “Wesfî, Şilovekarî, Dîrokî” hatîye nivîsandin.

### 1.2 Girîngîya Vekolînê

Girîngîya evê vekolînê di van xalên xîwarê dîyardike:

Çi vekoleran vekolîn li ser vî sinorê dîyarkirî nekirîye, çuki piştî vîserdemî gorankarîyên mezin bi ser çapemanîyê da hetine, û çîroka honerî jî jivê çendê ya bê behir nebûy, lewma dibînîn cudahîyeka mezin dinav bera van herdû serdeman heye.

Êncam dana van cure vekolînan girîngîyeke taybet ji bûy edebîyata Kurdî heye, ji ber ku bi rêya evan vekolînan em dikarîn bi gehîne hinek ençam rast û dirost li ser çîroka honerî ya Kurdî.

Girîngîyeka berçav ewe ku dêbîte çavkanî bu pertuk xaneyê Kurdî.

### **1.3 Sinurê Vekolînê**

wekedîyar dinava vekolînêda peydabûn û werara çîroka honerî li destpêkê heta sala 1939 zaynîye, evnave hatîye danan daku destpêka vî honerî bizanîn û sala 1939 hatîye danan, ji berku biştfî vî serdemî bi şêweyeke bilez gelek rojname û govar yên nu zêde bûyne, evçendejî dizivrîteve ji bû pêşveçûnên çapemenîyê, lewma piştî vîserdemî ev janere roj bû rojê pêşveçûn bixove dîtîye.

### **1.4 Arîşa Vekolînê**

Arîşa hatîye rêyamede kêma bûna çavkanîya bû li ser paydabûn û janerên wê û bizehmet dest xistinawan wan çavkanîyên liber destême, dîsan jêkve qetîyana milletê kurd û her perçeyaka kurdan dibin desthelateke zordar dabû eve jî bu egerê dûrbûna peywendîyên kurdan.

### **1.5 Pişkên Vekolînê**

Ev vekolîne ji bilî kurte û naverokê û pêşgotinê û destpêkê û spasî û encaman û çavkanîyan ji dû beşan pêk dihêt.

Beşa yekê pêk dihêt ji nasanidin û pênaseyên çîrokê. Û lidîvda regez û binemayê çîrokê dihên ewjî ji heşt binemaya pêk dihêt.

Di beşa dîyem da peydabun û werara çîroka honerî ya Kurdî hatîye dîyarkirin digel sê boçunan. Û biştra dîyar kirina êkem çîroka honerî ya Kurdî hatîye dest nîşan kirin. Disan taybet mendîyên çîroka honerî ya Kurdî dîyar bûyne. Herweha cudahî di navbera çîroka foliklurî û çîroka honerî hatîye bahiskirin. Ya herî dûmahîyê danana janerên çîrok nivîsên Kurde ku ewjî ji neh kesan pêk dihêt.

## 2 ÇÎROKA HONERÎ

### 2.1 Nasandina Û Pênaseyên Çîrokê

Peyva çîrokê di Kurdî de li hember peyva Îngîlîzî ya “story” ê tê bi karanîn (Selam , 2006; 61). Peyva çîrokê yan dîsa peyva qise jî tê nivîsandin (Duskî, 2008; 710). Weke peyva ferhengî, tê wateya bûyerên derasayî û jê wergirtina pêzanînan û veguhastina wan pêzanînan bo kesên dî. Çîrok berevajî her cureyeke din ya edebî zêdetir di nava wan gelan da girîngî pê hatiye dîtin ku tyekiliya wan bi rojname û kovaran çêbûye û ji ber vê yekê jî peydabûna cureyeke din ya nû bo wê çendê ye ku nivîskar di nava sînorê wê yê berfireh de dikare bi gelek şêweyan berhema xwe binivîse.

Çîrok bêguman yek ji wan cureyên edebî ye, “çîrok li Roj awayê di sed sala hijdehem de derketiye wate çîrok xwedî mêjûyeke kurt e bi berawird cureyên din ên edebî yên wek helbest û şanoyê” (Abdialla, 1986; 65). Lêkolîna li ser vê cureyê tiştekî hêsan nîne. Çîrok xwedî çend taybetmendiyên cuda ye bi berawird cureyên din yên edebî. Her wiha çîrokeke ku hatiye nivîsîn ger hemû taybetmendiyên vegêrana çîrokê tê nîn be ew çîrok weke çîrokeke serkeftî nayê dîtin. Hemû cureyên edebî xwedî taybetmendiyên cuda ne û li gor van taybetmendiyên xwe cih digrin û têne nivîsîn. Weke gelek têgehên têgehên çîrokê jî di mijara pênaseyeke tekûz û giştî de lihevkirinek nîne. Gelek çîroknûs, nivîskar û lêkolîneran hewl dane bo wê çendê ku pênaseyeke yekgirtî bo vê cureyê bi ken. Berevajî lêgerîn û lêpîrsîna bo pênaseyê hinek lêkolîner jî dibêjin dema ku çîrok hate pênasekirin sînorên wê tê tengkirin û gelek hêmanên têkildarî wê li derveyî pênaseyê dimînin. “Me nevê bi wê yariyê dest pê bikeyn ji ber ku bi dîtina me ew e ku pênasekirin bidawîanîna piroseya hizirkirinê ye, neku dest pyekirina piroseyê” (Îsmail, 1980; 179). Ev e jî ji ber wê yekê derdikeve ku “dema berê xwe didim karê çîrok nivîsandinê dibînim ku ji çend bûyerên biçûk û bi jimare zêde û gelek azmûnên cur be cur pyek dihên û ev jî madeyeke rasteqîn e û pyekhata wî karê ji edebî pyek tine” (Îsmail, 1980; 180). Dîsa çîrok ew honer e yên gelek bi giryek û yên zêde ciwan jî her di wê demê da, bûyereke bi zimanekê edebî tê vegêran. Çi bi gotin, çi jî bi

nivîsîn û wekî dîyar bûye ku armanc jê mifa gihandin e yan jî peydakirina xweşîyê ye bo xwîneran.

Pênaseya çîrokê ji hêla hindêk lêkolîner û nivîskaran hatîye kirin, “pêktê ji formeke honerî ye ku hemû çalakîyên mirovî tê da dihête berceste kirin ku ji hikayetê hatîye wergirtin vêca ev forme helbest yan pexşan be û fikra nivîskarî pê ve girêbide, vêca li hemû çîrokê yan beşekî” (Xalid, 1986; 69). Di ve pênaseya jor de mebesta nivîskarî bi awayekê ron li ber çavên xwîner nîne, dikare were gotin ku hemû hikayet bo helbesta çîrok helgir û hikayeta millî û efsane û çîroka remzî polîn bi ken û weke honerê çîrok nivîsînê bi nav bikin. Her wiha Mihemed Yusif dibêje “çîrok pyek dihêt ji vegêrana çend li serhatîya û bûyeran ku nivîskar bi awayekê honerî dinivîsit û pêşkeş dîke û ji hêlyê dirust bûnê jî dibêje çîrok bûyereke endêşe dirust dîke” (Yusif, 1976; 24-30). Wate em dikarin bibêjin ku çîrok çarçoveyeka honerî ye, şewaza wê zimanê pexşanê ye ku bi rêya vegêranê digehe guhdêr yan jî xwînerî. Ango komek regezên serekî û lawekî pyek tê. Nivîskarê Îngîlîz Charlton Heston li ser çîrokê dibêje “eger tu bi awayekî rasteqînî teswîr neke, ev çende nabîte honer” (Xalid, 2010; 10). Bi derbasbûna demê û li jêr kartyekirina regezên din yê honerê, çîrokê çendîn rengên din bo xwe girt. Dîsa çîrok alîkarîya mirovî dide li têgehiştina wî li xwe û dewrûber û cîhana wî û hest û siruştê dewrûberê wî, çikû “çîrok pêkhatîye: li vegêrana komeleke bûyeran bi rengê honerî, ku bûyereke yan çend bûyerên jiyane yan yê siruştî dîke ji bo balkêşandin û livandina hestê ciwan yê rehmê ji bo lyekdanê guhdarî yan xwînerî beramber jiyane” (Hewramî, 2005; 67). Çîrok beşdarîyê dîke li temam kirin û pêgehandina fikra kesî, bêyî ku serçawê naverokê ku alîkarîya mirovî didet li ser rûbirûmayîna kêşeyên mezin yê jiyane, çîrok “nivîsîneke bi şeweyê pexşanê, bi merema gehandina xweşîyê û roşenbîrkerîyê, wate bi vegêrana çend bûyeran, ku li serê çend kesên dîyarkirî tîn û têper dibin, li dem û cihêkî dîyarkirî” (Resul, 2005; 21). Çîrok xwedî peywendîyeke bi hêz e digel hevokên zarekî û nivîskî, nêzîktirîn honerê edebî ye, li derunê mirovê biçûk û mezin wek hev e. Her wiha nimûneyeka perwerda girîng e bo fêrbûna zimanî, beşdarîyeka mezin dîke bo araste kirin û hewldana çandina rewîştê baş û ciwan. Dîsa Enwer Mihemed di derbarê çîrokê de dibêje; “ez berê xwe didemê mîna karekê afirandî

ku çend demekê kurte çîroknivîs dikare bûyerek mezin tê da tomar bike, ew jî dimîne bo şîyan û bizavên çîroknivîsî çawa vê bûyerê vedigêre û montaj bike, filaşbakê bikarbihîne” (Xalid, 2010; 13). Dîsa dihête pênasekirin ji aliyê Sebih Mihemed ku çîrok “derbirîneke ji delîvên veqetîyayî, revîneke ji cîwarên bi rast berev cîwarên çyekirî û endêşeyên berdiryayî, girtina wan delîvaye yê li berçavên hemûya ye û kes nebîne, bezandina hêlên sor bi dizî ve, derfeteke bo wan tiştên neşên hergav xwe dîyar bi ken, çîroka bi rast ew e ya ku bi kutekî wextê me li ser difname ji me distîne û .... Hwd” (Xalid, 2010; 113).

Bi awayekî din li ser pênaseya çîrokê hatiye gotin ku “çêkirina serboriyekê yan jiyaneke ye di fikra hatiye wergirtin da, ne dûre bipirsin çawa? Çîroka honerî bi çî zimanî were nivîsîn (kolankî, çapemenî, zanistî,...) pêdivî ye sitûnên serekî yê serboriyekê yan ezmûnekê tê de hebin, bi vê yekê re çîrok dibe jiyaneke yan serboriyeka rastî, paşê pêdivî ye çîrokê naverokek yan erkek hebe, bi gotineka dî, çîrok hemû peyamekê yan maneyekê derdibire, da bikare cihekî li nav fikra wergirî bigre, da ku bibe gîyaneke serbixwe zîndî li nik wergirî û dê çîrok têr û tijî be, heger her du astên wê yê serekî, ziman û yê fikrî naverok pyek ve guncaw bin” (Fazil, 1997; 13-20). Em dikarin bibêjin ku çîrok teknîkeke vegêranê ye ku bi şeweyê pexşan tê nivîsandin û çîroknivîs bûyereka jiyaneke û di jiyana xwe da yan fikra xwe da diazîrîne bi rêya vegêranê ew bûyera ku çîroknivîs di jiyana xwe da polîn kirî çî ya xoş be yan ya nexoş be bi rêya teknîka vegêranê dide ber çavên guhdarî yan xwînerî û her dem ya di geşbûnê û berev pêşveçûnê da, ev e jî sebaba gehandina peyama û mebesta sereke ya çîrokê ye.

## 2.2 Rgezên (Çîrokê)

### 2.2.1 Nav û Nîşan

Bi rengeke giştî, di zimanê Îngîlîzî de beramber peyva “Address” ê çend peyvên cuda têne bikaranîn mîna, topic, seed (Selam, 2006 ;244). Lê di zimanê Erebi de peyvên al’inwan, ‘inewin (Duskî, 2008; 607) tèn bikaranîn. Di zimanê Kurdî de peyvên nav û nîşan, nav û nîşan, tewer an jî serenav têne bikaranîn.

Hilbijartina nav û nîşanê ne kareke hêsan e lewre divê bi şêweyê pisporane û balkêş çîroknîvîs nav û nîşanê bo babatê çîroka xwe hilbijêre, çikû nav û nîşan rolekê girîng dibîne bo xwînerî û guhdarî bi taybetî jî nav û nîşanê guncaw û karîger ji ber ku handanê çê dike bo xwînerê wê çîrokê heta ku xweşîyê jê werdigire. Di derbarê pênasekirina nav û nîşanê de “nav û nîşan semboleke zimanevanî ye, li beramber metnê de cihê xwe digire, heta ku hindêk fermane cîbicî bike ku taybetin bi ontolojîya metnê û naveroka wê, li çarçoveyê komelayetî rewşenbîrî ku taybet e bi wê nivîsîna hatîye nivîsîn. Li ser vê binemayê jî nav û nîşan pyek tê li navlyekirin û pênasekirinê û aşkerakirina metnê û pyek tê ji semboleke efsûnî ku fermanewê rênûma kirinê û di navbera cîh û metnê da lenger digre. Heta ku bibe ew xala destpyekê li wê rêyê da metnê derbaz dibe nava cîhanê û cîhan jî bo nava metnê, bi vê yekê sînorê navbera wan namîne û dikevine nava hev” (Sebrî, 2010; 119-120). Ango merc e “nav û nîşan rengvedanek be ji naverokê re.. pêdivî ye ji fikra naverokê re nebe ravekirin.. gerek ji bo xwîneran balkêş be” (Bavê, 2012; 182).

Nav û nîşan pyek ve girêdanekê xwert bi wergirî û metnê ve heye, yek ji regezên girîng e di nav berhemê edebî de “heta radeyekê dikarin bibêjin ku nav û nîşan yeksanîya metnê radigere, bi nebûna yeksanîyê re ew têk diçe” (Sedîq, 2009; 150). Ew nav û nîşanê li ser bergê metnê yan çîrokê were nivîsîn, nîşan û maneyê li ser çîrokê baştir ron dike û wergirî zêdetir bi xwendina wê metnê ve girêdide. Her wiha “nav û nîşan bi dîtina simakaran şergehê metnê edebî ye, dêm bingeha metnê ya li ser dihêre ristîn û dibe perjan” (Osman, 2010 ;56). Di vira de xweya dibe ku binyadê her metnekê



li ser navunîşana wê ve tê dîyarkirin û avakirin. Di heman demê de “nav û nîşan çi qiyametê xwe bê metnê nîne, çikû vegêrana çîrokê kartyekirin e li ser dariştina deraziînkana nav û nîşanê heye, pêdivî ye kartyekirin û pyek ve girêdanek di navbera regezên vegêranê û nav û nîşanê de hebin” (Alibêdî, 2012; 20). Dema ku nav û nîşan di têgeha edebiyata tê nivîsîn, komeleke erkên girîng hene. Di derbarê vê yekê de Gerard Genet çar erk destnîşan kirî ye:

1. Erkê destnîşan kirinê ku naverokê bi awayekî cuda di dete berhemê û pê tê nas kirin.
2. Erkê saloxdanê ku girêdayî naveroka berhemê yan cureyê wê ye yan girêdayî her du hêla bi hevra ye yan jî bi awayeke şêlû giredayî naverokê ye.
3. Erkê bi xwevegirtinê ku girêdayî erkê saloxdanê ye her wiha bi rê û şewazê nav û nîşanê berhamê ve girêda ye.
4. Erkê balkişandinê yan serdabirî jibu balkêşana girêdana xwînerî bi berhemû ve (Zeytunî, 2002; 126).

Ji bilî nav û nîşanê sereke yê metnê çend cureyên din jî hene ku Gerard Genet wan wiha diyar dike mîna:

1. Nav û nîşan, ango nav û nîşanê sereke û bineretî ye yan jî tewerî ye.
2. Nav û nîşanê tayî, ango nav û nîşanê ne serekî (subtitle).
3. Destnîşankerê cureyî.
4. Her wiha ji bilî van cureyan hindêk lyekoleran cureyeke dî bi navê “nav û nîşanê navekî” zêde kirîye (Tahir, 2009; 88-96).

### **2.2.2 Babet**

Di bineret de peyva babet, di zimanê Îngîlîzî de “subject” tê bikaranîn (Selam , 2006; 16). Lê di zimanê Erebî de peyva “almuzu” (Duskî, 2008; 934) û di zimanê Kurdî de peyvên wek babet, mijar tene bikaranîn.

Babet regezê karîger e di nava çîrokê de û dikeve xizmeta hemû regezên din û dikarin bibêjin ku babet bi gîyanê peyv û kakilka wê axaftinê ye ya ku nivîskar metna çîrokê di maweya niwandina çîroka xwe de diselmîne. Qonaxa bidestxistina babetê, bi qonaxa fikr û vekolîna nivîskarî tê hejmartin. Dikarin bibêjin ku di rastîyê de “babet ew tovê destpyekê ye ku li erdê mejîê nivîskarî de tê çandin û çîroka wî li dû vî tovê destpyekê ku şîn dibe û geşe dike” (Hesen, 2011; 40-39). Wate babet bi hêsanî nayê nivîsandin weke nivîskarê dîyarkirî tovê destpyekê ye ku li ser mejîyê mirovî tê çandin bi maneya wê tê ku baştirîn peyv û riste ne di nav mejîyê mirovî de peyda dibin. Vêca babet hêz û şîyanê nivîskarî jî dîyar dike, fikra babetê çîrokê ew jî dîtînen çîroknivîsî ne di derbarê pirsgiryekên jîyanê ku xwîner li dumahîyê bikare hizrê ji wî babetî werbigre. Ji hêleke din ve nabe ku çîroknivîs pirsgirêyan pêşkeşî xwînerî bike, ji ber ku di dawîyê de ji hêla civakî ve pirsgiryek dê jê ra peyda bibin. Çîroknivîs babetên xwe ji nav van xalan hildibijêre:

1. Azmûna nivîskarî, nivîskar dikare babetên li ser derûn û rewîşt û xwestekên mirovan di civakê de hildibijêr e.
2. Azmûnên kesên din, ku nivîskar li ser mijarên civakî raweste û hêlên rexne şîrovekirinê berbiçav bike.
3. Ji dîrokê, di vî warî de nivîskar xebata gelan, bûyerên niştîmanî û sîyasî di nav mijarên xwe de hembêz bike.
4. Rewşenbîrî, nivîskarê rewşenbîr mijarên fikrî û felsefî biafirîne. Belgename (Berwarî, 2010; 315).

### 2.2.3 Kesayetî

Di binecîh de peyva kesayetî, “persona” ye ku bi zimanê Latînîya kevn bi maneya maske dihat bikaranîn, li cem Girekî û Romanîyên kevin bo peyva maske hatîye bikaranîn. Di zimanê Îngîlîzî de peyva “personality” tê bikaranîn (Al Helaq, 1999; 33-34). Dîsa di Îngîlîzî de peyva “character” bo kesayetî hatîye bikaranîn (Reşîd, 2016; 123).

Di zimanê Erebi de peyva “alşexsiye” tê bikaranîn. Beramber vê peyva Erebi jî di Kurdî de peyva “kesayetî” her tê bikaranîn (Duskî, 2008; 56).

Kesayetî regezek e ango binemayek e herî girîng û bineret e di çîrokê de tê hejmartin, ji ber wê yekê ev tewera wê çîrok li dor dizivire. Bikerê her kiryarekê û bûyereke ye di çîrokê de. Di pênasoya kesayetîyê de hatîye gotin: “kesayetî jî hevpişikdareke di bûyerên çîrokê de vêca çi bi şeweyeke erênî yan nerênî be, lê ew ra kesayetîya pişkdariyê di bûyerê de neke ji kesayetîyên çîrokê nayê hejmartin, belku wekî pişkdarek ji saloxdanê tê hejmartin” (Zeytunî, 2002; 113-114). Yanê bi wê manê tê ku kesayetî û bûyer temamerê hevdû ne û du regezên herî girîng in û bineretin di pyekhatina avahîye her çîrokeke honerî.

Dîsa kesayetên serekî, ew kesayetin ku girîngtirîn rol di çîrokê da dileyzin. Kesayetên duyem jî, ew kesayetin yên di çîrokê de alîkarîya kesayetên sereke dikin, yan jî bûyerên bi hev ra didin, li dû vê yekê jî Edwin Muir di derbarê vê yekê de wiha dibêje” sîfatê diyarker yê kesayetiyetîyan, bûyer destîşan dike, bûyer jî di rola xwe de kesayetîyan diguhere û girîngîyê pê dide” (Nihêlî, 2007; 133). Regezê kesayetîyê peywendîyeke bi hêz heye bi hemû regezên din ve, yên ku di nava çîrokê de ew regez mîna birbira pişta mirovî ye bo çîrokê, ku her regezek di nava regezên çîrokê li ser radweste. Bi hevkarîya kesî hemû pyekhênerên metnê çîrokê mîna (ziman, çih, .... Hwd) bi hev re têne girêdan, ji ber ku kesayetî ne zimanê çîrokê bi rêya dan û sitandinê dirust dikin. Her kesayetîne encamdan û gêrana bûyeran radibin û mîmilane û hevrikîyê di nava çîrokê de dirust dikin, yan bi rêya wan kiryar û reftaran û soz u arezuyên xwe ewên ku hevrikîyê zêde û mezintir dikin. Ji egerê evê çendê hatîye gotin ku: “çîrok honerê kesayetîyê ye”, ango ew cureyê edebî ye ewê kesayetîyên rasteqîne bi awayekî honerî bi xwîner û guhdaran dide naskirin ku bi hemî axaftin û kiryarên wan ve. Ji ber vê çendê xwîner yan guhdar bi awayekî zelal û rastgoyane xwe di nava çîrokê de dibînin û hest bi hebûna jiyanê digel dike” (Abdullah, 2005; 5).

Di nava çîrokên Kurdî de mîna her milletên din ên li dinyayê de, derdikeve ku çîrokên Kurdan, li ser çend mijarên herî girîng û pêwîst di nava civakê de peydabûye. Di

destpêka geşbûna çîrokê de weke pêwîstîyek ji pêwîstîyên civakê ew qonaxa tê de derbas bûyî , bi derbirîna hêvî û daxwaz û eş û azarê û evînê li nav millet ji dayik bûye. Bi giştî jî di nava her metnekê vegêranê da, nivîskar çend cureyên kesayetîyan pêşkeşî xwînerî yan guhdarî dike, û ev cure li dû xwast û mebestên çîrokê nivîsî ye. Her wiha li dû çîrokê çîroknivîs jî têne guherîn, lê girîngtirîn cureyên kesayetîyan li dû arik û pyekhat û girîngîya ewan di metnê de, li ser du cureyên li jêr derbas dibin “Kesayetên Sereke, Kesayetên Lawekî” (Mihemed, 1993; 161-170)

**1. Kesayetên Sereke:** Ji ber ku rolê sereke di nava çîrokê de digerin û tewerê çîrokê pyek tînin, kesayetên serekî ji hemu cureyên din zaltir e û rolekê karîger û aktîv di avakirina çîrokê dibînin û dîsa kesayetên sereke her ji destpêka nivîsandina çîroknivîsî ve kesayetên parastî ne. Ji ber ku dema çîroknivîs kesayetên sereke dirust dikt wênê bi dirustahî nîşanî xwînerî ango guhdarî nade ji ber ku di destpyeke de dema derdikeve piraniya hêlên kesayetîya wî veşartî û nedîyar e. Hêdî hêdî derdikeve digel hatina bûyeran û hêlên nedîyar jî derdikevin û çîroknivîs zêdetir bi kesên sereke mandî dibe bi berawird kesên lawekî. Ji ber ku taybetmendî karên kesê sereke divê ciyawaz bin da ku xwîner weke kesekî sade destnîşan neke û divê kesayetên sereke li dû hemû yasa û dab û nerîtên civakî neçe. Divê li dû rê û yasayên dirust yê jiyane biçe, ev kesayet tiştê neçaveryekirî encam bidin, çikû ev kesayetên tiştên neçaveryekirî dikarin encam bidin û nabe biê jibîrkirin kesayetên sereke hemû kesayetîyên lawekî li dorawî dizivirin. Di derbarê vê yekê de lêkolîner Nacim dibêje “ew kesayetî ye ku di destpêka bûyeran derdikeve û bi dûmahîka bûyeran re rolê wî jî namîne. Jiyana wê peywendî bi jiyana karakterê lawekîyan heye û her du kardiken li ser jiyane hevdu û helwêstên wan, fikr û boçûn û rewîşt û edgarê hevdu aşkera dikin” (Alwenî, 2008; 44).

**2. Kesayetî Lawekî:** Dema ku tene nîşandan kesên lawekî di nava çîrokê de sade û sakar in lêbelê roleke sereke di nava çîrokê de nagrin, lêbelê yek ji pêwîstîyên herî serekî ne di nava çîrokê de. Çikû weke alîkar hevkarîya çîroknivîsî dike dakû encamdana karên wî û bi taybetî jî di dîtina kesayetîya sereke ku bi piraniya

deman wêneyê kesên sereke tê girêdan bi kesên lawekî ve. Lêkolîner Perêz jî dibêje ku “kesên lawekî xwediyên rolên diyarkirî ne di çîrokê û bi binemayeke girîng li binemayên dîtina honera çîrokê şîn dibe” (Mihemed, 1993; 161-170).

#### 2.2.4 Bûyer

Bi rengeke giştî, di zimanê Îngîlîzî de beramber peyva “bûyer”ê çendîn peyvên cuda têne bikaranîn mîna; episode, incident, action, heppening (Reşîd, 2016; 126). Lê di zimanê Erebi de peyvên hedes (Mecdî & Kamil, 1984; 144-428)tên bikaranîn û di zimanê Kurdî de peyvên wek bûyer, kirdar, serhatî, rûdan, beserhatî) (Hfiz, 2005; 290) têne bikaranîn.

Bûyer yek ji binemayên metnê yên sereke tê hejmartin, di pênasayekê de ku dibêje “di gewherê xwe de çîrok vegêrana (sîyaqê) bûyerê ye” (Tahir, 2009; 88-96). Ku ji egerê wê “babet dirust dibe û kesayetî û milmilane tê de peyda dibin, bi ryekya girêyê pêşve diçin, wate bi hîç şeweyeke ji kesayetî yê cuda nabe ku bi çyekerê bûyerê tê hejmartin” (Reşîd, 2016; 125-126). Di bûyerê de komeke karan kesayetî pêradibin, bi hevkarîya hindê kesan hevrikîya keseke dî dîke. Li demên asahî û neasahî de rûdiden, nivîskar lehengî û bûyerê ryekdixe bi rengekê gunçaw û wekhev û li dû yek bîn bi binemayaa hokarê berhev dîke da ku bûyer bawer pyekirî bin û bala xwînerî berev xwe biazirîne. Her wiha Gerald Prince tekezê li ser yek girtina pişkên bûyerê dîke û dibêje “bûyer zincîreka pyekve girêdana buyeran e, yekgirtî û watedar e û li du yek tîn wek berahî û nîvek û dumahî” (Pirêns, 2011; 20). Her wiha Xatun (Perî) girîngîyê bi bûyerê dide û dibêje “her ji helbijartina pêşekîya balkêş û rûjêner û hilbijartina cihekê dirust û diyarkirî û gunçaw bo bûyerên girîngî pêday û bo pêşvebirina wan bi rengekî mentiqî, dûr ji ryekfeftinên sade û ryekxistî û hilbijartina dawîyeke dirust ku digel mentiqî bûyeran ryekbikevî, ta ku vê peyamê hewla gehandinê bi ron û aşkera be” (Muftî, 2012; 46). Li vira wateya wê yekê dide ku naverok û mebesta çîrokê rolekê sereke di berbelavkirina metnên vegêranê di çîrokê digre û bi regezê girîng di çîroka honerî tê

hejmartin. Çikû di wira de bûyer bizavê dikin û peyama çîroknivîsî û heyvanê çîrokê digehîne xwînerî heta ku ew peyama cihê rezamendîya xwînerî be û pêdivî ye nivîskar wateyeka baş pêşkeş biket û di xizmeta mirovayetîyê û pêşvebirina wê de be. Her wiha nivîskarê çîrokê jî bo ryekxistina bûyeran di çarçoveya piroseya vegêranê de, li dû çend binyatan diçin, ev binyate jî çend cureyan pyek hatine wek “zincîreyî, têhelkêş, çarçoveyî, rêzbûn, hevterîb, bazineyî” (Xelîl, 2014; 53). Lê bi dîtina hindê rexnegiran “ji hêlekê ve çêdibe ku hindê jî van binyadan tyekelî hev bibin, çikû di bineretîyê de gelek wekhevin, mîna yên têhelkêş û çarçoveyî. Ji hêleke dî ve çêdibe ku ji van cureyên binyata bûyerê, bi binyata kevin û teqlîdî bê hejmartin, mîna zincîreyî, têhelkêş, çarçoveyî, rêzbûnî û cureyên dî bi binîyatên nûyî bîn danîn” (Alanî, 1994; 13-51). Di derbarê dabeşbûna bûyeran, bûyer di berhemên edebî de dabeşî du cureyan dibe, ew jî bûyerên sereke û lawekî ne:

1. **Bûyera Sereke:** Ew bûyer e yên ku hebûna wan bo kirdeyê çîrokê pêwîst û girîng in. Ev bûyere, ew zincîrên bûyerane ku di mejîyê nivîskarî de hatine bi hev girêdan û hemû li serhev ve nexşe û gelaleya çîrokê pyek tînin û ger nexşe darêştina çîrokê nexşeyek jî hejî û giştgîr be, jêbirin û giherîna her yek jî wan dê bi temamî binîyata çîrokê tyek bibin.
2. **Bûyerên Lawekî:** Ew bûyerên lîstikê derdibirin ku nivîskar bi yek rê û alîkarîya wan nexşe û kirdeya xwe berfireh dike û ev bûyera lawekî mîna xekekane (helqe) ku bûyerên serekî pyek ve girêdidin û rêxweşkerin jî bo bûyerên serekî û wan temam dike (Hesen, 2011; 42-43).

### 2.2.5 Cih

Bi şêweyêke giştî di zimanê Îngîlîzî de peyvên wek “place, space, site” tînin bi kar anîn (Selam, 2006; 140). Beramberî wê di zimanê Erebî de peyvên “mekan” tînin bi kar anîn (Duskî, 2008; 66-492). Di zimanê Kurdî de li şûna wan peyvên wek “cih, şwên” tînin bi kar anîn (Reşîd, 2016; 131).

Cih ew cografiya xwezayî ye ya ku bûyer tê de peyda dibin. Dîsa civak û dewrûber ew rewş û bûyerên bandorê li ser kesayetîyan dikin. Her mirovek û gîyandareke zîndî yan nezîndî li ser ruyê erdê, li cihekî cîgir bûye û pê ve hatîye girêdan, ji ber vê yekê hebûna her tiştekî bêyî cihekî nayê dîtin. Cih regezeke girîng û sereke ye di pêkhata çîrokê de “ew qeware madî ye ku beşeke girîng û mêjûyî taybet e hemû berhemê çîrokê pêktîne û berfirehîya çîrokê pê tê ciwan kirin û di heman demê de nasnameya çîrokê dide destnîşan kirin” (Sabîr, 2005; 23). Cih di berhemê edebî de li ser çend cureyan tê parvekirin. Her rexnegirekî û lêkolînerêkî bi şêweyeke cuda li dû fikra xwe diçe. Her wiha li dû cure, naverok, bûyer, bingeha metnî ew cure dabeşkirine mîna Perêz Sabir, Newzet Ehmed, Osman Zêbarî, Îbrahîm Qadir, Tanya Ashed Mihemed, ku yek ji wan dabeşkirinên poxî û hûr bi vî awayê li jêrê ye:

#### **2.2.5.1 Li Dû Hebûna Cihî: Cihên Ketwarî, Cihên Aşopî:**

- A. **Cihên Ketwarî:** Ew cih e ku di nav jiyana rasteqîn de hebûna xwe heye û çîroknivîs vediguhêze di nav çîroka xwe, wate “ew cihên bi çavyekî hêsanî, çîroknivîs dibînin û navê wan tînin, lê weskirinê jî bi rengekî berçav li dû berzî û nizmî û ciwanî û kirêfî wesfîyan dike” (Muftî, 2012; R160).
- B. **Cihên Aşopî:** Ew cih e ku ji hêla nivîskar ve hatîye dirustkirin ango hebûneke madî nîne, lê “bi tenê hest bi hebûna wê tê kirin, nayê dîtin û cihê wê dîyar kirî jî nîne, belku wêneyekê girîmanî hatîye girtin, ku jêderê wî cihî xeyal e” (Muftî, 2012; 165).

#### **2.2.5.2 Li Dû Têgehê Hogirîyê: Cihên Hogir yan Nas, Cihên ne Hogir yan Nenas:**

- A. **Cihên Nas:** Ew cih e ku mirov tê de hest bi xweşîyê û dilnîyayî û tenahîyê û bêhn vedanê dike û jiyana xwe bi tenahî tê da dibe serî û mirovî eşqeka mezin heye beremberî vî cihî wekî mal û bajêr û welatê mirovî (Qadir, 2006; 206).

- B. **Cihên Nenas:** Ew cih e ku mirov lê hest bi nexweşîyê û namuyê û bêzarîyê dike, çiku mirovî çî aşnayek ligel ewî cihî nîne, lê ji egerê hindêk kewdanan neçar maye li ewî cihî bijî, mîna zindan û girtî xaneyan (Xelîl, 2014; 65).

### 2.2.5.3 Li Dû Bikaranîna Cihî: Cihên Vekirî, Cihên Girtî:

- A. **Cihên Vekirî:** Ew cih e ku ewê mirov tê dê azad û serbest û bi arezûya xwe hatin û çûyîne bike, wekî: bajêr, tax, cade, mizgef ango ev cih cihên giştî ye hemû kes dikarin tê da hatin û çûnê bikin (Sebah, 2009; 119).
- B. **Cihên Girtî:** Ew cih e ku ewê taybet bi kesekî ve yan bi hindêk kesan ve bi sînor e û ruberekî cografî yê dîyarkirî heye, hemû kes nikarin li serbestîyane tê da helsekftan bikin, mîna: mal, jûr û hewşê (Sebah, 2009; 119).

### 2.2.6 Dem

Bi şeweyeke giştî di zimanê Îngîlîzî de peyva “time” (Alî H. S., 2000; 28-29). Di zimanê Erebi de peyvên “zemen, alweqit” (Duskî, 2008; 818). Di zimanê Kurdî de jî peyvên wek dem, kat, sat, roj (Fazil, 2002; 253-269-309) tê bi kar anîn.

Dem ew qonaxe ewa bûyeran wêne dike, dem tewerê çîrokê ye, her weke çawan tewerê jîyanê û gerdûnî û hebûnê heye, bi tewerê jîyana me ya navekî tê hejmartin. Çikû çî tişt berî wê demê nîn in. Ango dem digel peydabûna hebûnê peydabûye. Cih xwediyê çî demê nebûye, wate bi livîna cihî dem peydabûye. Her wiha gelek lêkolîneran dubare kirîye ku “çîrok jî her cureyêke dî yê edebiyatê ye ku pitir bi demê ve girêdayî ye” (QasimSizar, 2004; 26). Dîsa dem ji hêla Necim Xhêld Elwenî ve bi vî rengî hatîye pênasekirin “ew demê rêjeyî ye ku çawanîya vegeerîna bûyeran û livîna kesayetîyan di demên borî û niha de û di demên pêş de gorî şewazê vegêrana metnê tê ryekxistin (Necmedîn, 2004; 54). Li vîra dîyar dibe ku vegêran bê dem nabe, belku divê kiriyara vegêranê di demeke dest nîşankirî de bê encamdan. Vêca ew dem rabirdû be yan niha yan jî dahatû be, “ev pêvegîrêdana vegêrana demê wiha kirîye wekirîye ku çîrok



nikare demê pişt guh bike. Belku girîngîyeke zêde bi demê ve bide û bi kevirê binaxeya binyata çîrokê tê danîn, heta wisa lêhatîye ku hatiye gotin ku: dem çîrok e û rîtme jî û çîrokê berev pêşve dibe (Muftî, 2012; 93). “Hejî amaje pêkirneye ku yekem kesên girîngî bi binyatê demê di nav berhemên edebî de dane û bi şîrovekirina wê rabûyne, formalistên rus bûn. Dîsa dem bi alavê serekî yê giherîna jîngehê dîyar dibe. “Dem regezeke girîng e di jiyânê de bi gelemperî û di çîrokê de bi taybetî çikû çîrok bercesteke jiyânê ye, dem egerê giherîna jîngehê ye, xamoşî û çespendinê nahêle û her bizavê diêxîtê” (Usman, 2002; 54). Lê lêkolîneran çendîn cureyên demê dîyar kirine mîna Perêz Sabir, Mesûd Reşîd, Rêjîn Cemîl. Di nava demê de du cure wek sereke hatine dîyar kirin: Dema Derekî, Dema Navekî.

#### **2.2.6.1 Dema Derekî**

Dema vegêrî û nivîskar û wergêrî (xwînerî) ye. Bi şêweyeke giştî ew dem e yê ku hebûn tê da dizivire, wate ew rûbar e yê ku ji kurahîya hebûnê derdikeve û dikeve wexerê di rêya xwe de dibe: delîve, demjimêr, roj, heyv, sal, çax. Ew dem e ku bi leza mîlê demjimêrê tê hejmartin bi vê çendê dîyar dibe ku dema derekî, dema mêjuyê fizîkî ye ji demjimêran hatîye wergirtin.

#### **2.2.6.2 Dema Navekî**

Demeke ne çarçovekirî û bê sînore, çiku demekê taybet bi xwe ye û deruniya kesayetî ve ye û bi hest û sozên wî ve. Wate ew demê metnî ye ew deme delalî ye ewê taybet bi cihana aşopî ve giredayî ye bi wî maweyî ewê bûyer tê da derbaz dibin wate demê nivîsîn û xwêndinê ye (Reşîd, 2016; 35).

#### **2.2.7 Dîyalog**

Dîyalog axaftina di navbera du kesan de yan jî ji du kesan zêdetir de ye. Bi şêweyeke giştî, di zimanê Îngîlîzî de peyva “dialogue” (Reşîd, 2016; 128) bo axaftina bi vî rengî tê bi kar anîn. Beramberî wê di zimanê Erebî de peyva “alhiwar” (Duskî, 2008;

794) tê bi kar anîn. Di zimanê Kurdî de peyvên “dîyalog, danûstandin û hevpeyvîn” (Reşîd, 2016; 129) tên bi kar anîn.

Dîyalog pişkeke girîng e ji binyata çîroka honerî, ku bi rêya şanoyê hatiye di nav metnên di yên vegêranê de mîna roman, çîrok wekî yek ji şewazên derbirîna edebî. Her wiha dîyalog pişkeke serekî ye di jiyana mirovî ya rojane de ji bo peywendîkirinê û di hev têgehiştinê û alogurkirdina fikr û bîra di nav bera hevdu de. Nivîskar bi rêya dîyalogê dikare risteyên kurt û tijî bikarbîne, ev çende “alîkarîya xwînerî dide bo wergirtina xweşîyê û li dû çûnê û ji bêzarîya dûr dikeve. Her wiha alîkareke bo bidestxistina sozdariyê di navbera çîrokhezan û guhdarî û xwînerî de” (Husên, 2010; 167-168).

Dîyalog di çîrokê de weke regezê girîng tê qebl kirin lê bi tenê ji bo xemilandin û ciwankariyê nayê bikaranîn. Belku nivîskar bi rêya dîyalogê “rewîşt û hizir û bîrên kesayetîyan û rewşa wan ya civakî her wiha ya derûnî mîna: tirs, dudilî û wefadariyê pêş çav dike. Ew taybetmendiyên di navbera kesayetîyan de dîyar dike, hevpişkîyê ligel çawanîya hizirkirina kesayetîyên çîrokê de li dû astê wan yê rewşenbîrîyê dirust dike. Wek mînak dîyaloga mamostayan ji dîyaloga dikandar û bazirganan cuda ye û her yekî peyv û zaravên taybet bi xwe ve hene. Her wiha çawanîya axaftina wan ji hev gelekî cuda ye. Wate zimanê dîyalogê zimanê kesayetîya ne neku zimanê nivîskarî ye. Her wiha dîyalog bûyerê pêş ve dibe û cih û demên wê nîşan dide, babetê çîrokê dike yek û pyek ve girêdide û yekîtiyekê di nav de peyda dike bi vî awayî hesteke zindî bi çîrokê dibexşîne û zêdetir nêzîkî cîhana rasteqîne dike” (Siwarî, 1989; 99-106). Dîyalog pişkeke serekî ye ji jiyana mirovayetiye, ku bi pênaseya xwe ya giştî “birîtiye ji wan hemû axaftinên civakê ku weke amrazeke lyekdayî ku bigehîne biwarên cuda cuda yên jiyane bi kar tînin” (Reşîd F. , 2007; 39).

Dîyalog di çîrokê da li gor dîtina hindê nivîskaran çend erkan bi cih tîne, her nivîskarek jî li gor cureyên çîrokê erkan ji boy dîyalogê dîyar dike, nivîskar Îbrahîm Yunisî erkê dîyalogê di çîrokê da bi vî awayî dîyar dike:

1. Dîyar kirin û nîşandana karekterî di nava çîrokê de.

2. Pêşvebirina girêya çîrokê.
3. Sivikkirina giraniya karê çîrokê.
4. Anîna bûyer û bi serhatîyan di nava çîrokê de.
5. Nîşandana nexweşîya.
6. Ddîna agahdarîyên ku tyekilya wan bi xwînerî vebin (Yunisî, 2005; 55).

Li dû hemû cureyên erkên dîyalogê di metnên edebî de, dabeşî çend cureyan dibe li dû cureyê çîrokê. Bi gelemperî behra pitir ya rexnegir û lêkolîneran du cure dîyar dikin:

#### **2.2.7.1 Dîyaloga Rastewxo**

Ev cureyê dîyalogê ye, ewê tê da du kes yan zêdetir bi şeweyeke rastewxo beşdarîyê dikin û bi şeweyeke nerastewxo behsa xwe diken.

#### **2.2.7.2 Dîyaloga Nerastewxo**

Ew cure dîyalogê ye ku bi şeweyeke nerastewxo derbirîn jê tê kirin. Ango vegêrana bûyerekê ye li ser zarav karakteran weke xwe, bikaranîna cînavkên wekî gutî, gutin û dibêjî (Reşîd, 2016; 129).

#### **2.2.8 Monolog**

Bi şeweyeke gelemperî, di zimanê Kurdî de jî peyva “monolog” ê ya ku her ji Îngîlîzî hatiye girtin (Duskî, 2008; 809) tê bi kar anîn. Di zimanê Îngîlîzî de peyva “monologue” (Selam , 2006; 229) tê bi kar anîn. Beramberî wê di zimanê Erebi de peyva “almunuluc” ê (Duskî, 2008; 809) tê bi kar anîn. .

Monolog yek ji regezên karîger e di nav çîrokê de bi mebesta derxistina derûn û hest û nihênîyên veşartî yên kesayetîyê peyda dibe, çiku “gelek caran mirov lênihêrînên xwe bi rengê aşkera derdixe lêbelê dema ku digel xwe dikeve axaftinê vêca bi başî

bêyî ku xwe aciz bike hemû tiştan digel xwe dibêje” (Alî T. M., 1991; 141). Di derbarê pênaseya monologê de nivîskarê îngîlîz Robert Humphrey dibêje: “ew teknîke, ewa di çîrokê de bi mebesta dîyarkirina rewşa derûnî ya kesayetî û kiryarên derûnî yên wê tê bikaranîn, bêyî ku bi şêweyeke temam yan parçeyî li ser biaxivin di wê demê de ev kiryar e li astên cuda yên desthilata hişmendiyê bin, li pêşiya axaftinê û bi mebest derbirîn jê bê kirin” (Xelîl, 2014; 80).

Monolog hevpeyvîneke navekî ya mirovî ye, her wiha hevpeyvîn di nav naxê mirovî de bédeng û bihîstin peyda dibe. Ew xala girîng ya ku monolog û dîyalogê ji hev cuda dike ew e ku ew kesayetîyên diyalogê di navbera hevdu da encam didin, dibe bi rastî û dirustî ew tiştên di nava hest û derûnê wan de nayê derbirîn. Belku li beramber vê yekê gelek rêgir hebin û rewşa kesayetîyan gelek ya aloz û tyekçûyî be, lê “kesê xwediye monologek rastbêjane be bêyî ti astengekê daxwazên xwe diyar dike û guzarîştê li dema borî û niha û dahatûyê dike ku berîya niha kirine yan dixwaze bike yan ji wî karî poşmane û dan bi wan xeletîyên di jiyana xwe kirin li demê borî dadinê digel her kêşeyeke digel xwe tê axaftinê û digel xwe diaxive (Dewlet, 2001; 184). Merema nivîskarî ji bikaranîna teknîka monologê di metnê edebî de ew e heta ku lyekolînê li ser kesayetîya mirovayetîyê bike û hêlên navekî yên jiyana ewî ya xweşî û siruştî û rast bo civakê wêne bike.

Monolog di nav metnê edebî de bi çend erkan radibe û ji wan erkan yên herî girîng ev in:

1. Derkeftina naxê pehlewan yan karakterî û aşinakirna xwînerî bi wan zanyarîyên di nava hizir û naxê wan de heye.
2. Alîkariya palewan yan karakterî dike ji bo wan boçûnan û wan tiştên di naxê wî de hene biçrî û wirdî bibîne û bikare bikarbîne.
3. Bexşina kitupir bi metnê li gihandina wan zanyarîyan yan hîkayetan divê bi xwînerî re bigehîne.

4. Dibe hokarek ji bo bercestekirin û zêdetir berbiçavkirina pehlewana yan karakteran hebe. (Xelîl, 2014; 80).

Cureyên monologê hatîne destnîşan kirin lê em ê li vira dê bi kurtasî bidin naskirin:

**2.2.8.1 Ronologa Rastewxo:** Di vê cureyê monologê de kesayetî xwe bi xwe diaxive ango kesê yekê yê tak e, bêyî alîkariya nivîskarî. Di vî cureyê monologê de, cînavkê kesê yekê yê takî tê bikaranîn.

**2.2.8.2 Monologa Nerastewxo:** Ew cure monolog e ku nivîskar li ser zare kesayetîyan û di çarçoveya wê babetê de bûyeran tîne pêşçav û saloxdan û şîrovekirina dide wî. Di vî cureyê monologê de, kesayetî tewerê serekî ye û bi awayeke yekser di kiriyara monologê da tê pêş, ew jî bi rêya bikaranîna cînavka kesê sêyem yê takî ye (Reşîd, 2016; 130).

### 3 ÇÎROKA HONERÎ YA KURDÎ

#### 3.1 Peydabûn û Werara Çîroka Honerî Ya Kurdî

Çîroka Kurdî weke hemû alîyên din yê pexşana Kurdî bi taybetî û bi gelemperî ya edebî berfireh û dewlemend û berbelav e.

Hêlên mêjûyî û destpêka peydabûna ya çîrokê ya kûr û tarî ye, belê destnîşankirina yekem çîroka Kurdî ango çîroka honerî ya Kurdî ron û berfirehtir e. Ew jî ji ber parçe parçe bûna milletî zêde bi hêsanî nîne û lêkolîner jî li hember wê çendê dû dil û rarane.

Digel vê çendê paşvemana pexşanê li cem Kurdan ji bo vê çendê hinek egerên taybet hene bi milletê Kurd ve ku girêdayî rewşa wê ya sîyasî, cografî, aborî, rewşenbîrî ye. Bo mînak parçekirina Kurda bûye egerê parçe parçekirina rewşenbîrîya Kurdî, her wiha nebûna peywendîyan di navbera evan parçeyan de, ji egerê van astengiyên ji aliyê hukümetên desthilatdar ve li ser wan hatine sepandin. Lê jêr desteya milletê Kurd di ware nivîsandinê de bi şeweyeke gelemperî ango rênedana dagîrkeran ji bo xwandinê û nivîsînê bi zimanê Kurdî, her wiha hebûna çendîn diyalektan û rênivîsan di zimanê Kurdî de. Wek mînak ji aliyê rênivîsê Kurdên Başur digel Kurdên Roj helat bi rênivîsa Elif û bêya Erebi di nivîsin, lê Kurdên Bakûr û digel Kurdên Roj ava bi pîtên latîni dinivîsin, dîsa Kurdên Ermîniya û Azîrbêcanê bi alfabeya kîrîlî dinivîsin. Ligel wê çendê jî belavbûna nexwêndewarîyê û nizimbûna asta rewşenbîrîyê di nav milletê Kurd de û nebûna agahîyan li ser pêşveçûn û guherînên cîhanê. Her wiha girîngî nedan bi zimanê dayikê, ji hêla çîna nexwêndewar ve, ew kêma xwêndewar jî ku pîranîya wan mela bûn û derçûyên mizgeft û medreseyan bûn, piştî belavbûna dîne îslamê van nivîskaran jî bi Erebi nivîsîn û ji hêla aborî ve hejarî û feqîrîya milletê Kurd û nebûna çapxaneyên Kurdî li hember berhem anîna edebiyatê bûne asteng (Resul, 2010; 194-195) .

Li ser peydabûna çîrokê dibe em li ser pexşanê rawestî ji ber ku çîrok yek ji tewerên pexşanê ye peydabûna pexşana Kurdî her digel mirovayetîyê hebûye. Lê wekî di pirtûka pexşana Kurdî ya Elaedîn Secadî tê destnîşankirin, “wekî dibêjin û dîyar e Kurd li netewê arî ye, vêca van arîyan jî gelek liq jêve bûne, yek ji wan liqan jî dîsa Farisin û Faris xwedan edebiyatateke nimûnene û bi hezaran pirtûk hene, dîsa li dewrê pêş îslamê û paş îslamê de qelemê welatê Kurdan zorbeza deman di destên Farisan de bûye û naveke taybet bo belgeyekî bo Kurdan nehatîye ser ziman, belku hemû belgeyên arîyên welatê îranê her bi îranî navbirîne û bi zimanê Farisî li qelem didine, û lêkolîneke wesa jî nehatîye kirin ku beşê zimanê Kurdî li zimanê Farisî bihête cudakirin. Digel vê çendê jî zimanê Kurdî zimanekî serbixwe bûye, ew beş û ristên Farisî hatîne gotin û Farisî ne ez wan bi Kurdî didime qelemê û bi yê Kurdan dizanim, ango her çawa be şîrkati heye navbera Kurd û Farisan de. Belê bi dax û hesreteke zêde ku qelem li ba Farisan bûye û niha jî gelek peyvên Farisan her Kurdî ne, belê ji ber ku Kurdan lêkolîn nebûye ji ber vê yekê ev bîr û bawerî ji bo wan çêbûne û ketine di nava mejîyê wan” (Elaedîn, 2000; 13-14).

Pexşan di nava edebiyata Kurdî de gelek dîtin û boçûnên cuda cuda hene û têne berçav, bo destnîşan kirina yekem pexşana kevin ya Kurdî di meydana edebiyata Kurdî de. Bo mînak Elaedîn Secadî dibêje ku “sirûda yarsanan zincîre sirûdeka dînî ye û bi pexşan û helbestê hatîye gotin” (Elaedîn, 2000; R15). Di derbarê vê mijarê de Îzedîn Mistefa Resul Mewludnameya Şêx Husênê Qazî (1791-1870) bi yekem pexşan dihesibîne. Her wiha bi destpêka sava ji bo çîroka honerî ya Kurdî tê qebûl kirin (Resul, 2010; 169). Digel vê yekê jî sala nivîsîna wê dîyar nîne û lêkolîner Reşîd Findî di pirtûka xwe ya di derbarê destpêka pexşana Kurdî de nivîsî ye amaje bi boçûna Şukrîya Resul dike û dîyar dike ku ew Mela Mehmûdê Bayezîdî û pirtûka wî ya li bi navê Adat û Risumatnameyê Ekradîyê ku di salên 1858-1859 zayînî de hatîye nivîsîn weke yekemîn pexşana Kurdî dihejmêre. Lê piştî ku Reşîd Findî pirtûka Elî Teremaxî dît û xwend ku Meref Xeznedar komkiribû û li bi navê Destûrê Zimanê Erebi bi Kurdî belavkiribû, gihişte wê yekê ku Teremaxî yekem pexşannivîs û her wiha rêzemannivîsê Kurd e. Dema dibêje, “piştî ku me ev pirtûka Teremaxî xwend û têkveda ... Me dît ku bi

Kurdîyeke rast û rewan û pexşaneka ciwan hatîye nivîsîn, her ji serê ta dumahîyê, islûbê ciwan yê pexşanê bi kar anîye... û Bayezîdî bi xwe, şahidîyê bo dide ku Teremaxî pirtûka xwe li sala hizara koçî yan (1591-1592z) nivîsîye” (Reşîd, 1985; 65).

Ji bilî van boçûnan gelekên din hene, ku her nivîskarekî li dû têrwanîn û rewşenbîrîya xwe bi rastîyeke li dor vê babetê da ghiştîne, lê li vê derê delîve û babetê me rê nade ewan hemû boçûnan rêz bikin û bînine berçav. Belku ya girîng ew e bo me bizanin ku evan hemû berhemên pexşanê ewên destpêkê rê li hember peydabûna çîroka nû ya Kurdî xweşkiriye. Her çende li destpêkê bi rengeke sade û sakar serhildaye, zêdetir berev serhatîyan yan hîkayetan ve çûye û taybetmendiyên wê li ser zalbûne. Lê hêdî hêdî ew şîyaye wekî honerekê serbixwe hebûna xwe di nava edebiyata Kurdî de biçespîne.

Çîroka honerî ya Kurdî wekî pişkek girîng ji pexşana honerî û cuda ji serhatî û hîkayetan li ser çendîn serekanî û jêderan peyda bûye, çiku her wekî ya ron û aşkera çi tiştêk ji valahîyê peyda nabe, belku hindêk jêder dibine hokarê peydabûna wê û li ser binyatekî têne avakirin. Di derbarê vê yekê û li dor jêderê çîroka honerî ya Kurdî dîtî û boçûnên cuda cuda hene. Nivîskar û lêkolînerên Kurd bo dest nîşankirina van jêderan bi gelemperî sê boçûnên serekî dîyar dikin ku em ê li jêr wan yek bi yek bidî naskirin û li ser wan nîqaşê bikin.

### **3.1.1 Boçûna Yekem**

Boçûna wan ew e ku çîroka honerî ya Kurdî dirêjepêdera kanîka dewlemend û ya ku ava naqede ya edebiyata folklorî yê Kurdî ye wate geşekirin û berev pêşveçûna hikayeta millî ya civaka Kurdewarî di kevin de bi rengê zarekî û dest bo destî li ser zimanî hatîye vegêran û belav bûye ta ghiştîyê vê asta ku niha tê de ye. Ewên digel vê boçûnê de, Elaedîn Secadî dibêje, “Kurd di warê çîrok û efsaneyên kevin de gelekî dewlemend in” (Elaedîn, 1978; 168). Her wiha dibêje ku “ew madeyê ku niha mane li piştawpişt û yê mane û mantiqî di serekanîyên gelek kevin de, li yên wê serdemê ku eger bi roj karesatek an bi serhatîyek li serê wan hatibe bi şev kombûne û hatîye vegêran. Eger tiştêkê balkêş hatibe vegêran di wê demê hatîye ji ber kirin û ketîye ser zimanê



civakê û li wan cih û herêman belav bûye” (Elaedîn, 1952; 20). Dîsa lêkolîner Mistefa Salih jî ew boçûn heye û dibêje, “binemayê çîroka honerî ya Kurdî ew hikayetên millî ne ku piştawpişt bo me mane” (Kerîm, 1985; 10-18). Bi heman şeweyî Hesên Caf jî eger ta radeyeke karîger bûbe bi edebiyata ewropî li ser çîroka honerî ya Kurdî, belê di heman demê de edebiyata folklorî yê Kurdî bi girîng û kevintirîn serçawê çîroka Kurdî destnîşan dika û dibêje, “wesa nîne ku me çîrok nîne an ku me bûye ev edebiyata çîrokê niha li rêya karîgerî ya edebiyata ewropa yan serbixwe peydabûye yan dirust bûye. Folklorê Kurdî girîngtirîn û kevintirîn serçaweyê çîroka Kurdî ye” (Hesên, 1985; 119). Dîsa li ser vê mijarê ku çîrok û romanên Kurdî li ser binyatê folklorê Kurdî serhildaye nivîskar û lêkolîner Nafî Akreyî dibêje, “kelepûrê Kurdî binçîna çîrokê tê daye bi her dû cureyên kurtî û di rêjî” (Sabîr, 2002; 130). Evên li ser ve hatine dîyarkirin boçûnen çend nivîskar û edîban bû ku li ser serçaweyê çîroka honerî ya Kurdî ku binçîne û peydabûn û serheldan vedigerine edebiyata folklorê Kurdî ya resen.

### **3.1.2 Boçûna Duyem**

Di derbarê vê boçûnê de em dikarin bibêjin ku pi pêçewaneya boçûna yekem e çikû dipêjin hemû reh û rîşalên çîroka honerî ya Kurdî û serçawên peydabûnê vedigerînin bo ewê bi nav honerê edebî yê nû li ewropayê serhildaye li demek û çaxeke taybet de. Ku pişt ra bi rêya vegeerîyana nivîskar û şair û ronakbîrên Kurd yê nû aware li welatên rojava û bo welatêxo û çend hokarên din yê nû sîyasî û mêjûyî bi taybetî dumahîya cengê cîhanê yê yekem, ev honer e ketiye di nava edebiyata Kurdî de.

Serqaflê ew edîb û nivîskarên Kurd yê nû boçûnê dupat dikin û li ser vê boçûnê rawestîyane Marif Xeznedar e ku dibêje, “çîrok honerekê ewropayî ye, hewceya jiyane wisa lêkirîye wekî rûxsarê honerî li nav hemû milletên cîhanê belav bibe û li piştî cengê cîhanê yê yekem de ketiye di nava milletê me jî” (Xeznedar, 1970; 52-53). Her wiha Hisên Arif jî di derbarê serçaweyê çîroka honerî ya Kurdî bo edebiyata ewropayê vedigerîne dema ku dibêje “serheildana çîroka honerî di edebiyata Kurdî de û her ji destpêka werara wê, yek e ji dîyardeyên herî girîng ku dibe li mêjûya edebiyata nû de bayexeka taybet pê tê dayîn, çikû ji ber ku edebiyatateke nû kete di nava edebiyata

me de ku beriya niha nebû” (Hiseîn, 2011; 12). Arif li pişt ra jî fikra Marif Xeznedarî pesend dike û dibêje ku “bi kurtî fikra min wesa ye ku çîroka honerî wekî babetekê edebî yê nû û bêgane hatîye di nav edebiyata Kurdî de li bineret de” (Hiseîn, 2011; 13). Ev çende di nav edebiyata Kurdî bi du rêyan hatîye veguhastin, yek ji wê rêyê ew e ku bi rêya komela ronakbîr û edebiyatadostên Kurd bûn ku di wê demê vegehiyane nava welatî û zimanê bîyanî dizanîn dîsa şarezahî li edebiyata bîyanîyan jî hebû û ketibûne jêr karîgerîya wî edebî û li jêr wê kartêkirinê tişt dinivîsandin. Rêya duyem ew e ji ber wergêranê bû, li ser laperê zorbeya kovar û rojnameyên Kurdî dihatine dîtin (Mihemed, 1993; 36).” Dîsa nivîskar Enwer Mihemed Tahir xwe dide pal wê boçûnê dema ku dibêje, “çîroka honerî ya bo me hatî ji çîroka ewropî û honera ewropî ye û yê hatîye di nav me dw sed ji sedê bi rêya zimanên Erebi û Farisî û hindek zimanên din yan rastewxwo bi rêya wergêranê kartêkirin li me kirî ye (Tahîr, 2000; 118-123).” Evên li serî hatine dîyarkirin û behskirin bîr û boçûnên wan nivîskar û edîban bûn ku dibêjin çîroka honerî ya Kurdî serçawê wê vedigere honerên edebî yê nûjen li ewropayê bi şêweyeke sereke.

### 3.1.3 Boçûna Sêyem

Di vê boçûnê hewl hatiye dayîn ku yeksanîyekê bixe di nava boçûnên pêşter. Ew jî bi gêranev a serekaniya serhildana çîroka honerî ya Kurdî ye ku vedigere bo her du jêderên borî. Ew jî kanîka berhemên edebî yê folklorî ango berhemên millî yê Kurdewarî yê kevin pir ji hikayet û bi serhatî digel wergirtina hizir û teknîk û şewazê nû yê honerê çîroka rojava û nivîsînên wan. Îzedîn Mistefa Resul yek ji wan kesan e yên ku ev bîr û bawerî heye û dibêje, “çîroka Kurdî ne bi tenê dirêjepêdera çîroka folklorî ye û ne hatîye veguhastin û lasaykirina çîroka ewropî ye. Belku çîroka nû ya Kurdî têkelkirinek e di navbera samanê serzarî û nivîsa gelê me, li gel teknîka çîrokê li cem milletên din bi şêweyeke dahênerane, bi mifa wergirtin ji serboriya jiyane, heta ku ji wêneyên rabirdû û niha dîtineka şoreşgerane bo paşerojê biafirînin” (Resul, 1984; 113). Dikarin bibêjin ku Şukrîye Resul jî heta radeyekê zor fikr û boçûnê wê di nêzîkin li ser fikr û boçûna berê kû çîroka nû ya Kurdî bi edebiyata folklorê Kurdî û karîgerîya çap û çapemeniyê û dewrê kovar û rojnameya vedigere. “Dema ku nivîskarê edebî yê Kurd

vegerîyan bo welatêxo û bi karîgeriya edebiyata rojava bi şêwe û şêwazê edebiyata wan li ser Kurdan ve û dest avêtin nivîsîn û belavkirina çîrokê bi rêya çapemenî û kovar û rojnameyan” (Resul , 1989; 211). Her wiha lêkolîner Umer Meruf Berzincî dibêje, “ev honera taze ye di nava edebiyata me da li rengê hizirkirinê yên kesên çîrokan û ruxsar û şêwê darêştinê xaleka neteweyê ya pê ve her çend li binçînayê xwe honerekê bilind yê ewropî ye” (Berzincî, 1978; 13). Lê digel vê çendê heman nivîskar girîngîya edebiyata folklorî ji bîr nake û bi samanekê girîng ji bo edebiyata nivîskî û çîrokê didane û dibêje, “weke rastîyeke mêtûyî pêwîste ew jî neyê ji bîr kirin ku ev honer e li pêş wi serdemê ve sêber ya hebû bi şêweyê sade wek pend û efsane û hîkayet û babetên folklorî hene û li destpêk vedigere bo serê sipêdehiya mêtûya vî milletî. Ku bi çeşneke edebî û bi kelepûreke nenyasî tê li qelemdan û hemû milletên cîhanê bi çaveke giran berê xwe didenê û li arşîvên taybet destê girîngî pê danê bo radikêşin û bi bineretê yekê yê edebî dizanin” (Berzincî, 1978; 13).

Her wekî me dîtî hizir û boçûnên zor hene li serçawê û kanîkên serhildana çîroka honerî ya Kurdî ku her hindêk ji bo hokareke yan çend hokaran vedigerînin.

Weke me dîtî û derencam derketin li boçûnên her sê desteyên nivîskaran, serçawê bineret yê çîroka honerî ya Kurdî yek hokar nîne bi tenê. Belku edebiyata folklorî millî serçaweyê kevin û resen û berfireh yê vê babetê ye, mîna serhatî û çîrokên folklorî peydabûye. Pişt ra mifa ji şêwe û ruxsar û teknîkên çîroka ewropî wergirtîye û paşê taybetmendî û rewşa deverê, veguhaztîne di nav çîrokê de. Ango em dikarin bibêjin ku çîroka honerî ya Kurdî li ser binemayê van her du jêderan dirust bûyei weke honereke taze hatîye di nava meydana edebiyata me de. Ew jî piştî derketina alavên çapkirinê, anga peydabûna çapxane û çapemeniyê, her wiha derkeftina rojname û kovarên Kurdî ku peywendîyeke xurt bi peydabûn û geşekirina honerên edebî bi giştî û pexşanê bi taybet hebûn. Li dor vê yekê Qenatê Kurdo dibêje, “kovar û rojnamên Kurdî di tarîxa peydabûn, pêşveçûn û lêgerîna lîtratura Kurdan cikî hêja û laîq girtîne, çemkê peydabûn, pêşveçûn û lêgerîna literature e bi peydabûn û pêşveçûna kovar û rojnamên Kurdî va girêdaye” (Kurdo, 1983; 13). Çîrok ji wekî honerekê edebî peydabûn û geşekirina wê rastewxo bi wê yekê ve girêdaye, çikû “berîya rojname nivîsîna Kurdî ji

dayik bibe tomara çîroka Kurdî nebûye, belku hikayet û pend û dastanê li ser zarî yê folklorî li dîwan û kor û mizgeft û meclisên edebî de ligel xelkekê sade û sakar yê wê demê kêfxweş bûne” (Sabîr, 2002; 54-55). Her li dor vê çendê Şûkrîya Resul dibêje, “serhildana çap û çapemenîyê û dewrê kovar û rojnama bûye hokarê serhildana çîroka Kurdî” (Resul, 1989; 211). Lewra em dibîn ku her ji derketina yekem rojnameya Kurdî ku li sala 1989z. Li Qahîreyê derçûye û heta îro edebiyata Kurdî pêşveçûye û geşe û giherîn bi xwe ve ditîye. Heta ku çîroka honerî ya Kurdî her li ser berperên van rojnameyan peyda bûye. Çikû wekî ya dîyar babetên rojnamegerîyê pitir bi hêlên jiyana mirovî yê civakî, aborî, sîyasî ve girêdayîne. Vêca nivîskar hindî karîbin hewla wê çendê bide ku wî barudoxê alozê wêdemê pêşçav yê civaka Kurd ku bi kene sercaçê nivîsînên xwe, eve bi encamê wê yekê de girîngtirîn hokar e di ji dayikbûna çîroka honerî ya Kurdî hate berçav ew jî pêşveçûna bizutneva rojnamegerîya Kurdî bû” (Mihemed, 1993; 24). Piranîya wan çîrokan ji aliyê wan nivîskar û rewşanbîrên Kurd ewên di wê serdemê de ji derveyê welat zivirîn, dihatine nivîsîn. Li dor wê yekê Hîmdad Hisên dibêje “vegerîyana hindê ji rewşanbîrên Kurd ji derveyê welatî, di salên cengê yekê yê cîhanî û hezkirina wan bi nivîsîna wî honerê ewropî (çîrok) ku heta wê demê nehatibû nivîsîn, bi rengê li jîngeha Kurdewarî peyda bibin û pehlewana î kurên vê komelê bin” (Hîmdadî, 2001; 13-19).

### **3.2 Dîyarkirina Yekem Çîroka Honerî Ya Kurdî**

Eger dîyarkirina jêderên çîroka honerî ya giran û bi erk be. Vêca bêguman destnîşan kirina yekem çîroka honerî ya Kurdî gelek girantir û bi erktir e. Wate wekî wê mînaka beriya niha me li ser axiftî, bi wî rengî ev hevîr aveke zede dêkêşe. Belê em jî dê hewla bidin li dû pêdivî û hêz û şîyanên xwe, hindî ji destê me bê dê bi kurtî behsa vê babetê bikin û tiştêkê pirwate û bi mifa êxîne berdest û berçav. Wekî dîyar dibe edîb û nivîskarên Kurd gelek axaftin û boçûnên cuda cuda ji bo dîyarkirina yekem çîroka honerî ya Kurdî û yekem çîroknivîsê Kurdî hene. Gelekî berçav û ron e ku her

dahênaneke nû ji destpêkê bi sade û savahî destpê dîke û dema ku ew dahênan digêhe asteke berçav û bilind dahênana destpêkê li savatî û sadeyê jî hind nayê dîtin.

Derbarê yekem çîroka Kurdî ya honerî û maweyê wê de gelek dîtin û boçûnên cuda cuda hene. Îzedîn Mistefa Resul di kovara Karwan de dibêje, “nivîsîna yekem berhem ku mewlûd nameya Şêx Hisênê Qazî ye. Rengvedana xoşhaliyê ye piştî destnîşankirina wê rastîyê di pirtûka Alwaqîye Fî Aledebiyata Alkirdî de, vêca xwe bi xwe hemû tomarkeran û zanyariyên belavkirî yên mêjûya edebiyata Kurdî, destpêka pexşanê sedsalan pitir bo paşvebir û Şêx Hisênê Qazî (1790-1870) bû damezrînerê pexşana Kurdî lê ewa tê gotin li vêrê û her ev cihe cihê gotinê ye ew jî ku ew mewlûdname her destpêkaka pexşan û seci nivîsîna Kurdî nîne, belku destpêka çîroka Kurdîye jî)” (Resul, 1984- Nîsan; 15-16). Dîyar e ev boçûna Dîktor Îzedînî bi xwe serhîlneyê, belku binemayekê dîyarkirî hebûye ku nivîskar vê boçûnê bi vî rengî û bi piştrastî biêxîte berçavên şehreza û xwînerên Kurd. Her di derbarê vê çendê bi xwe jî dibêje, “gelek di sersam in, reng e razî nebin. Belê da pisyar bikin ku ew çî tişte diçe rêza çîroka û cî li çarçoveya wê tê ladan ewa îro bi helbest tê zanîn û bi pîvanên duhî helbest nebûye, belê îro bû helbest. Li vêre bineretek nûxwaz yê felsefê xwe diçespîne ew jî bineretê hîstorîzmê ye ew binerete wisa rêyekê nîşan dide ku hemû dîyarde li sînorê mêjûya xwe da bibîne û girêbidin bi dem û cihê wê ve. Bi pêy wî bineretî û sebarete vê serincê ew hîkayetên biçûk yên şêx hisênê qazî di derbarê mewludê û mifayê xwendina wê mewludê û vegêranê de. Dîsa vegêran û behs û bawerî bi dirustbûna erd û asmanî û ji dayîkbûna pêxemberî bi rengê hîkayetamêz, destpêka sade ya çîroka Kurdîye” (Resul, 1984- Nîsan; 15-16). Her wiha hatîye gotin ji aliyê Ebdilreqîb Yusif ku dibêje, “destnivîsa Bersîsê Abid, wesa xoya dike ku, Feqîyê Teyran 1307-1376 yekem û çîrok nivîs bûye” (Xelîl, 1995; 5). Lê nivîskar Xelîl Duhokî li dor van çîrokan dibêje, “her çende ew çîroka helbest bi naveroka xwe çîrokin lê bi bawerîya min yên bi forma helbestê hatine nivîsîn û nakevine xana çîrokan” (Xelîl, 2002-1Temuz; 6). Ango Feqîyê Teyran ew çîroke bi şeweyê helbesta vehandîye, neko çîroka honerî (Badî, 1990-Ayar; 19). Ji ber wê yekê em jî nikarin wê wek yekem çîroka Kurdî qebul bikin, mebesta me li vir ew e ku çîrok honereke pexşanê ye.

Belê her sebarêt bi çîroka honerî û maweyê derketina wê, boçûneke dîin jî tê pêşiya me, ew boçûn jî çîroka Bo Çî Cilxiwarim ya Kerîm Seîd Zanistî ye ku bi yekem çîroka honerî tê destnîşankirin û nivîskar Reûf Hesen wê bi yekem çîrok didane. Dîsa her di rojnameya Jiyanewe yê de di jimara 15ê ya sala yekê di 16ê şubata 1925ê da kurtenivîsînek jî tê da ye ku dibêje divê navê çîrok jî lê were danîn (Reuf, 1978; 14-20). Dîsa lêkolîner Yasîn Qadir Berzincî behsa wê çîrokê dike û amajê pê dike ku çîroka Bo Çî Cilxewarim çend mehekan beriya Le Xewma yê belav bûye û dibêje, “ewa min divê amajê pê bikim çîrokeke din e ku berîya Le Xewma yê hatîye belav kirin, ew jî çîrokeke kurte bi navê Bo Çî Cilxiwarim nivîskarê wê jî mamosta Kerîm Seîd Zanistî ye. Ev çîrok di jimara 15)ê rojnameya Jiyanewe yê de yahey li roja 16 şubatê sala 1925ê de belav bûye, yanî çar mehan û nîvan berîya çîroka Le Xewma da” (Berzincî Y. Q., 1987; 23-32). Li dû vê boçûnê çîroka Kerîm Seîd ji çîroka Le Xewma ya Cemîl Saîbî kevintir e ku dikeve beriya wê.

Belê behra pitir ya nivîskar û lêkolînerên Kurdên Iraqê, çîroka Le Xewma ya Cemîl Saîbî, ewa di sala 1925ê ku di rojnameya Jiyanê pişt ra jî di Jiyaneweyê de hate belavkirin û bi destpêka çîroka honerî ya Kurdî didanin. Îzedîn Mistefa Resul dibêje, “çîroka Kurdî di navbera her du cengan de – cenga yekem û ya duyem ya cîhanî de – peydabûye û em dikarin bîrewerîyên rexneyên Cemîl Saîbî ewên di sala 1925ê di derbarê hukimdarîyeta Şêx Mehmûdê Hefîd ku li jêr nav û nîşanê Le Xewma yê nivîsî bû, wek yekem berhema çîrokî qebl bikin” (Resul, 2010; 169). Di pişt ra heman nivîskar di çavkanîyeke din de dibêje, “bi dîtina min ya niha eve destpêkeke sade û sakare bo çîrokê û regezê yekê di nav da vegêrana bûyera ye. Çîroka Le Xewma ji aliyê arasteya wê berev jîwarî, her wiha çespendina ketwarî di çîroka Kurdî de bi nîşaneyê mezîna tî hejmartî” (Resul, 1984; 19-20). Hinek rexnegir û nivîskarên din heman çîrokê bo destpêka çîroka honerî ya Kurdî dihejmêrin mîna Hisên Arif û Umer Meruf Berzincî, li dor wê çîrokê û nivîskarê wê Hisen Arif dibêje, “berîya hemû tiştan her dema em behsa vê çîrokê bikin vêca bi çî hêlên, divê ew rastîya li pêş çavê me be ku heta niha hatîye zanîn, yekemîn çîroka honerî ya Kurdî berhem hatibe û bi wê çendê dibe yekem berdê binaxa vî babetî edebiyata nû di edebiyata hevçêrxê me de. Her wekî nivîskarê wê

jî dibe yekemîn edîb ku li gorepanê dest pêşxerî kiribe û dibe yekem çîroknivîsê Kurd” (Hiseîn, 2011; 15).

Hokarên destnîşankirina çîroka Le Xewm, wekî yekemîn çîroka honerî ya Kurdî bi dîtina Umer Meruf Berzincî bo wê yekê dizivire, “çikû eger bê û em rojnameyên berîya wê demê bipişkinîn çî babetan nabînîn ku sîmaya çîrokî pêve hebe, ji ber hindê ev kare bi kilîla dergehê tê zanîn di mêjûya edebiyata Kurdî de” (Berzincî, 1978; 17). Lê ev bi dîtina nivîskar û rexnegiran rast û dirust nîne, çiku çîrok li ser berperên çendîn kovar û rojnameyên li pêş wê serdemê de hatine belavkirin, çîrok bi sîmayên xwe yên nû ve hatîye nivîsîn, bo mînak di kovara Rojî Kurd 1913 li Bakûrê û rojnameya Pêşkewtin 1920-1922 li Başur û gelek rojname û kovarên din hatine dîtin, li dor vê çendê Perêz Sabir, destpêka çîrokê bo mêjûyeke kevintir ji mêjûya derkeftina çîroka Kurdî Le Xewma ya Cemîl Saîb dadinê û dibêje, “ewa rastî bî mêjûya serhildana çîroka honerî ya Kurdî li nav Kurdên Başur ji vê mêjûyê kevnartir e ku heta vê demê behs lê nehatibe kirinê û di vê destpêkê çend salekan dizivire berîya hingî, çiku berîya derketina rojnameya Jiyanewe-1924 û Jiyan-1926 û rojnameyeke din li bajarê Silêmanîyê derket li ser berperên wê rojnamê çavên me bi çend mînakên sade yên çîroka honerî ya Kurdî dikeve ku heta niha behsa wê nehatîye kirin ew jî di rojnameya Pêşkewtinê ku di sala 1920-1922ê derdikeve” (Mihemed, 1993; 45). Bêguman vê çendê jî biha û pêgehê taybet heye li hêlên tomarkirina mêjûya destpêka çîroka honerî ya Kurdî ku çend salan vedigere piştra û destpêkeke kevintir bo dinivîse. Weke çîroka Teme û Cawbirsî û çîroka Bayexî Cildirû û Muflîs û Byekar di rojnameya Pêşkewtin û çend mînakên din,” Her wiha Hîmdad Husên heman boçûn heye, destpêka çîroka Kurdî li Başur da bo ewan kurteçîrokên di rojnameya Pêşkewtinê de belavbûne, vedigerîne û dibêje, “bo çîroka Kurdî jî li Başur da dikarin wan girêya û kurteçîroka li rojnameya Pêşkewtin 1920-1922 de hatîne belavkirin bi destpêka bidanîn bo derketina çîroka Kurdî” (Husên, 2010; 88-89).

Eger em berê xwe bidine van dîtin û boçûnan, dê bibînîn hemû destpêka çîrokê di sinorê Başur da destnîşan dikeîn û behra pitir jî dibêjin çîroka yekemîn li Başur hatîye destpê kirin. Lê eger em bi wirdî li hemî perçên Kurdan binêrin, dibînîn destpêka

peydabûna çîroka honerî ya Kurdî bo mêjûyeka kevintir dizivire, “ji ber ku ji dewruberê cengê yekem yê cîhanî heta dawîya destpêka bizutneveyeka rewşênbîrî kete di nava Kurdên Bakûr û hinek rojname û kovarên mîna Kurd û Rojî Kurd û Hetawî Kurd belavkirin ku ta radeyekê baş rêyek xweşkir û amadekir bo kesip bûna bawerîyê û hestpêkîrnê û serbestîyê” (Berzincî, 1978; 8). Her dîsa di nava van kovaran da girîngîyeke taybet bi ziman, edebiyat, mêjûya Kurdan hatîye dayîn. Bi taybetî di kovara Rojî Kurd de, “ev kovar bizaveka bêwestan bo edebiyata Kurdî kirîye, gelek ji laperên xwe bo edebiyat û ziman û mêjûya Kurdî terxan kirîne. Heke em berê xwe bidine laperên kovara Rojî Kurd, dê bibînîn ku bara pitir ji laperên vê kovarê gotarên edebî ne, belê ya ku pitir bihayê vê kovarê giran dike û pey sikawê bilind dike, ew e ku yekemîn kovara Kurdî ye, yekemîn çîroka Kurdî nivîsî bi şeweyeke honerê çîrokê...” (Hecî, 2007; 49-50). Ev rastî ye di derbarê yekemîn çîroka Kurdî di wê kovarê de hate dîyarkirin, piştî “Kemal Mezher gotarek di kovara Almîseqef Alcidîd ya zimanê Erebi, jimara 71 di sala 1975ê belav kir û tê da dîyar kir ku yekem çîroka Kurdî ya Fuadê Temo ye û piştî Camel Xezneder her sê jimarên kovara Rojî Kurd di sala 1981ê de belav kirin ew çîrok di du jimarên wê da belav bûn û ew çend bi yekem çîroka Kurdî li qelem dan” (Xalid , 2010; 43). Pişt re çend lêkolîn li du vê yekê hatine nivîsin, ji aliyê çendîn nivîskaran metnê wê hate saxkirin, yek ji wan nivîskaran jî Reşîd Findî bû. Ew li dor vê çîroka ku di kovara Rojî Kurd hatîye belav kirin dibêje, “şînwarê edebî ji hemû dîyartir – bi fikra min – çirokê Kurdî ye, ya di hejmara yekê û dûyê da hatîye nivîsîn û li hejmara sêyê hatîye piçrandin, her çende temam nebûye li dû gotina xwe dibêje ku li dûmahîka xelesa dûyê nivîsî yê..... nivîskarê vê çîrokê Fuad Temo ye, ku divêt bi yekemîn çîroknivîsê Kurd bihête hejmarê û çîroka wî yekemîn çîrok.....” (Reşîd , 1983 Nîsan; 34).

Bi dîyarbûna çîroka Fuad Temo yî di nav Kovara Rojî Kurd li Stenbolê di sala 1913, zarevaka edebî ya taze ye, ku wateya cureyekê edebî ya nû digehîne li mêjûya edebiyata Kurdî din serhilda. Çîroka li vir û bo vî rexî (çîrok) cureyeke taze ye, navek ji boy xwe werdigre û dê pesend ke û belev dibe, eve yekemîn çîroke bi pênuşê Fuad Temo nivîsiye (Pîrbal, 2000 Eîlul; 8). Eve bû egerê wê çendê ku “hindek nivîskar, vê çîrokê bikin belge, wan boçûnan ret bikin ewên pêş dîyarbûna vê çîrokê, bo destpêka



çîroka Kurdî hatîne destnîşankirin” (Kerîm, 1985 Tişrîna yekem; 17). Kewate ligel dîyarbûna vê çîrokê destpêkeke din bo çîroka honerî ya Kurdî dihête danan û ev çîrok bi yekemîn çîroka Kurdî dihête li qelemnêdan. Li dor vê yekê Şukrîye Rasul dibêje, “yekem çîroka honerî ya Kurdî li rêya kovara Rojî Kurd ya gehîştîye me di sala 1913 de li Stenbolê hatîye çapkirin” (Resul , 1989; 211). Her wiha nivîskar Cimşîd Heyderî e vê boçûnê dûpat dike, dema dibêje, “digel derçûna kovara Rojî Kurd cureyê çîrokê ji dayîk dibe, ku ciyawazî heye digel çîroka (hîkayet) ya folklorî, ku di nav Kurdan de zor ya berbelave. Çikû bo cara yekem çîrokê navê nivîskarî yê pêve û bi hêza mejîyî û dahênanên taybet yên take mirovekê nasîyar ku bi vî rengî hatibe belav kirim” (cemşîd, 1993: 24). Di derbarê mebesta van lêkolîneran çîroka Şewêş ya (Fuadê Temo ye ku Şewêş navê kesayetê sereke yê çîrokê ye. Ligel ewan dîtînen derbarê çîroka Şewêş hatine dîyarkirin, lê hindê nivîskarên din ewan boçûnan ret dikin û destpêka peydabûna çîroka honerî ya Kurdî bo mêjûyeka dûrtir dizivirînin. Bo mînak Ferhad Pîrbal dibêje, “serhildana cureyê çîrokê di edebiyata Kurdî de vedigere bo 57 sal berîya 1913an” (Pîrbal, 2000; 5). Wate mebest jê metna Mem û Zîn ya Mela Mehmûdê Bayezîdî ye ewa di sala 1856z. bi dîyalekta kurmancîya jorî nivîsî. Bi dîtîna Ferhad Pîrbalî “ta wê demê niha, hîç çîrokeke din, berîya vê metna 1856an li cem nivîskarên Kurd nehatîye nivîsîn. Ev e li demekî Mela Mehmûdê Bayezîdî, pêy nivîsîna vê Mem û Zînê. Xwedanê çend çîrok û pexşanên din e, yek ji wan jî çîroka Leyla û Mecnûn e, digel çil kurte çîrokên din, vêca ya di cihê xwe de nav li Bayezîdî bê danîn: yekem çîroknivîsê Kurd” (Pîrbal, 2000; 30). Li gor vê boçûnê mêjûya çîroka honerî ya Kurdî bo sed sala 19ê dizivire û Mela Mehmûdê Bayezîdî dibe yekemîn çîrok nivîsê Kurd, lê eger em li van çîrokan binêrin û ligel ew xizmeta bi rêya wan Mela Mehmûdê Bayezîdî pêşkeşî tore û torevanî ya Kurdî, bi taybet di beşa pexşanê da kirî. “Divê ew li bîra me be ev Mem û Zîna wî, puxta Mem û Zîna Xanî ye, belê bi pexşan hatîye nivîsîn. Ew çil çîrok jî ..... hemû hîkayetên millî û bûyerên Kurdewarîne û bi qalibê çîroka honerî nehatîne nivîsandin” (Teha, 2002; 114).

Ji wan hemû boçûnên hatîne dîyarkirin, digehîne wê rastîyê ku yekemîn çîroka honerî ya Kurdî li hemî parçên Kurdan, berîya cengê cîhanî yê yekem derketîye, ku bo sala (1913)ê di kovara Rojî Kurd li Stenbolê dizivire, bi nave Şewêş ya Fuad Temo yî,

çikû piranîya mercên nivîsîna çîroka honerî ji naverok û ruxsar di navda hatîne peyrewkirin. “her çend kurt e û tamam nebûye jî, belê sistemê derebegayetî diêxîte jêr pisyarê; jiyana gelekî zehmet ya xêzaneka hejar ya gundekê Kurdan derdibire. Talankirina kur û bavekî bi dest zulma axayê gundê wan nîşan dide. Li rexê honerî ve jî bi pêçewaneya hîkayetê bayezîdî, dîyalog û monolog û girê û şîrovekirina soz û endêşa pehlewaniya tê de, bêyî vê çendê jî hîkayet û hebû nebû, demê niha bo vegêrana bûyeran bi kar anîbû” (Pîrbal, 2000 Eîlul; 8). Ji bilî vê çîrokê di heman kovarê de di hejmara (3) çîrokeke din bi navê Çîroka Kurmancan bi navê Kindo hatîye belavkirin (Şeban, 1989; 7-6). Bi vî rengî kovara Rojî Kurd dibe destpêşxer di belavkirina çîroka honerî ya Kurdî de. Pişt re di Kovara Jînê de, ewa di sala 1918-1919ê da li Stenbolê derdiket, Ebdulrehîm Rehmî du-sê çîrokan bi zimanê turkî di nav de dinivîse, her çende ew çîrok bi zimanêke bîyanî hatine nivîsîn, lê neveroka wan behsê jiyana Kurdan û kesayetîyên Kurd dike (Pîrbal, 2001 Payîz-Zivistan; 59). Kewate û li gor boçûna Cemşîd Heyderî, “ew çîrokên di Rojî Kurd li piştî belavkirina heta ku digehîte salên sihan, bi pêngaveke destpêkî li qelem dihête dan li biwarê peywendîya pexşana honerî li edebiyata Kurdî de” (Cemşîd, 1993; 24).

Helbet kovara Rojî Kurd û çend kovar û rojnameyên din berhemên bizava azadîxwaz a rewşenbîrîya Kurd bûn ku di maweya sala 1890ê heta destpêka cengê yekem yê cîhanî. Li gor Celîlê Celîl xebata rewşenbîrên Kurd destpê dike û rêxistinên sîyasî û civakî yên Kurdî tîne damezrandin û çap û rojnamenivîsîya Kurdî neku her tine peyda dibe, karekê mezin û girîng dike ji bo xemilandin û pêş ve birina tevgera azadîxwaz a Kurd li hemî parçeyan” (CelîlCelîlê, 1985 (b. c); 8). Bi taybet piştî “sala 1907 turkên genc rê bo Kurdan vekirin bo ku belavkirin bi zimanê Kurdî hebin. Lewra em ê dê bibînîn li gel vê dîrokê rojnamegerîya Kurdî xurt dibe û li şûna li qahîre û li dûrî wellat derkevê, xwe nêzîkî xwêndevarîyê kir û li Stenbolê û Dîyarbekirê rojname û kovarên Kurdî belav bûn” (Qadir, 2006; 14). Ev çendê jî ya berdewam bû heta piştî cengê yekem yê cîhanî. Her digel bi dawî hatina vî şerî û nemana împiratoryeta usmanî, rewşa deverê tûşî gihertinên mezin ên sîyasî bû, digel da rewşa rewşanbîrîyê û edebî hate guherîn. Li Turkîya û piştî gehiştina Ataturkî li ser desthelatê bo avakirna Komara

Turkî di sala 1923ê “hemû rêkxiraw û yane û qutabxanêyên Kurdî hatine daxistin û bikaranîna zimanê Kurdî hate qedexekirin. Li Îranê jî zimanê Kurdî li qutabxanan û dam û dazgehe hukumî û poşîna cil û bergên Kurdî qedexekirin û navên bajarên Kurdî bi navên Farisî hatine guhartin” (Teha, 2002; 41). Lê li Iraqê rewşa rewşenbîrîyê û nivîsînê û xwendinê bi zimanê Kurdî baştir bû. Di vê bîyavê de çend bizav hebûn, ew jî “piştî ewê ku Iraq bû dewlet û ew mercên li ser sepandin ku pêwîste mafê rewşenbîrî yê Kurdî were dayîn bi gelê Kurd, eve pişgîrîyeke baş bû bo serbarê rewşanbîrîya Kurdî” (Salih, 2005; 65) Lewra çendîn çapxane û rojname û kovarên Kurdî di vê demê de li Bexda û hindek bajarên Başur bi taybet li sulêmanîyê derketin, mîna “damezrandina Çapxana Beledîye yê li sulêmanî yê û Zarî Kirmancî li rewandizê bo çapemenîya Kurdî û derxistina 11 yazde rojname û kovaran di demê kêmtir ji deh salan de (1918 heta 1927) û destpêkîrin bi xwendina zimanê Kurdî” (Hiseîn, 2011; 12). Di vê maweyê de navçeyên Kurdan li jêr desthilatdarîya hukmeta Berîtanîya bû, “desthilata hêza Berîtanîya hewil dida Kurdan bo xwe bikêşît. Bo vê mebestê di destpêka sala 1918an de rojnameya Têgeyîştinî Rastî bi zimanê Kurdî li Bexda derdikeve” (Teha, 2002; 41). Ligel hindek rojname û kovarên din ku bi zimanê Kurdî hate derxistin, her “bo belavkirin û sepandina fikra xwe û bangeşe bi derew bo xwe terxankir û terxankirina çend laperên kê mî jî po pexşanê û kurtenivîsîna nivîskarên wê serdemê” (Hîmdadî, 2001-5Eîlul; 12).

Bi gelemperî nivîsîna çîrokê di wê maweyê de heta salên sihan gelek ya kê mî û sist û xav bû. Her çend jî bilî nivîsîn û belavkirina çîroka Le Xewma yê di sala 1925ê de ji aliyê Cemîl Saîbî ve ku weke yekemîn çîroka honerî li Başur tê qebul kirin. Hindek nivîskarên din dest bi nivîsîna çîroka honerî dikin, lê hejmara berhemên wan gelek kê mî bûn, ji girîngtirîn wan çîrokan, çîroka Meseley Wîjdan – yan Çon bûm be Xandan (Fazil, 1975 eîlul;15-17) ya Ehmed Muxtar Cafî ku di sala 1927ê nivîsî ye, lê li dema xwe de nehatîye belavkirin heta sala 1970ê ji aliyê Îhsan Fuadî ve li gel pêşekîyekê hatîye belavkirin. Îhsan Fuad vê çîrokê bi çîrokeke navincî di navbera kurte çîrokê û romanê li qelem dide (Caf, 2010). Her çende “hindek lêkolînerên Kurd wekî Ebdulla Debax û Adil Germîyanî li xana romana Kurdî de hatîye lêkolîn” (Sabîr, 2001 Huzîran; 7). Her wiha wê wek destpêkeke romana Kurdî li Başur dihijmêrin. Di salên sihan de çend

çîroknivîsekên din dîyar dibin. Berhemên xwe di kovar û rojnameyên wê serdemê da belav dikin, mîna Pîremêrd û Mihemed Êlî Kurdî ku “desteka bilind li nivîsîna çîrokê hebûye Pîremêrdê şair û feylesof li pişt karê rojnamenivîsîyê de gelek xizmeta gelê xwe bi nivîsînên xwe kirîye û li pişt berhemên cur be cur girîngî bi pexşan û bi çîrokê daye. Gelek çîrokên folklorî û mêjûyî bo me hiştiye (Resul , 1989; 212-213). Mîna çîroka Diwanze Siwarî Merîwan ku di sala 1933ê de di rojnameya Jiyane di hejmarên 366-376an de hatiye belav kirin (Berzincî, 1978; 32). Dîsa Mihemed Hêl Kurdî di vê qonaxê de û li naverasta salên sîhan dû çîrokan belav dike, ya “yekem çîroka Diway Serxweşî Zor Şetî ye ku di sala 1934ê de di Dîyarî Lawan de belav kirîye. Ya duyem jî bi navê Nazdar yan Jinî Kurd le Ladê ku di kovara Ronakî de hatiye belav kiri” (Hiseîn, 2011; 38).

Bi giştî ew çîrokên di wê maweyê de derketin, ji aliyê lêkolîneran ve bi çîrokên qonaxa destpêk û serhildanê tên danan û bi netemamî û sadeyî tên li qelemdan. Her wekî Umer Meruf Berzincî bo wan çîrokan dibêje, “bi çavgêraneke bo nav hemû berhemên ku ji qonaxa yekem ya çîroka Kurdî de nivîsîne li berperên edebiyatê de hatine tomarkirin û dîyardeyeke berçav tê dîtin û jê nayê cudakirin ku pêktê ji netemam kirina çîrokan û bi cih hêlana wan berîya temam kirinê wekî Le Xewma, Meseley Wîjdan, Nazdar, Duwanze Suwarey Merîwan li hêlekê divê babetên wê serdemê û şewazê nivîsîna sercemê wan vegêrana û bi beyannameyeke sakar ketine berçav” (Berzincî, 1978; 40).

Eger em ji sinorê Bakûr û Başur derkevin, berev parçeyên din yê Kurdan biçin, bi taybet li parça Kurdên Roj ava dê bibînîn ku hejmareke berçav ji wan çîrokên li ser berperên wan kovar û rojnameyên li wê demê de hatine weşandin, çîrokên honerî ne. Ew çîrokên bi temamî her ji destpêkê heta dawîyê hatîne nivîsîn û heta radeyekê baş mercên nivîsîna çîroka honerî bi taybet ji aliyê çîroknivîsên kovara Hawarê ve di nav da hatine peyrew kirin, ev car “çi ji aliyê asta rewşanbîrî û çi ji aliyê asta teknîkî yê çîrokan ve bilindtir û honerîtir bûn ji wan metnên çîrokên Başur (Dewlet, 2001).” Lewra ji ber vê yekê Merîwanî Umer Dewlet çîroka Ber Tevna Mehfûrê ya Mîr Celadet Elî Bedirxanî” (Bedirxan, 1932-3 Tîrmeh; 1-3). Ku mêjûya nivîsîna wê her wekî di dawîya çîrokê de hatiye dîyarkirin bo (5/10/1927) li beyrutê dizivire, ango pêş belav kirina wê bi 5 salan;

bi yekem çîroka honerî ya Kurdî ku bi awayeke temam hatîye nivîsîn dijmêre, lê ji aliyê belav kirinê ve çîroka Du Egîd ya Kamiran Bedirxan yê (Bedirxan K. A., 1932-1Hizeran; 7-8) li pêşîya wê datanî û dibêje “zor rastgoyane di karîn evê çîrokê wekî yekem çîroka honerî û temamkirî li mêjûya çîroka honerî û kurteçîroka Kurdî de were danîn, belê ji aliyê çapê ve û belav kirinê. Vêca ew çîroka Du Egîd asta yekem çîroka honerî ji mêjûya wê azmûnê de werdigire, çikû çîrok li jimara 2 ya kovara Hawarê da hatîye belav kirin wate du jimare pêşîya jimara 4 an ku ew jî çîroka Ber Tevna Mehfûrêye” (Dewlet, 2001; 34).

Kovara Hawarê (1932-1943) yek ji çand û berhemên binemala pir bizav, xebatker, Kurdperwera Kurd binemala bedirxanîyan bû. Di wê demê li Bakûr, ji egerê wê rewşa xirab, ku “li Turkîyê Kurd dihatine înkarkirin, zimanê Kurdî wek zimanê turkên çîyayî dihate dîtin, Celadet Bedirxan daket gund û bajarên Kurdan, dest bi vehandina gotina û peyvikên Kurdî kirin, dest bi weşandina kovarekê kir, di nav weşanên kovarê da dest bi weşandina pirtûkên bi Kurdî kir. Her wiha wî gelek xwort li dora xwe civandin ew hînî nivîsandina Kurdî kirin” (Xelîl, 2014; 100). Piraniya wan xort û gencan “birêveber û çalakvanên sîyaseta Kurdî bûn û piştî şikestina şoreş û serhildanên Kurdên Bakûr berê xwe dabûn bin xetê – surîyê. Li wir jî gelek ji wan dîsa bûn bi rêveberên tevgera sîyasî, bi taybet Osman Sebrî û Nuredîn Zaza ku serokatîya tevgera sîyasî ya Kurdên surî kirin. Yan jî li bin xetê beşdarî tevgera sîyasî û çekdarî ya Kurdên bakur dibûn” (Helîm, 2001; 13). Bi vî rengî gelek sîyasetmedar û xebatkarên Kurd welatên xwe li cih dihêlin, qesta deverên din dikan, heta ku berdewamîyê bi bizav û xebatê xwe bikin. Ligel hindê gelek ji wan sîyasetmedaran, nivîskar, şair û çîroknivîsên desthel û jêhatî bûn, ango “wan xwe bi tenê bi warekî ve girênedabûn. Lewma, navên wan di dîrokê de carina wek kesên sîyasî derdikevîn hemberî me carinan wek helbestkar, carinan wek zimanzan, carinan wek dîrokvan, carinan wek çîroknivîs derdikevin pêşber me” (Firat, 2003; 16). Bi vî awayî ew li Surîyê û Libnanê dest bi karê xwe yê edebî û çandî dikan, pêxemet parastina ziman û edebiyat û rewşenbîrîya Kurdî. Her wiha geşekirin û pêşvebirina wê “ku li wî çaxî Surîyê li jêr desthilaya Firensa de bû (1920-1946), berêxwe dana Firensîyan li hemberî Kurdan girêdayî bû bi berjwendîyê

wan ên di navbera wan û turkan. Li dû vê sîyasetê hindek caran rê bi çalakîyan didan û hindek caran jî rê li hember wan digirtin” (Mihemed, 2002; 27). Di her demê rê li hember bizavên wan dihate vekirin wan nivîskar û ronakbîrên Kurd, dest bi bizav û çalakîyên xwe dikirin. Çi çarokê bê desthelat û şîyan li hember pêşvebirina rewşenbîrîyê, edebiyat û zimanê Kurdî ranewestîyane. Di destpêka salên sihan de “çendîn rêxirawên rewşenbîrî û neteweyî, kor û komelên edebî û zimanî li bajarê dîmeşqê dirust kiribûn, di nav jiyaneke edebî û rewşenbîrî û neteweyî dewlemend û berfireh de dijîyan” (Pîrbal, 1997-25 Ab; 43).

### **3.3 Taybetmendîyên Çîroka Honerî ya Kurdî**

Çîroka honerî ya Kurdî helgira çend sîma û saloxên û taybetmendîyên cuda ye, bi wan sîmayan, ji çîroka netewe û gelên din ên li cîhanê tê cuda kirin. Çîroka Kurdî her ji serdemê peydabûna wê, “destpêkeke tijî pirşengdar û bilind bû. Bi sedan reh bi waqî û xelik û zevî û millet û mêjûyê hatibû girêdan. Şanazîye bo çîroka Kurdî ku her ji destpêkê hatîye girêdan bi edebiyatê ku bo jîyan û aramîyê û bextewerîyê di cengê, ser bi rêbazeka mezin ya edebiyata dunyayê ye ku şerefa amancê û xebatê pê daye, ser bi realîzmê ye” (Resul, 1984- Nîsan; 10-11). Bi wateyeke hûrtir çîroka honerî ya Kurdî her di qoxanên destpêka peydabûna xwe de, “ser bi rêbaza realîzma rexnegîrîbû, çikû her ji destpêka erkekê dîyarkirî pê raspar dibû ew jî bi karanîbû ku weke hokarek ji hokarên rexne girtin û giherîn û başkirina wê barûdoxa sîyasî û aborî û komelayetî yê ne guncayî destê xwe li ser waqî civaka Kurdî kişandibû” (Mihemed, 1993; 352). Kewate sererayî bihayê çîrokê yê edebî û honerî, her wiha di nav edebiyata Kurdî de wek pêdivîyek û amrazek ji bo berçav kirina rewşa xirab ya millet ji hemû layekî ve hatîye bikaranîn, digel hindê jî “çîrok bi asta yekê, dengê texên jêrî yê civakî ye. Dengê wî takê bê hêz e ku dengê wan yê ketîye û nekarin derbirîne ji azarên xwe bikin. Wekî çawa çîrok cureyek girîng yê edebiyat û honerê ye, ji ber hindê daxwazeke civakî ye, heta ku deng û gazîya takekesîye” (Hesen, 2012; 21).

ji hêla ruxsar û şeweyê dariştinê ve çîroknivîsê Kurd li dû rewşa deverê ya sîyasî û roşanbîrî û civakî, teknîk û awayên nivîsîna çîroka honerî di nav da berceste kirine. Ango çîroka honerî ya Kurdî ji vê hêlê ve, “xwedan şewaz û derbirîna taybet bi xwe ye û merc nîne, bingeh û binamayê wê, kir û pit ji şewazê dariştin û çinîna kurte çîroka honerî ya milletên din biçe. Çikû bar û doxê sîyasî û komelayetî û rewşenbîriya me ji wan texa ye” (Agrîn, 1999; 48). Ji ber hindê “her ji destpêka serhildanê bûye beşek ji mêjûya komelayetî û sîyasî ya gelê me” (Reşîd, 2010; 262). Her li dor vê yekê Celîl Kake Weyîs dibêje “çîroka Kurdî bêhna xaka Kurdan helgirtî ye” (Rama, 1997-5 Temuz; 90).

Karwanê çîroka honerî ya Kurdî her ji serdema peydabûna wê heta niha li ser çend qonax û serdemên cuda derbas bûye. Her serdemek bi giherînên xwe yê civakî, sîyasî, aborî, rewşenbîrî ve kartêkirin li ser peydabûn û pêşveçûna çîrokê de hebûye. Di her qonaxêke mêjûyî ya çîroka Kurdî di nav de derbas bûbe, heta radeyekê zor reng vedana wê serdemê û rewşa Kurdan bûye ewa çîroknivîs di nav de jîyayî. Bi wateyêke din çîroka Kurdî her “di demê serhildanan de jî ramana yekem çîroka honerî ya nivîskî bi çend qonaxên destpêkî derbas bûye ku her qonaxek rengvedana barê komelayetî û aborî û metriyala wê serdemê û siruşt û şewe û naverokeke ciyawaz heye û ji hêlan honerî ve li serê pênuşekî şikestî dikarî ji hev cuda bike û asta pêşkeftinê dest nîşan biket” (Berzincî, 1978; 15).

Çîroka Kurdî mîna çîroka gel û neteweyên din li cihanê ji efsane û hîkayet û serhatîyan dest pê dike, heta ku sedê bîstê bi tenê ev rengê çîrokan di nav Kurdan de berbelav bû. Ango “çîrok di nav Kurdan de heta serdemên dawîyê û belku heta serdemê bîstê birîtiye li serhatî û hîkayetên ku li mêjûyêke berîya wê demê rûdaye û pişt ra bi şevan li cem agirekî runiştîne û ji aliyê yekî hatîye vegêran, wan ji bi hesteke baş guhdarî li wan kirine” (Elaedîn, 1978; 168). Li dû hêdî hêdî bi pêşveçûna demê û giherîna jiyane ji hemû hêlên aborî, civakî, rewşenbîrî ve ew cureyên çîrokan digel de hatîne giherîn, bi rengêkî ku derbirîne ji kêşe û nexweşî û azarên xelkî yê serdemêyane bikin. Çikû edebiyat bi hemû pişkên xwe ve, di her serdemekê de xwedîka civaka wê serdemê ye, bi taybet “çîrok zêdetir ji regezên din girêdayî li serdema xwe ve ye ku tê da

dihête berçav û girêdayî ye bi hêlên takekesî û nivîskarî û ronakbîrên wê serdemê, belavbûna her rêbazekê û babetekê di serdemeke dîyarkirî de karîgerîya xwe heye li ser destnîşan kirina cureyê derbirînê û şewaza wê ji pal hizirkirin û rewşenbîrîya nivîskarê xwe” (Salih, 2010; 272). Lewra em dibînîn çîrok ji wateya xwe ya kevin ve “di sedê bîstê da ew têgeh hate guhertin û çîrok berev çarçoveyeke din çû, çû di nava wê çarçoveyê ku berteg û kêşeyên civakî çareser bike û ji hemû dinyayê girîngîyeke zor pê hate dan” (Elaedîn, 1978; 171). Her wiha ji hêla ruxsarî ve bi awayeke cuda û taze hatiye dariştin, teknîk û îstatîkên honera çîroknivîsînê di nav da hatine peyrew kirin, li ser çîrokên dirêj û kurt de hatine dabeşkirin, lê ev giherîn bi yek carekê peyda nebûne. Belku ast ast digel qonaxên çîroka nû ya Kurdî pêşveçûye. Ligel hindê divê em vê rastîyê jî ji bîr nekin, “ku folklorê her milletekî jêderê û rêxweşkerê bûye bo handera vê şewaza honerî. Kurd jî wek hemû dizanin ji vê hêla dewlemend û karên rastewxo jî kirîye ser çîrokê” (Salih, 2005; 66-67).

Bi şeweyeke gelemperî kartêkirina folklorê di hemû qonaxên çîroka honerî ya Kurdî de tê dîtin. Çîroknivîsan bi rengê rastewxo yan ne rastewxo mifa ji vê samanê wergirtine û li jêr kartêkirina wê berhem û çîrokên xwe nivîsandine. Mina “nivîsînên mamostayê nemir Pîremêrd û Qela Dimdim a Erebe Şemo, Şêhîdanî Qelay Dimdim a Mistefa Salih Kerîm û Kaweyê Asinger ya Şêrko Bêkes û Şewyek le Jiyânî Xanzad ya Hime Kerîm Hewramî” (Sabîr, 2002; 138). Bi taybetî di qonaxa destpêka çîroka honerî ya Kurdî de ev kartêkirin bi rêjeyeka pir tê dîtin, di wê qonaxê de folklorê Kurdî keristeya behra pîranîya babetan bû.

Çîroka honerî ya Kurdî ji qonaxa destpêkê heta destpêka salên sihan (1913-1932), heta radeyekê çîrokeke sade û sakar bûye. Zêdetir regezê vegêranê di nav de yê amadebûye, pitir nêzîkî vegêreneke witarî û raportî bûye, ku li ser zarê vegêrî yan çîroknivîsî hatîye vegêran, ango “çîroka Kurdî di destpêkê şewazê vegêranê rûkeş û rîportajî û sadehî pê ve dîyarbû. Çîroknivîs bi gelemperî bi şeweyê hikayet vegêr û karesatên çîrokên xwe vedigêrandin û hinek caran jî berê xwe didan xewn û xeyalan bo vegêrana bûyeran” (Ezîz, 1987; 62).



Di derbarê mijarên çîrokên di qonaxa destpêkê de, her ji nivîsandina yekem çîrok di sala 1913ê de bi navê Şewêş ya Fuad Temo, heta radeyeke mezin rengvedana jiyana civakîya wê serdemê bû û her wiha berçavkirina êş û azar û derdên xelkê bîndest û hejar bû. “serukanîya wê dide xûyakirin ku nivîskar dixwaze aşîtiyê bixe navbera axa û gundiyên Kurdan (Hesen, 1990; 71-72). Bi gelemperî piraniya çîroknivîsên wê qonaxê wekî babeteke honerî serederî ligel çîrokê nekirîne, belku bo gehandina peyamekê yan mebesteke sîyasî yan kêşeyekae rojane hatîne nivîsîn. Bo mînak bikaranîna teknîka çevengî di qonaxên destpêkê yê çîroka honerî ya Kurdî de bo mebesta îstatîkî bi karnehatîye. Belku çîroknivîsî bo veşartina mebesta çîrokê ji egerê hokarên sîyasî bi kar anî ye.

Şewazê çîrokên qonaxa destpêkî “zêdetir li ser rêbaza realistî bûn lê di naveroka wan de zêdetir behsa bûyerên wê serdemê û kêşeyên sîyasî û komelayetî dihate kirin, wek çîrokên Cemîl Saîb û Ehmed Muxtar Caf ku çîrokên wan zêdetir li ser rêya rexnekirina komelayetî û sîyasî bûn” (Salih, 2010; 71-72). Her wiha dîsa sîmayeke din yê çîrokên wê qonaxê ewên li Başur dihatine belav kirin, “weke destpêka serhildana sîmaya çîroka Îraqa Erebî xewinhembêz dîyar e ev jî her du karîgerîya yek av bûn li ser wan. Her du yan jî ji çavkaniyekê serhildan bi taybetî agahdarîya çîroka Kurdî bi çîroka Îraqa Erebî” (Sabîr, 2005; 23-24). Bo mînak çîroka Le Xewma ya Cemîl Saîbî ku bi rêya xewnê rexne li sîyaset û desthilatdarîya Şêx Mehmedê Hefîdî girtîye, ligel wê çendê hêlên civakî û hevrikîya texayetî jî di nav de hatîye rengvedan. “Nivîser bi ciwanî bala wê serdema tal ya Kurdî nişandaye û şîyaye dîmenên tal û ciyawazîya çîneyetî û peristin û derew û delesên mirovên dîni û durûtiya wan tîne berçavan” (Ehîlam, 1999; 23).

Bi gelemperî di çîrokên qonaxa destpêkê de, wênekirina rewşa civakî ya wî serdemê û ciyawazîya çîneyetî ji wan babetên zal bûn ku di gelek çîrokên wê serdemê de cih ji xwe re digirtin. Lewra hindêk lêkolîner “gehiştne wê rastîyê ku nivîskarên Kurd – ew serdem – bi tenê ji hêlekê ve destnîşankirî ve vekolaye û hêlên din yê wê serdemê piştguh kirine. Bo nimûne aliyê civakî bi hêz aşkerakirîye û şernîxa texayetî di civaka Kurdewarî danîne pêşçav bêyî ku hindêk mercên honerî yê tamam hebin di nivîsîna çîrokê de” (Yasîrî, 1999; 74). Bi vî rengî her nivîskarek bi şeweyeke cuda ev babet çî

yên sîyasî çî jî civakî pêşçav kirine. Bo mînak Pîremêrd, “ji folklorê Kurdî û ji mêjûya Kurdewarî çîrok dianî û wan dixiste qalibekî – heta radeyekê– nû bû. Weke çîroka Mem û Zîn û Diwanze Siwarey Merîwan” (Resul, 1984- Nîsan; 10). Nivîsîna van çîrokan û çend berhemên din yê pexşanî “reng e kartêkirina edebiyata turkî be ku di wê serdemê de li Stenbolê bûye û ew terze çîrokên folklorî û darêştina wan bi şêweyê honerîberiz berbelav bû. Ji bilî edebiyata turkî, edebiyata Farisî jî karîgerî li ser behra pexşan û çîroknivîsîna Pîremêrdî dikir. Bi taybetî jî darêştina çîroka millî û folklorî û mêjûyî ku weke qonaxa yekem ya çîroka Farisî jî berbelav bûye (Husên, 2010; 96-97). Her wekî ew bi xwe vê rastîyê bo me dîyar dike, “bi her hale Pîremêrdî mebest ji van nivîsînan zêdetir derbirîna hizirên xwe bûye, yê di derbarê derdê komelayetî yan rewîşit û reftarên xelet yan ragihandina pend û amojgarîya di derbarê jîyanê de” (Resul, 1984- Nîsan; 10).

Ji hêla ruxsarî ve çîroka Kurdî di ewê qonaxa destpêkê de, tê saloxandin bi vegêraneke sade û sakar. Her wiha saloxandineke dûr û dirêj e ev saloxandin. Her tiştêk bi tenê ji derve û li dû hez û dîtina nivîskarî ya yek hêlî bo tiştên dihate wêne kirin û saloxdan. Kesayetî û bûyer û ew peywendîya di navbera wan de ji hêlekê ve, di navbera regezên din ji hêleke din ve li dû hez û vîyana nivîskarî dihate nîşandan bê girîngîdan yan nezanîna wî di pêkhatyên çîrokê yê dirust de. Her wiha şunwarên fantazîya di nîşandana bûyeran de û di dîyarkirina kesayetîyan de yan bi giştî di saloxanda û kiryara vegêrandinê de nayê dîtin, lê ew bi regekê sade û destpêkî pêş ve diçe” (Xelîl, 2014; 118). Ev çende ji bo honereke nû serhildayî tiştêke asahîye çikû “berçavê hemû dahênanekê nû bi sadehî û sakarî dest pê dike û li çav pileyên dûv de bi sade û sakarî jî nayê berçav” (Hiseîn, 2011; 13). Ji hêlekê din ve ligel sade û sak arîya ruxsar û teknîka honerî ya çîrokên di qonaxa destpêkê de, “belê şîyane naverokê bi başî bînine berçav ..... bi kurtî şîyane bibine şahidê serdema xwe” (Hîmdadî, 2001-5 Eîlulê;13). Çikû çîroka honerî ya Kurdî di qonaxa destpêka xwe de bû, vêca ew ji babetên sade û bêtam yê vala nebûne. Wate di wê qonaxê de nivîskaran gelek çaran “babetên û kevn û bêtam bi nave çîrokê belav kirin ku di nav nayên vehewandin. Her wiha çend babetên din yê sade hatine belavkirin li ser şêwazeke kevin bi rengê çîroka Biznuke û Meruke ya Husên

Huznî Mukriyanî ku berîya hemûyan û di bineret da bo zarokan hatîye nivîsîn (Berzincî, 1978; 40). Lê ev tiştekî ji biha û girîngîya çîrokên din yê ku xwedan naverokeke realîstî û girêdayî bi jiyana Kurdan bûn kêma nake.

Weke encam, çîroka honerî ya Kurdî ji hêla ruxsarê û naverokê ve di qonaxa destpêkê de tê saloxdan ku girîngî bi hêlên wan yê honerî nehatîye dan. Heta radeyeke mezin ev hêl di çîrokan de hatine feramoş kirin, belku pitir girîngî bi hêlên naverokê ve hatîye dan û gehandina mebesta çîroknivîsî armanc bûye. Bi wateyeke din şeweyê nivîsîna çîrokê “rabort nivîsîn bûye feramoş kirina ruxsarî da ku naverokeke ron û aşkera bigehînin û ew jî xwe li çend behsên komelayatî weke mesela qomar û dizî û serxoşî û sifetên aza yê Kurdan û mêhvandarî û hindek hêlên dînî bo çareserkirina kêşeyên komelayetî û serbestîya jinê, nav û nîşanên çîrokan bixwe wê rastîyê tîne berçav û naveroka çîrokê bidest ve didin” (Husên, 2010; 98).

Piştî wê qonaxa destpêkî di çîroka honerî ya Kurdî de, qonaxeka nû ya pêşkeftî di sala 1932 yê de bi derketina kovara Hawarê re dest pê dibe. Di wê qonaxê de weçerxan pêşveçûneke mezin di bîyavê honera çîrokê de li ser destê hinek çîroknivîsên dest hel û behremend peyda dibe. Heta radeyeke zor çîrok ji şeweyê û naverokên folklorî û millî derbaz dibe, her wiha mijarên nû û girîng di nava çîrokên vê kovarê de serhildidin. Digel taybetmendîyên çîrokê bi timametî hêlên naverokê û ruxsarî ve tîne giherîn û bi vî awayî çîrok ji hêla honer û estetîkê bi pêş ve diçin. Ji hêla naverokê ve babetên nû û girêdayî bi doza milletê Kurd ve di nav meydana çîrokê de peyda dibin. Ango “weke lêkolînerên çîroka Kurdî li Îraqê diyarkirî ku babetên serekî “şernîxa texayetî” bû di navbera axa û cutyara ew jî ji kartêkirina çepgirana bû belê berevajî çîrokên kovara Hawarê şernîx ya netewayetîyê û belavkirina bîr û fikrên netewayetî û paldana millet berev zanîne û xwendinê” (Tahîr, 1998; 41).

Bo me dîyar dibe ku “naveroka beşa herî zor ya kovara Hawarê rengvedana bûwarê realîzmî ya wê serdema Kurdî ye” (Teha, 2002; 115-121). Ku bi gîyanekê şoreşgerane hatine darêştin û derbirîn. Ev çîrok çend salox û taybetmendîyên girîng bi xwe ve digirin, ev taybetmendî jî pir in “yek ji van, ev çîrok hemû bi Kurdî û Latînîne,

duyemîn, hemû bi lehçeya kurmancî ne, sisê, hemû xwedî naverokeke neteweyîne, çar, ne hemû lê pirî van nivîskaran di bin tesîra kultura awrupayî de ne (Pîrbal, 2001 Payîz-Zivistan; 160). Her wiha ji hêla teknîka honerî ve di wê qonaxê de bi taybet di kovara Hawarê de teknîkên nû di nav çîroka Kurdî de tên dîtin. Ango “girîngî û bayexa van çîrokan bi tenê ne ji ber çendayetî û jimareya wan e, belkû ji ber teknîk û naverok û şêwaz û zimanê derbirîne ne. Ev çîrokên kovara Hawarê ...ciyawazîyeke tamam heye digel çîroka belavkîrî yên berîya serdema xwe (1913-1932) heye. Heta ku çîrokên honerî yên wesa têdene ku bi mînakên gelek bilind û pirşingdar yên çîroka honerî ya Kurdî têne li qelemdan” (Pîrbal, 1997-25 Ab; 24). Bo mînak awayê vegêrana bi wî rengî di çîrokên kevin û qonaxa yekê da hatîye bikaranîn û hatiye gihertin ne bi tenê li ser zardevê çîroknivîsî bi rêya cînavkê kesê sêyê vegêran dihate encam dan. Belku cînavkên cuda cuda hatine bikaranîn, mîna cînavkê kesê yekê û duyê ku di hinek çîrokan de “her ev cînavke berev kûrahiya derun û bare saykolocî û babet û honer û teknîka monologê ve diçe” (Resul, 1997; 68).

### **3.4 Cudahiyên Di Navbera Çîroka Folklorî û Çîroka Honerî Ya Kurdî Da**

Çîroka folklorî ya Kurdî beşek mezin ji samanê ji gelê Kurd ji xwe re digire. Di nava edebiyata folklorî de li gel efsane û destanan cihekê mezin û girîng digire û bi zaravên ji hev cuda têne derbirîn. Di nava Kurdan de bo vî cureyî peyvên wek çîrok, hîkayet, metelok, serhatî û serpêhatî tên bi kar anîn.

Hîkayet û hemû cureyên din ên folklorî ji efsane, destan û gotinên mezinan pêk tên. Di dirêjahîya qonaxên dîroka edebiyata Kurdî de, weke çavkanî û jêdereke herî girîng û bi biha hatine dîtin û wisa hatine qebl kirin. Ji bo edebiyat û nivîsên bi Kurdî,

her weke “çewan folklor keresteyeke berfireh û zengîn bû, ji bo lêkolînên li ser ziman û dîrok û edebiyata hemû gelan, hetta dibû kereste jî ji bo zanayên komel û komelayetî û etnogirafan” (Resûl, 1979; 24).

Gelê Kurd yek ji wan gelên cîhanê ye û bi taybet rojhelatê ye ku xwedan folkloreke zengîn û berfireh e. Lê mixabin li ser vê dewlemendiyê zêde xebat nehatiye kirin û komkirin û parastin û “her tiştek hebûye ji zardevê li wê demê hatîye vegêran. Ji her navçeyeke Kurdewarî bi sedan çîrokên wisa hene ku ji pend û amojgarî, û ji dastanên rabirdû û çewa bi rêvabirina jîyanê. Belê... nehatîye parastin û zorya wan digel mirina hîkayetbêjan hîkayet jî mirine!” (Elaedîn, 1978; 169). Lê ligel vê yekê pişkek mezin jê maye, ew serhatî û efsane û hemû pişkên din ên folklorî ewên ji hêla nivîskar û xemxurên parastin a folklorî Kurdî hatine parastin û komkirin bûne binaxe û kereste ji bo edebiyata nivîskî ya Kurdî. Her weha ji bo nivîsîna çîroka honerî ya Kurdî bi vî awayî hûnerên taze li ser van keresteyên folklorê peydabûne.

Çîroka nû ya Kurdî jî yek ji wan hûneran e ku mifayekê mezin ji wî samanê netewî wergirtî ye. Çîroknivîsan bi rêjeyeke zor yan kêr di nava berhemên xwe de wan bi kar anî ye. Bi formên taze dirust kirî ye. Bi vî rengî ku li jiyana serdemyane bigoncît, lewre dibînîn çîroka honerî ya Kurdî cudahîyeye temam û eşkere li gel çîroka folklorî ji hêla dîrok, ruxsar û naverokê ve heye. Raste dibe di qonaxên çîroka honerî ya Kurdî ya sade û sakar de be û hin sîmayên hîkayetê di nav de bêne dîtin û teknîkên nivîsîna çîroka honerî bi temamî di nav de nehatibin peyrewkirin. Lê ev çende bi tenê bi edebiyata Kurdî re eleqedar tûne ye. Belku ev diyarde di nava edebiyatên hemû cîhanê de heye û her honereke taze di destpêka xwe de bi şeweyeke sade û sakar peyda dibe. Wate her çawa be û li hemû cîhanê di bineret de “cudahîyeye mezin di nava wê çîrokê de heye, ewa bi awayekê sakar tam û xweşî ji bo xwînerî re çêdike, li gel wê çîrokê ewa hestê xwînerî bo jîyanê gur dike, asoyê fikrên ewê berfireh dike, şarezahî û ezmunên wî zêde dike. Bi wî rengî ku bi dîtineke nû û ron temaşe dewrûberên xwe bike (Resul, 1997; 169).

Li vir hetta ku ev cudahîyên bi reneki diyar ji me re eşkere dibin, pêwîste em bizanin bi giştî hikayet çî ye? Salox û sîmayên wê çî ne? Li dor vê yekê zanayê navdar ê Rusî Prop di pirtûka xwe de, ewa li bin navê Çîroka Rusî îşaret bi çend pênasayên hikayetê kiriye û bi hûrî her pênaseyeke şîrove dike û sîmayên hikayetê tê de destnîşan dike. Bo mînak yek ji wan pênasayên bo hikayetê di vê pirtûkê de hatîne diyarkirin. Pênaseya Nîkîferef ku dibêje “ew çîrokên ser zarî ne û berbelav in di nava xelkê de û bi armanca kêfxweşî û demborandinê têne vegêrandin û naveroka wê û rûdanên seyr ji xwe re hembêz dike û bi binyatekê şewazgerî terkîbî taybet tê saloxdan” (Я, 1984; 38). Ji vê pênaseya Prop komek saloxên di hikayetên de diyar dike û ji wan saloxên “hikayet janreke folklorî ye, di nav xelkê de berbelav e ji berebabeke ji bo berebabeke din bi rêya zarekî tê veguhaztin. Helbet ev cudahiya ligel çîroka edebî ewa bi rêya nivîsînê û xwendinê belav dibe. Her weha sîmayekê din çîroka folklorî ew e ku pitir ji hêla xelkê ve weke janreke vegêranê tê vegerandin. Mebest ji vegerandina hikayetê bo kêfxweşî û demborandinê ye lê ligel vê yekê bi dîtina (F.B.NÎKTIN) hikayet her wiha armancên perwerdeyê jî di nava xwe de hembêz dike, lê ew bo mebestên perwerdeyê nehatî ye vegêran. Her çend hêlên wê yê kêfxweşî hevpeçî ya kuratî wî fikrî nake.

Her wiha ji sîmayên dî yên Prop di pênaseya Nîkîferef bo hikayetê amaje pê dan, naveroka hikayetê ya seyr û semere, lê mebesta wî bi vê yekê ne bi tinê ew seyr û semere fantezya ye. Her weke di nava hikayetên caduyê têne dîtina. Belku mebest ji rûdanên seyr, ewên di nava hikayetê de, gelek ji jiyana dûr nîne. Dumahîk sîma amaje pêhatîye dan di vê pênasayê de eve ku hikayet bi şehriyeteke taybet dihête saloxdan” (Я, 1984; 39). Ji bilî van xalan Prop amaje bi sîmayekê din ê hikayetê dike ku girêdayî mesela baweriyê ye, bi dîtina wî çîrokên folklorî cihê bawerî ya xelkî nîne, her çende ev girêdayî guhdarîya çîrokê ye bo nimûne zarok ji van cure çîrokan bawer dikin” (Я, 1984; 39).

Ji eva borî û sîmayên hikayetê ji me re diyar dibe ku eger xaleke hevpar di navbera her du janrên edebî “hikaye” û “çîrokên honerî” de hebe “ew jî çêj wergirtina mirovî ye ji vegêran û wergirtinê. Ku sîfeteke guhgirtina mirovî ye ji ajal û zîndewerên din çikû mirov ji rojên destpêkê heta niha xweşî ji bihîstina dastanan wergirtî ye. Kewate

vegêran sîfeteke hevbeş ya hemû berhemên edebî ye ji sadetirîn form heta nûtirîn formên aloz di sedê bîstê de” (Mihemed, 1997; 15). Lê ligel vê çendê cudahî jî heye, gelek saxlet û binema di nava çîroka honerî de têne dîtin, lê di nava hîkayet yan serhatiyan de tunene. Çikû “hîkayet weke janreke ku berhema bîr û endêşeya mirovî ye. Di edebiyata folklorî û millî ya her milletekî de ligel geşekirina bîr û hoşû jîrîya mirovî de geşekirîye qonax qonax naverok û şêwe hatîye guhurîn” (Mihemed, 1997; 3). Lewre em dibînîn ku “piraniya wan binemayên ku ji çîroka honerî bi rengekê gelemperî û di kurteçîrokê de bi taybetî hene. Bi gotineke din çîroka honerî û kurteçîrok bi hev girêdayine, bi wê gorankariya nû ya sedê bîstê de derketî û bi regezên nû yên honerî weke cureyeke nû ji dayik bûye” (Dewlet, 2001; 21). Û ji hîkayetê hatî ye cudakirin.

Yekemîn cudahiya di nava hîkayetê û çîrokên honerî de tê dîtin ew e ku hîkayet “ji berhemên takekesî tê danan û dide pal û hemû gel û bi berhemê dahêner dinasin” (Kameran, 1984; 23). Wate danerê vê berhemê her weke hemû berhemên din yên folklorî ne diyar in. her çend “her berhema ji van berhemanên edebî xwedî takekesî bû (ji destpêkê) belê hêdî hêdî û dem bi dem hatîye guhertin, vêca bi destkarîkirinê, yan jê kêmtir kirinê yan xistneserê welê hatîye bibe berhemên millî” (Kameran, 1984; 24). Lê çîroka honerî danerê wê diyar û eşkere ye, ev çîroke bi berhemê takekesî tînan nas kirin. Piraniya caran çîroknivîsê nû bi wêneyên honerî di nava çîrokê derbirinê ji ezmuna xwe ya kesî dike.

Ji hêla naverokê ve ku mijar û bûyerên çîrokê ji xwe re hembêz dike, “piraniya wan wisane fikra hîkayetê li ser karûbarên xeyb û babetê li ser binaxeyên xeyalê têne damezrandin” (Ebdilrezaq, 1998; 262-263). Çiku naverok û mijarên çîroka folklorî “ji destan û efsaneyên hatine parzûn kirine” (Agrîn, 1999; 54). Her çende xeyal di nava hîkayetan de gelek ji wê xeyala di efsaneyê de heye kêmtir e, bi wî rengî ku “xeyala çîrokê gelek ji jiyane dîr nakeve” (Resûl, 1979; 24). Ango “ew di pila yekem bi piştbestinê li ser bûyerên xeyalî û endîşeyê nake” (Duskî, 1993; 29). Belku hîkayet berhemên pêşkeftina fikra mirovî ye di qonaxeke pêşketîtir ji qonaxa peydabûna efsaneyê; ku yekem qonaxa hizir kirina felsefeya mirovî bûye. Wate “çîrok, berev pêşveçûneke mejûya efsaneyî yê û ji hêla form û darêştinê ji wê diçe. Her çende ji hêla

naverokê hindêk ciyawazî hene. Keristeyên efsaneyê ji xeyala pir û pûç hatîye wergirtin, belê keristeyên çîroka honerî ji jiyane di hête wergitin. Keresteyê çîroka Kurdî her giyanewerek...., û beşa herî mezin ya keristê ademîzad bi xwe ye” (Resûl, 1979; 24). Kewate babetên hikayeta Kurdî nêzîkî jiyana dorhêla mirovî ne, bi tenê xeyal û babetên metafîzîkî weke amrazek ji bûo bicihanîna hêvî û armancên mirovên destpêkê ewên bêdest hilatdar beramber jiyane û diyardeyên siruştî bûyine, “ku hêvîya ademîzatî, hêvîya milletîye ku berev jiyaneke bextewer biçe û jiyaneke bextewer dirust bike. Vêca ji wê pila mêjûya milletî ew çîrokên hatine derketin ku ji jiyana rasteqîn e ev tiştên ha nebûye, vêca ademîzad bi perên xeyalê berev wê hêvîyê çûne” (Resûl, 1979; 24-25). Her wiha çîrokên fabl ewên li ser zarên giyanleberan dihatine vegêran, “ew derbîrîna xeyal û fikrên milleta ne yan sembol (nîşane-remiz)in” (Resûl, 1979; 25). Lê keresteyê hemû çîrokên h unerîmîrov bi xwe ye û babetên wî heta radeyeke zor bi jiyana mirovî û kêşe û arîşeyên civakî, rewşenbîrî û aborî ... hitd girêdaye û çî tiştêkê dûr ji rastîya jiyane di nav de nayê dîtin. Belku ew ji babetên metafîzîkî û “ji karûbarên xeybî dûr e û hewla çareserkirina kêşeyên mirovî û girîngî dana bi jiyana komelayetî û derûnê kesa ye. Bi hîratî wesfa jiyane dike û kûr diçe, ew hêlên jiyane hildibijêre ku ji bo zîndewerên çîrokê bi mifa ye. Kewate honereke bi tam û çêj dide me û hestên me berev ciwanîyê û hizir kirinê dibe” (Ebdilrezaq, 1998; 263). Kewate babetê herî serekî di nava çîroka honerî de jiyana ketwarî ya mirovî ye bi hemû rehend û mebest û wateyên wê ve. Bi gelemperî hemû rûdanên çîrokê li dûr wan mijaran dizivirin, ango “babetên rengvedana realîzmî, jiyana komel û mirovî ye û gozarişt gera tamam ya rehendên mirovî û dewrûberî ye” (Dewlet, 2001; 23).

Aşkera ye ku her çîrokek çî ya folklorî be çî jî ya honerî be ji rûdaneke tamam derdikeve ji destpêk, navend, dûmahîkê pêk tê. Lê peydabûn û dariştina van pişkên rûdanê di çîroka honerî de ji çîroka folklorî cuda ye, bi wî awayî ku di çîroka folklorî de pişkên rûdanê bi hokarên mentiqî pêkve girêdayî nînin, ango rûdanên wê bi egerê dal û mendelûlan peyda nebûne û çî peywendîyeke mentiqî û zanistî di navbera rûdan û egerê rûdanê de nîne, belku “rûdan her zû ji nişkekê ve ji aliyê çîrokbêjî ve tê bi cih anîn bi rêya piştbestina wê li ser regeza rêkeftinê û kiryarên metafîzîkî ji qeza û qeder, kiryarên



cadûgerîyê” (Talib, 1981; 4). Wate di nav rûdanên hîkayetê de “çareserkirina kêşeya weke encemake mentiqî li encamê çareserkirina waqî nayê berçav. Belku gelek caran hêzeke xeybî alîkarîya pehlewani dide ku wê kêşeyê vedigerîne” (Mihemed, 1993; 22). Ji vê yekê bo me dîyar dibe ku çîrokbêj li dû binaxeyên zanistî bi şîrovekirin û eger û hokarên derketina rûdanê nerabû ye. Lewre “vedîtina têgehiştina mebestê tîm û delaleta hîkayetê ji bo xwînerî û gohdarî bi cih dihêle, her çende di nava çîrokê de piraniya tiştan li dûmahîyê tene vedîtin” (Mihemed, 1997; 2). Çikû di çîroka honerî de rûdan bi egerê dal û mendelûlan peyda dibin. Wate çîroknivîs bo hemû rûdanên çîrokê eger û hokarên mentiqî dîyar û destnîşan dike. Bi wî rengî ku li dû şîrovekirina rewşa derûnî ya kesayetîyê, egerên rûdanan bi xwêndevanî ron û aşkera dibin, ji egere hindê çî tiştêkê neçaverêkirî di nav rûdanên çîroka honerî de bo xwîner nayê pêş.

Helbet encamdana rûdanan û kiryarên çîrokê ji hêla leheng û kesayetîyên çîrokê tene pêş, lê her yek ji çîroka folklorî û çîroka honerî, kesayetîyên cuda bikartîne û bi rengeke cuda derbirîne jêdike. Di çîroka folklorî de piraniya cara leheng bê kêmasîye ji aliyê gelek saloxan ve weke zîrekî, ciwanî, bihêzî yê ve (kamil) tamam e. Wate di şîyana wî de ye ku kiryarên servehî ji bo wî encam bide. Lewra lehengê hîkayetê eger hinek caran mirov be yan kesayetîyeke zîndî û rasteqîn be “bi hindek kar û erkan radibe ku ji rastîya jiyane dîr in” (Resûl, 1979; 24) û ji derveyî şîyanên mirovî ne. Ji ber vê hindê xwîner nikare xwe digel rûdanên çîrokê biguncîne û ew hevkarîyê di nava çîrokê de nake. Çiku ew kesayetîya xwe di nav lehengê çîrokê de nabîne, belku bi tenê wek bînerê li rûdanên çîrokê dinêre, mina lehengên çîrokê (hizar şêv û şêvek). Ji hêleke din ve kesayetîya çîroka folklorî (kesayetîyeka berhev e, weke xwe dimine û pêşve naçe. Dîsa kesayetîyeka nenas û bê nav e, bi tenê bi rêya sîmayekî weke başî, xirabî, cwamêrî û bexîlî û di çarçoveyekê de, wekî: desthilatdariyê, mîna paşa, wezîr, kurê paşa, keça paşa yan çarçoveya pîşeyî mîna bazirgan, nêçîrvan yan çarçoveya civakî mîna kesekî hejar, zelamekê zengîn, keçeka êtîm û sêwî tê nasîn. Kewate leheng û kesayetîyên çîroka folklorî û sadene û derbirîn ji derûna wan di dema bi cihanîna erkan de nayê kirin. Belku karîgerî û bizavên wan bi tenê bo birêvebirina bûyerên çîrokê ye, neku bo berçavkirina rolê wan yê civakî yan rewşa wan ya derûnî ye. Lewra çîroka Kurdî tê

saloxdan, bi “giringî pê nedan bi nexşandin û wêneyên kesayetiya ji aliyê derûnî ve, bi hev re negehiştin digel bûyeran bi awayekî siruştî ku jîngeh ferz dike” (Ebdilrezaq, 1998; 262). Her çend di van çîrokan de “gelek cara nivîskaran behis ji kesayetiya palewanî dikir ji aliyê derûnî ve, belê ev girîngî pêdan ji selîqa zikmakî bû taybet bi wan ve bû ne ji aliyê honerî” (Salih, 2005; 96). Kewate kesayetiya çîroka folklorî kesayetiya şeweyî ne “di destpêkê de çî salox û rewş hebin ta dumahiya çîrokê ew salox û rewş wek xwe dimînin nayên guherîn, bi vê çendê palewan rukeşê wan her sade dibe û di encamê de jî karîger nabin û çalakiyên weha nabînin, ev çende vedigere ta nivîskar tenê meremê bûyeran bo derbirîna bîr û raya ne palewana. Her ev hokar jî bûye eger ku palewan di xizmeta bûyeran de bin û hemû girîngiya yek arasta bûyeran û pirsgirêkan çê dike ku palewan berhengarî de bin û naveroka bûyeran pêktînin” (Mihemed, 1993; 22).

Leheng û kesayetiya çîroka honerî berevajî lehengên çîroka folklorî ne, wate “bi ceste û bi giyan û bi hestan ve mirovê rasteqîn ên jiyankirî waqî’î civakî ne” (Dewlet, 2001; 23). Lewra ev kesayetiya xwedan hêz û şîyanên sinordarin ango çî salox û sîmayên li derveyî şîyanên mirovan di nav de nayê dîtin. Belku ew kesayetiyeke di nav xelk û ketwarê jîyanê de hatiye hilbijartin û ji aliyê çîroknivîs ve hatiye destnîşankirin, ji ber vê yekê gelek caran xwîner wêneyê xwe di wêneyê kesayetiya çîroka honerî de dibîne, çikû nivîskar bi awayekî hurgilî behsa rewş, helwest û hestên lehengê derûnî beramber bûyeran dike. Kewate çîroka honerî, “çîrokeka waqî’e ku girîngiyê bi şîrovekirina hêlên derûnî yê kesan dide” (Ebdilrezaq, 1998; 265). Her wiha “hemû rehendên girêdayî bi kesayetiya lehengî ve mîna: rehendê leşî, rehendê derûnî..., Bi awayekê ron û aşkera pêşkêş dike” (Alzewahire & Alteamine, 2006; 19-20). Her dîsa ev kesayetiya xwedan nav û nîşane û ne bi tenê kesayetiyeke berhev û negor û çespaye, belku bi derbazbûna rûdanên çîrokê re kesayetiya jî geşe dibe û helwestên wî tene guherîn bi wî rengî ku “kiryar û axaftinên kesayetiya çîroka honerî bi şeweyeke mentiqî li gel rûdanan pêşve diçin” (Xelîl, 2014; 136).

Bêguman kesayetiya bûyer her wekî berî niha amaje pê hatiye dan, di jîngeha cih û demê de bizavê dikin û peyda dibin. Lê nîşandana vê jîngehê di çîroka folklorî û honerî de ne wek hev e û ji hev cudaye bi wî rengî, “cih û dem û di nav çîroka folklorî

de bi giştî ne bûyer xwedan cih û demekê diyar û dest nîşankirî nîn in” (Xelîl, 2014; 136). Bo mînak piraniya cihên çîroka kevin ev rengên cihane mîna deryayeka kûr, şikefteke tarî û bajareke mezin lê “vegêrê çîrokê ewê di nav van cure çîrokan de rolekê sereke digre sîmayên cih û demê bi wî ve dîyar dibin” (Alî, 2000; 189). Ligel hindê dîyarbûna wan cih û deman çî roleke honerî û pevgirêdaneke di navbera regezên din yê çîrokê peyda nakin, belku bi tenê wek çarçoveyek bûyerên çîrokê bi xwe ve hembêz dikin. Lewra di çîroka folklorî de, “hest bi bûna kartêkirina dem û cihî û navbera palewan û bûyeran nake, bi awayekî hebe yan ne diyarkirîne yan diyarnekirinê dem û cih çî karîgerî li ser bûyeran yan kar û kiryarên pehlevanan nine” (Mihemed, 1993; 23). Berevajî vê di çîroka honerî de cih û dem bi dîyarî dest nîşankirîne û derbirîn jê tê kirin, bi wî rengî ku dem “bi egerê wê çendê ku cih û navê ekter û hêlên şîrovekarî ve taybetmendiyên hevdû werdigrin çîroka honerî du cure dem hene: 1. Fîzîkî, 2. Derûnî, ku di hîkayetê da bi bi tenê demê fîzîkî bûna wê heye û serdema wê nediyar e” (Mihemed, 1997; 15). her wiha di çîroka honerî de dem û cih bi rengeke organîzmî bi bûyerê ve tê girêdan û çîroknivîs wêneyeke babetê ji cih û demê bûyera bûyerê pêşkêş dike, bi rengekî ku ev wênekirin alîkariya xwînerî dike ku xwîner bikaribe wêneyekî ji jîngeha cih û dema di fikra xwe de peyda bike.

Vegêran wek regezê sereke di her çîrokekê de bi giştî di çîrokên kevin û hîkayetan de li ser hemû binemayên din yê çîrokê de wek regezê zal bûye. Ango di van çîrokan da vegêr li ser çîrokê zal û zana bûye, bûyerên çîrokê li duv yek û bi şêweyê zincîreyî veguhaztîne. Wate bûyer di çîrokên folklorî de her wekî zincîreyê li duv yek tîne bêyî ku çîrokbêj çî teknîkeke mîna: (montaj, filaşbagê bi karbîne. Belku “di çîrokên kevin de vegêran şêwaza sereke ya dariştina çîrokê bû, vegêranê hemû binemayên çîrokê dagîrkirîne, dem di vegêranê de bi berdewam digel hemû hêlên din derbaz bûye. Nivîskar çî destkariyê tê de nake belku digel hêlên bûyeran diçe, di wê vegêranê de jî demê berev nîşandana dîrokê ve diçe, kêşekê bas dike bi vegêranê ve di çarçoveya dîrokê de. Di vê cureyê de hizir û bîrên nivîskarî nakevin nav çîrokê de, belku derxistina cîhanê li rêrewa metna çîrokê de ji bo guhdarî yan xiwînerî” (Salih, 2010; 274). Her çend ligel vê vegêrana raportî di çîroka folklorî de, hinek caran çîrokbêj

saloxdanê û danûstandinê bo vegêrana çîrokê bi kar anîye lê “bi gengeşê guzarîştê li kesayetîya palewanan nake û fikr û bîrên taybet yê wan nayên gotin û taybet nabin bi palewanan, ji encamê kar ji yek kirina pehlewanan rûdanên dewruber yan kêşeyên nav de yê derunê pehlewanan dirust nabin, belku taybetin bi nivîskarî ve” (Mihemed, 1993; 22).

Her wiha di vegêrana çîroka folklorî de çîrok bêjî bi rêya cînavkê kesê sêyê (ew, wî, wê) û li dû dema borî çîrok tê vegêran. Lê di çîroka honerî de vegêrana rûdanan de li dû dema niha tê encamdan û mifa ji dema borî tê wergirtin. Di çîroka honerî de di derbarê bikaranîna cînavkê kesê sêyê ji aliyê çîroknivîsî ve ku wek vegêrekî bi hemû tiştî dizane û rûdan û rewşa kesayetîyan vedigêre. Her wiha mifa ji cînavkê yekê û duyê tê wergirtin bi wateyêke din di çîroka honerî de “her sê cînavk bi awayêke cuda tên bikaranîn, ev jî teknîkeke nû ye di çîrokê de hinek caran her sê cînavk di yek demê de tene bikaranîn. Ango dengê vegêranê di nav yek hildibin û astên cuda yê vegêranê jê peyda dibin” (Luqman, 2008; 114). Her wiha çîroka honerî bo vegêrana rûdanan mifa ji teknîkên nû yê çîroknivîsînê yê mîna montaj, dîyalog û monologê werdigire. Bo mînak gelek caran kesayetîyek bo cara yekê bi rêya dîyalogê di nav bûyeran da dîyar dibe. Kewate “çîroknivîsên nû bûyer bi berçav nexistine, mifa ji honera Arîsto wergirtîye ku dibêje honErmend yan nivîskar ew kese ku bi rêyêke ne rastewxo dest bi vegêrana bûyerê dike” (Salih, 2005; 97). Helbet ev çenda han bi awayê darêştina çîrokê ve girêdaye, ku hostayîyê û şarezayîyê mezî ji çîroknivîsî dixwaze, çiku “darîştina çîrokê nîşaneyê aşkera ye bo derxistina nivîskarê çîrokê û ji hev vekirina digel çîrokbêjî, hinek caran jî çîrokbêj bi xwe nivîskarê çîrokê ye. Her çend babet yê weqî û rasteqîn e belê hoyê darêştinê destê honerî tê de derdikeve ku bi rêya rast ya peyvê xwîner têdigêhe ku berhemek yê berhamanîn û vedixwîne” (Salih, 2005; 141).

Ji hêla şewaza vegêran û darêştinê ve, piranîya çîrokên kevn bi şeweyê dirêj û berfireh bûne, her çende dirêjî û kurtîya çîroka folklorî bi vegêrê çîrokê girêdayî be jî, her vegêrek ji bîrdanka xwe û bi zimanê xwe li ser bûyerên çîrokê dirêj yan kurt dike. Lewra “di hinek cihan de kurtbûne û di hinek cihan de jî dirêj bûne” (Şêlazî, 2005; 10). Ev yek sîmayêke din di nav çîroka folklorî de bo me dîyar dike, ku ev rengê çîrokan

gelek in û berbelav in. Li cihekê çespayî ranaweste, belku berdewam ligel vegêrî têne veguhastin. Bi vî rengî her vegêrek sîmayên milletê xwe jî (jîngeh, kesayetî, cih ...hitid) pê ve dîya rdike, bi şêwazên cuda vedigêre ku “hindek ji wan axaftinan helbestî, hindek jî pexşanî ne, hindek jî di navbera helbest û pexşanê de kom dibe” (Şêlazî, 2005; 8). Di çîroka nû de çend giherîn li ser şêwazê çîrokê de peyda bûn, “li destpêka vê gorankarîyê de çîrok bûye du beş çîroka dirêj û çîroka kurt li pêxemetê ve çendê pêdivî bi çend destûr û binema û zanyarîyan hebûye” (Salih, 2005; 65). Her wiha bi tenê bi pexşan hatîye dareştin û niha bi honera pexşanê tê nasîn.

Ji hêla zimanî ve, çîroka folklorî bi zimanekî sade û asahî tê vegêran, wate “zimanê asahî yê gel e ye û leheng jî bi zimanê gel diaxivin di rastîyê de axaftin û derbirîna kesên di nava hîkayetê de weke axaftin û derbirîna rojane ya civakê ye di nava civaka jînê de. Zimanê asahî dibe sebeb ku hemû kes ji pend û razîbûna hîkayetê têbigihin û mifayê jê werbigrin. Di nava hîkayetê de zêdetir ji pend û metelên kevin mifayê werdigrin. Mirov dikare bibêje ku hîkayet zimanê niha yê gel e ziman jî zimanê pêşvebirî yê civakê ye” (Yusif, 1347; 10). Lewra xwîner yan guhdar çî zehmetê bi xwendin yan têgehiştina wê ve nabînin, ev sîmayeke serekî ye ku hîkayetê ji çîroka honerî cuda dike. Çîku têgehiştina çîroka honerî ji xwînerî zehmeteke mezin dixwaze; ev çende bi teknîk û formên nû yê çîrokê ve girêdaye. Bo mînak çîroka honerî bi “zimanekê çîr nêzîkî zimanê helbestê.” (Hesen, 2012) tê darêştin her weke dîyar dibe zimanekê girtî û nerastewxo ye û têgehiştina wê şarezahîyê ji xwînerî dixwaze.

Piranîya çîrokên folklorî yê Kurdî bi destpêkeke neguhor û çespahî, bi rista “hebu... nebu kes ji xwudê mezintir nebû” (Hacî, 2005; 29), destpêdikin û bi dawiyêke xweş û şad diqedin, ew jî piştî ku leheng digihêje armanca xwe. Lê di nava çîroka honerî de destpêk piştî nav û nîşana çîrokê girîngîyê mezin heye û çend erkan di nav çîrokê de bi xweve heldigire. Ew erk ev in, “yek bala xwîner / guhdarî ji bo xwe bikêşe, ev jî pêdivî bi axaftinên ciwan û peyvên rengaw reng, şewaza balkêş û tijî derbirîn heye. Duyem bi sadetirîn axaftin, yan peyv di naveroka metnê de berbelav bike” (Aram, 2011; 27). Lewra çîroknivîs girîngî û bihayêke mezin bi darêştina destpêkê û her wiha bi dûmahîkê di çîrokê de dide. Çîku wateya her çîrokeke honerî bi taybet kurteçîrokê di

dawîya wê de dîyar dibe, her tişt di dawîya çîrokê de ron dibe. Ne merce di çîroka honerî de dawîya şad bi dest ve bê, belku gelek caran dawîya çîrokê ya tirajîdî û xemgîn e, ku “di vira de xwîner hest tam û çêjê dike bi rêya xweşîyê, yan bêzarîyê” (Hesen, 5/12/2006; 114).

Di vir de em dikarin bibêjin ku saloxa herî serekî ya çîroka honerî ji çîroka folklorî cuda dike, ligel naverokê, form û teknîk û şêwazê darêştina honerî ya wê ye. Çikû çîroka folklorî bi mebesta honerî yan weke formeke honerî nehatîye vegêran, belku mebest pê gehandin û belavkirina naveroka çîrokê bûye. Her wiha çîroka honerî “digel cureyên berîya sedê hejdê û nozdê di şêwazê wênegirtina wê de cîyawaz e, çikû mebesta sereke ya çîroka nû nîşandana hestên nivîskarî ye bi wê dinyaya li dewruberê wî” (Ebdilrezaq, 1998; 265-266).

Wek encam, çîroka honerî, honerekê edebî û nû ya serbixwe ye li hemû cîhanê, bi naverok û ruxsar û şêwe edgar û sîmayên xwe ve bi temamî ji çîroka folklorî cuda ye. Ew cîyawazîya di navbera her du rengên çîrokan de tê dîtin ew dibe honer, çikû edebiyat bi karhênaneka honerî ye bo regez û toxmên xwe.

### **3.5 Nunerên Çîroknivîsên Kurd**

### 3.5.1 Fuadê Temo

Fuad Temo yekem çîroknivîsê çîroka honerî ya Kurdîye, di hemî parçeyên Kurdan de û ronakbîrekî Kurd e ku ji bajarê Wanê ye û kurê mebûsê Wanê Tewfîq Begê Wanî ye. Li Stenbolê digel ronakbîrên Kurdan ew jî yek ji aktîfîrîn kesan e ku beşdarî kar û barên siyasî û kulturî yên Kurdan dibe. Di komele û kovarên Kurdan de dixebite. Di 1912an de digel Qedrî Cemîl Paşa, Cerrahzade Zekî Beg û hin ronakbîrên din, li Stenbolê yekemîn komela xwendekarên Kurdan bi nave komela Hêvî dadimezrîne û di encama zirekî û bîr û baweriyên wan xwendekaran kovarek bi navê Rojî Kurd tê derxistin (Resul, 1989; 216).

Kurteçîroka yekemîn ya zimanê Kurdî “Şewêş” e, ku ji aliyê Fuad Temoyî ve hatiye nivîsîn û di her du hejmarên pêşî yên Rojî Kurd de, di sala 1913an de, hatiye weşandin di hejmara:1 (Hezîran 1329=1913) rupela:25–26 û hejmara: 2 (Temmuz 1329=1913) rupela: 24–25 an de hatiye girtin ku bi herfên Erebi ya alfebeya osmanî hatiye nivîsîn (Cewerî, 2003). Her wiha ev kurteçîrok ji ber ku dûmahika wê di hejmarên din yên kovara Rojî Kurd de nehatiye weşandin, bi awayekî nîvcomayî di dîroka wêjeya Kurdî de cih girtiye. Dema ku çîrok di Rojî Kurd de derdikeve, sernavê wê tenê wekî “çîrok” bûye ango navek li çîrokê nehatiye kirin. Cara yekemîn ji hêla Kemal Mezher ve di kovara Roşenbîrî Niwê de diweşîne û dîktor li perawêza gotara xwe de dibêje “Rojî Kurd di hejmara yekemîn û duyemîn de çîrokeke Fuadê Temo belav dike xwûya ye eve bo destpêka çîroka Kurdî vedigere û berîya şerê yekemîn yê cihanê û ev çîroka he bi zimanekê sade yê gel e û tê de nexweşiyên şivanekî Kurd tê vegêran” (Mezher, 1987-30 Ab; 16).

Wek ji dawîya çîrokê jî tê famkirin ko çîrok hê jî xelas nebûye. Her çendî di hejmara 2an a kovara Rojî Kurd de dinivîse »dawî heye«, lê mixabin dawîya çîrokê ne di hejmara 3an û ne jî di hejmara 4an a kovarê de heye. Her weha navê çîrokê jî nehatiye nivîsîn. Tenê »çîrok« hatiye nivîsîn. Lê Mahmûd Lewendî di tîpguhêziya wê de navê »Şewêş« li çîrokê kir û me jî her »Şewêş« hişt (Firat, 2003).

Mînaka çîrokê ji lêkolîna Şukrîye Resul hatîye wergirtin û lehengên sereke yê vê çîrokê, şivan, şewêş, rîspî, rizgo ye. Ev çîrok ji hêla ruxsarî ve, bi Kurdîyeke petî û rehwan bi rênûsa kevn ya Erebî hatîye nivîsîn. Gelek xeletîyên çapê tê de hene digel bikaranîna alfabeya Kurdî. Zor caran tîpên Kurdî hatîne nivîsandin û zor caran nehatîne peyrewkirin. Bi taybetî jî weke tîpa “v”yê. Her wiha peyrewa serbora Kurdî nehatîye kirin (Resul , 1989; 218). Ji bo ku metneke gelekî girîng û dîrokî ye em ê li jêr cih bidin vê çîroka ewwîl a honerî ya Kurdî.

### Şewêş

Şewêş kurê şivanekî ye bi xwe deh salî ye, zarokeke, belê pir çavvekirî ye.

Şewêş diya xwe nedî ye. Bavê wî reben û belengaz e, qedtiştêkî wan tine, tenê metekî Şewêş hebû. Ew jî pîre bû, Şewêş carna bal wî diçe, dilî meta, xiwe hunik dikre.

Şewêş tu sala teşqeletî nedikir. Bi kesda tiştêk nedigo. Tim bi xwe bû ...

Şewêş her ro êvarê di ser rê yê bavê xwe diçe. Hêvîya wî dimîne wekî bavê wî tê pêşîya lê wî dî beze, bi xwe ser kêlekê xwe dihavêje. Destê wî digîre, maç dikir. Bavê wî jî her dû çavên kurê xwe maç dikir. Dil honik dibû.

Rojekî Şewêş diya ser rê yê çû hîvê ya bavê xwe bû, gavek bû hurî, roj çû, hemû alekî terî ket. Bavê wî hîj ne hatibû Şewêş nava wî tarî da tenê ma dilî wî lez dike. Car caran guhdarî dikir bavî xwe gazî dikir... Şewêş cê kî runişt bo bavî xwe girî...

Şewêş gazî bavê xwe kir ...

Bavo ba bavo:

Bavê wî jî:

Ah şewêş lawo tu yî ...



Şewêş:

Herê bavo ez im, bavo tu îro bo çî wîsan direng mayî, to taçî zû nehatî.

Bav go:

Kurê min pezan têr nexarî bû ez jî piçek westî bûm, lema direngî mam

Şewêş go:

Bavo ez kurê te me te îdî wîsan direngî nemîne tu zanî ku mal da kes tunine, ez balkê bimênim, girî ... bavî giriyana kurî xwe dî birîndariyê dilî wê new bû, ava çavî dî jî vala bû ... hitid.

Hêstirî subî derketî bû ... nêzîkî subî dîka bangî deda, babî nerim hêdî hêdî Serdaran lê dexisit belan di hejiyana, dengêkî xweş çedekir. Hemû hêlda deng dihat. Hemû gundê rabûn, belê kur û bav hêj raza bûn.

Kavek jî çû, şivan xanî da hişyar bû, gava peza rakirîn rob û hurî bû. Belê şivanê kal nexweş bû nav xêna xwe de nale car ne caran jî ruyî kurî xwe mîze dikir. Wî gavê bû. Rîspîyî gundî derî şivanî lê da, başî gazî kir

Şivan ... şivano:

Şivano îro bo çî usan direng mayî. Nîvro bûye, pez hêj ava hevşda maye, pirçî û bê xoyî ye. Gondî gal gal diken.

Şivan jî go:

Rîspî ez çî bêjim, tumî dibisî, ez îro nexoşim, nexweşîya mi girane Şewêş jî nhêln bavî xwe dî, dilî tarî bû ser babê xwe ket, girî .....

Ev dengî law û dilê rispî şewitand ... rîspî xwelamî xwe gazî kir.

Ji wî ra go: Rizqo ... kurê min şivan nexweşe, evro be ber pezan tu here pez hefşeda mir bû.

Rîspî amanekî jî tijî kir, bi destî şewêş da gu: kurîmin dil teng mebe ewjî hêdî hêdî bo bavê xwe bibe nihe hêvîyate be bal bevî xo rune ... çi dixaze çîke, dilî wî meşkêne. Ajî têm.

Dawî heyê

### **Şîrovekirin**

Nivîskar vekirina çîrokê bi dannasîna serlehengê çîrokê dest pê dibe û bi rêzkirina hin taybetmendîyên wî xwînerê xwe ji bo rûdana hin bûyerên têkildarî wan taybetmendîyane amade dike. Lê ev vekirin û ev amajê kêmasî dimîne û mirov dikare bêje ku yek ji rexneyên di cî da di derbarê çîrokê ev e ku nivîskar nikare wan taybetmendîyên kesayetîya şewîş bi tu bûyerekê ve girê bide.

Her wisa di navbera wan du parçeyan de tu têkildarî û eleqe tune. An ku derengmayîna bavê şevîş bûrek e ku di beşa yekem de tê û nexweşbûna şivanê bavê şevîş ku di beşa duyem de amajê pê tê kirin qet weke rêze bûyerên têkildarî hev nayên şîrovekirin.

Di vê çîrokê de tiştê balkêş awayê berteknîşandana rihsipî ye li beranber nexweşîya şivan. Ji ber ku bi piranî di çîroka Kurdî ya vê serdemê de rihsipîyan weke kesên zalim û xedar tînan nîşandan. Lê li vir rihsipî pir dilovan tê wesifkirin. Belkî mirov bikare bêje ku ji bo cara yekem nebe jî, av awayê nêzîkbûna nivîskar û karakterê rihsipî pir kême.

Dibe ku sedemê wan kêmasîyan dîyarnebûna berdewamîya wê çîrokê ye. Herçiqa ku nivîskar di kovarê da amajê bi berdewamîya çîrokê dike jî, lê mixabin ji ber hin sedemên nedîyar çîrok nehatîye bidawî anîn û nîvcû (kêmas) dimîne.

### 3.5.2 Cemîl Saîb (1887-1951)

Cemîl Saîb navê wî yê temam Cemîl Mela Ehmed Mela Qadir Qeredaxî ye di 16/8/1887an de li bajarê Silêmanîyê li binemaleka bernîyas ji dayik dibe û xwendina xwe ya îslamî li qutabxaneyê Mela Amîn li bajarê Helebce temam dike. Di 13/10/1951an de li nexweçxaneyê paytexta Îraqê li Bexda koça dumahîyê dike û termê wî vedgerînin Silêmanîyê û li goristana Mame Yare li cem qebrê helbestkarê Kurd Pîremêrd bi axê re dispêrin. Yekem çîroknivîsê Kurd e li Başur de û çîroka Le Xewma nivîsandiye. Cemîl Saîb di serdemma xwe de cihekê dîyarkirî di hêla xizmeta kultura Kurdî de hebûye (Cemal, 1975; 3-4).

Yek ji wan nivîskaran e ku “pexşana Kurdî di salên 20an de pêşvebiriye û ji ber vê yekê xelat wergerîbû” (Resul, 1989; 223). Saîb nivîsên xwe di kovar û rojnameyên serdema xwe de belav kiriye. Bi taybet jî di rojnameyên wek Pêşkewtin, Jiyanewe û Jiyanê de gelek nivîsên wî derketine. Saîb di heman demê de sernivîskarê rojnameya Jiyanewe û Jînê bû û heta ku koça dawîyê kiribû û çîroka Le Xewma yê bi bîst û sê zincîre li ser berperên Jiyanewe û Jiyanê belav kiribû (Resul, 1989; 223).

Di hejmara 28an ya Jiyaneweyê de ku di roja 26-6-1925an de derketîye, ev agahî tê xwendin “ji hêla kesekî ve xeweke gelek ecaîb û rexîb hatîye dîtin. Ev xew heyat û îdare û rabirdûya çend salên wî welatî dîyar dike. Gelek tiştên veşartî yê xewnawî û tirsînak derdixe. Gelek deng û basên taybet dixe berçavên xelkê” (Hiseîn, 2011:14).

Vêca ew kesayetî kes nebûye ji Cemîl Saîb zêdetir bêyî ku navê xewê an bernaveke din li ser nivîsandi be. “Di hejmara 29an ya 1/7/1925ê de û dest avête belavkirina xewa ecêb û xerîb û di hejmara 56an ya Jiyanewe yê de 18 helqe belav kiriye. Di navbera jimare 1-26ê de û li jiyan jî 5 helqe tê de belav kiriye ku li dehmena dawîyê di hejmara 26an de di roja 29 temuza 1926an de hatîye nivîsandin ku çîrok hê neqediya ye lê em dawîya wê nizanin” (Hiseîn, 2011; 14).

Mamosta Cemal Baban dema ku hat û pêncî salên dirust çîrok vehandevê û çap kir, di destpêka wê de nivîsandîye “nivîsîna Le Xewma li ber destxeta birayê xwe Cemîl Saîb nivîsî ye” (Hiseîn, 2011; 15).

### **Le Xewma**

Mirovekê hejar û bê desthelat, di xewaxwe de li germîyanê bu kesabetê diçe bu şarekî bere jor, li rêde digel Karwanî berengarî gelek derde serîyan dibin, bi taybet ku digehne nava sinurê desthelat ewî bajarê diçinê, çendîn caran rêgir rêyê lê digirin û dibîte şer eve hem tirs û leriz û kuştin û hem mandîbûn û serma û tofan û baran bi serda dihên. Hewar hewarrêt wanin ji xodê zubigehine bajêrî û rizgar bibin. Belê ku gehîştin xirabtir li serê wan dihê. Ev kese dîr belaye û belê yê bê sense û nîlawî ewe ku weke Karwançîyan xwe nîşa bidet, tumeta casusîyê didenepal û tûş dibe. Digirin û dibene def maznê bajarî. Mezinê wan fermanê dide pavêne jorekêve, berêxwe da layê rastê joraxwe jora herîmêye bilayê çapê dinêre dîwan xaneya textê ferman rewaye, li wêre gelek tiştên seîr û semer dibîne û guhlê dibe ku jiwan herdû joran rûdiden û egerê gazî û xirabîya nav şarî nîşa dide. Kabra li hemberî û jiwan dîyardan neşet xwe bigire û bi dengê bilind dikene. Maznê bajarî wesa dizanît çi kesekê bîyanî ageh jiwan rûdanan nîne, ldîv wê kenê vediciniqe û piris dike û bersiva wî diden dibêjin ew kesê casuse me bi fermanate yê havêtiye wê jorê.

Vêç ferman dike herin bihînin vêre û piştra dikevîne gîyanê wî bi eşkencedaneka dijwar daxaz jê diken ku dan pêdanê biketin ku casuse. Ew jî bes hîvîyan lê diket ji bigerên...

Bu xatira xodê, bu xatira pêxemberû, tub eshabeyan bikey, tub melayîketan, tub çak û welîyan, tub quranê, tub qebrê babê xwe, hewar hewarawîye wesa... lîvî çîrok di pirçê (Cemal, 1975; 74).

## Şîrovekirin

Vekirina çîrokê wisa ye ku gelek zû û ji heman hevokên yekem pê ve bala xwîner dikşîne. Her wisa nivîskar dikare wisa çîrokê berdewam bike ku qet xêza bûyeran têk naçe û di vê taybetmendîya çîrokê de hêza pênûsa nivîskar dîyar dibe.

Herçiqas ku babetê me çîroka honerî ye lê ev çîrok ne bi tenê honerî, lêbelê çîrokeke xwedî peyamên sîyasî û civakî ye jî. Li ser vê esasê jî mirov dikare bêje ku nivîskar pir baş dikare bûyerên sîyasî yên serdema xwe bike mijara çîroka xwe. Her wisa mirov dikare bêje ku yekem çîroka hunerî ya Kurdên Başûrê ji hêla babet û naverokê ve li dûv şert û mercên serdema xwe hatîye nivîsandin.

karaktê resen yê çîrokê piştî hin bûyerên balkêş dikeve odeyekê de ku du pencereyên vê dergehên hişyarbûn û agadarîyan in. Di heyama çîrokê de nivîskar karaktê xwe dikenîne. Wisa ku dengê kenîya wî derdikeve derveyî odê. Ev kenî jî tişteke asayî nine û mirov dikare bêje ku sedemê vê têgihîştina rastîyên derdorê ye.

Mixabin nivîskarî nekarîye an nexwastîye ku çîroka xwe an ku xewna êş û xwestekên xwe bidawî bîne. Ligel vê netamamîyê jî Cemîl Saîb şîyaye naveroka azmûnên honera çîrokê yên edebiyata ewropayî û edebiyata cîranan bikete rênîşanderê xwe li Başûr û mifa jî jê werbigre û bingehekê edebiyata realizmî û renxne girane ku nivîsar şîyaye agirê di dilê xwe de derbibire.

Şêxê nemir du caran desthilatdarîya silêmanîyê girte dest. Cara yekem ji meha 12 ê cirîya duyê 1918an heta meha hizeyrana 1919an ku di vê demê de cengê mêjûyî yê Derbendî Bazîyan qewimî û bi desteserkirina Şêx ve desthilatdarîya wî bi dawî hat.

Cara duyem ji dawîya sala 1922an heta temoza 1924an... (Berzincî, 1978; 19-20).

### 3.5.3 Celadet Elî Bedirxa (1893-1951)

Celadet Alî Bedirxan (1893 Stenbol-15ê tîrmeh 1951 Hêcanê/Şam) siyasetmedar, rojnamevan û zimanzanê Kurd bû. Celadet yek ji lawên malbata mezin a Kurdan Malbata Bedirxanîyan bû. Ew wekî pêşengê nivîsîna Kurdî bi tîpên Latînî tê nasandin (Mistefa, 2019; 1). Dibistana yekemîn û ya navîn li Stenbolê xwand. Nifşa sêyem a Malbata Bedirxanîyan di serê sedsala 20ê da bi Celadet, Kamûran û Rewşen Bedirxan ve destpêdike û xelesa wê malbata serhildêr bi van navan dawî dibe. (Mistefa, 2019; 1)

Di şerê cîhanî yê yekemîn de di nav arteşa Osmanîyê da li enîya qefqasê bû. Piştî ku împatoriya Osmanî helweşîyaye ji bo yêketîya eşîrên Kurd pêk bîne xebitî, lê li ser neket. Di sala 1922an de tebî birêyê xwe Kameran Elî Bedirxan çû Almanîya û li wir xwendina xwe domand.

Li sala 1922ê, dema Kemalîst hatin ser hukmî û Stenbol bidestxist, ji bo serokên Kurdan ku di nav wan da Bedirxanî jî hebûn, fermana mirinê derçû. Li ser wê yekê, Celadet tevî birayên xwe Kamûran, Sefder Tewfîq û birazayê xwe Heqî ve li sala 1923ê berê xwe da Almanyayê û li wir dest bi xwendina li zanîngê kir. Li sala 1925ê, dema li Bakûrê serhildana Şêx Seîdê Pîran destpêkir, Celadet ji bo tevlîbûna serhildanê bi dizî hat memleketî. Lê heta ko ew giha welatî serhildan hatibû şikestin. Ew careka din bi alîkariya eşîrên koçer ji memleket derket û zivirî Almanyayê. (Mistefa, 2019; 1)

Di sala 1925an de derbazî rojhilata navîn bû. Piştî demekê li qahîre ma. Çû sûrîyê û li wir bicih bû. Li binxetê bi Hacu axa û ronakbîyên din yê Kurd re Xweybûn ava kirin. Di salên sîhan de dest bi xebatên kultûrî kir. Berpîrsîyar û xwedîyê kovara Hawarê bû. Alfobeya Kurdî bi Latînî çêkir. Li ser gramera Kurdî xebatên gelekî girîng kirin. Celadet Elî bedirxan, di 15 tîrmeha 1951an da li şamê çû ser dilovanîya xwedê. (Bedirxan, 2014; 4)

Berhemên giştî yên Celadet Elî bedirxan:

1. Gunlok Notalat (Amadekar: Malmîsanj, Bi tirkî)
2. De la Question Kurde / Kurt Sorunu Uzerine (Bi firensî û tirkî)
3. Were Dotman (Helbestên Hewarê)
4. Kurtçe Giramer (tevî Roger Lescot)
5. Edirne Sukutunun iç Yuzu (Tevî Kameran Elî Bedrixwan)
6. Kurd û welatê wan .....stan
7. Ferheng (Kurdî-Kurdî)
8. Hevind
9. Bingehên Giramera Kurdmancî
10. Bobi'nin hatasi (Tevî kameran Elî Bedirxan)
11. Alfabeya Kurdî
12. Mustafa Kemal'e Mektup
13. Gazinada Xencera Min/ Çîrokê Hawar û Ronahî (Bedirxan, 2014; 4).

Celadet di heyama temenê xwe de gelek çîrok nivîsandine û Kovarên Hawar û Ronahîyê da weşandine. Ev çîrok li ser çend cûreyên çîrokên bi zimanê Osmanî, çîrokên Kurdî, çîrokên Kurdî yên dîrokî, çîrokên kevin û werger tîna dabeşkirin.

1. Çîrokên Osmanî
  - a. Xeletîya Bobî
2. Çîroken Kurdî:
  - a. Li ber tevna Mehfûrê
  - b. Gazinda Xencera min
  - c. Maçika Diranker û Cezayê wê
  - d. Jikeka ku du caran hatibû kuştin.
  - e. Gelo Xwe Kuşt an Hate Kuştin?
  - f. Dayîn
  - g. Bêbextî
3. Çîrokên Tawîxî

- a. Kelêoparte
- b. Şûşe dilan
- c. Keleha şahîn
- d. Selaheddîn û Rîçardê Şêrdil
- e. Gewherên Betlemyos
- f. Keça Klêopatrê
- g. Rahbe
- h. Boxoçêf an Pêtroyê Sisêyan
4. Çîrokê Kevin
  - a. Tîmsahê Heft tilî
  - b. Kitêba Totê Rab
5. Wergêr:
  - a. Çenkêş/ guy de Maupassant
  - b. Ji edebîyata Danîmarkî: Keçeka Kibrîtîroş
  - c. Rweylot/ şerlok holmes
  - d. Katêrîn- çîroka împêratora rosîyayê a bi nav û deng / S.A. Moreskwî

(Bedirxan, 2014; 5).

### **Li ber Tevna Mafûrê**

Rindê û zîzê xwehên hev û ji bavê xwe sîvî bûn.

Bavê wan Bengî axa, di gel birayên wan yê mezin Zinar û bi çend pîsmanên xwe ve di wextê Şêx Seîdê rehmetî, di şerê Serxwebûna memleketê Kurdan de ji bona welat û milletê xwe, di meydana rûmetê de, ketîbû.

Rindê 16 û zîzê 15 salî bû. Birayê wan ê biçûk Gefo hêş nû ketibû nehan.

\*\*\*



Şerê serxwebûnê ji heşt mehan pitir ajotîbû. Eskerên Kurdan li ser dîyarbekirê de girtibûn, ketibûn nav xarpotê û bajêrên Kurdan û yên din.

Ji ber ku tifaqa wan ne yek bû mirovê wan yên xwande ku bikarin karê serxwerabûnê bigerînin kêmbûn û ji hêleke din jî di çend deran de bêbextî hatibû kirin; serxwerabûn neçû serî û tirkan ji nû ve Bakûrî vegirtin. Serek, şêx û mezinên Kurdan bi dar ve kirin, jin û zarovên wan bi hizaran kuştin û malên wan zemit kirin.

\*\*\*

Di ve nave da mal û gundê Bengî axa jî talan kirin û jin û zarokên wî birçî û tazî hiştin.

Xelkê mala bengî axa êdî nikarîbûn di cihê xwe di gundên pêşêyên xwe de rûnin.

Dêya wan jinkeke jêhatî, kiçebavek zarovên xwe da bû hev û guhastîbû bajêrekî kiçik. Li cihekî welê ku tu kes ev nas nedikirin.

Dê ji sobê heta êwarê di mala xelkî da dixebitî. Bi şev gor diristin û sîsa kara wê vi kotekî têra debara wan dikir. Lê divîyabû çend pere jî bidin alîkî û ji bona xwandina Gefo bicifînin.

Ma bengî axa ne wesandibû ku bila gefo bixwîne, mezin bibe, evdîna bav û welatîyên xwe veke û di rêya felata welatê xwe de bixebite.

Ji xwendinê re dirhev divîyabû.

Dê xwe dişidand, hêş zêde dixebitî lê tiştê li ser de nedixist.

Ji bona anîncina wesîyeta mêrê xwe qerara xwe da û her du keçên xwe êxistin xebatê.

Di wî bajîrî da mehfûran çê dikirin.

Keçikan di wextê xweşîyê de bi çêkirina mehfûran mijûl dibûn, pê dileyîstin. Ji lewra gelek ne ajot jî her duyan re xebat hate dîtin. Her roj sobhî zelkê mala Bengî axa kar dibûn û her hey diçûn bi alîyekî ve.

Dê mala xelkî, keçik tewnê û lawik dibistanê.

Sibetir dinya hêş sartir bû, Rindê û zîzê çûbûn xebata xwe. Heta hingûrê jî xebitîbûn.

Gava vegerîyan hatin mal û rojana xwe dan daya xwe, dê dît ku zîzê vê rojê ji xuha xwe gemereyek û nîv bêtir anîbû. Berê je kementir dianî. Dê ecebmayî ma. Ji Zîzê pirsî. Evê got:

- Dadê heta nihû min rind nezanîbû em çire dixebitin. Rindê qenc da min sehkirin û îro min ji zîzê (150) girê pitir girê da.
- Zîzê ji te re çî got?
- Jê bipirse dadê ez wek vê nizanim rind bibêjim.

Rindê û gefo jî, xwe gehanibûn wan. Rindê dest bi gotinê kir lê nikaribû biqetîne. Çavên vê hêstir dikirin, Dê jî digirî.

Di guhekî mezê de piştexencera Bengî axayî helwastibû. Jo pêve di destên wan de tu tiqên wan nemabû.

Ji xwe re kiribûn adet, di demên tengî û zîzîyê de ev zîyaret dikirin.

Her çaran berên xwe dan xencerê û ketin hembêza hev. (Alî Bedirxan, 2014; 27-36)

Bêrût, 5 çîrîye yekê, 1927

Celadet Elî Bedirxwan,

Hawar, Hejmar:4,

3yê tîrmeha 1932.

## **Şîrovekirin**

Nivîskar weke piranîya çîrok û berhemên xwe yê edebî di hîlbijartina navên serleheng û karakterên çîroka xwe de pir hestîyar û Kurdewar nêzîk dibe û wan navan hildibijêre ku di temsîla kesayetîya Kurd dikin. Navên wekû Rindê, Zîzê, Bengî, Zinar û hwd nimûne û mînakên vê angaşte ne.

Destpêka çîrokê bi sêwîbûna Rindê û Zîzê ser digire û rasterast jî sedemê vê sêwîbûnê bi bûyera darvekirina şex Seîdê rehmêtî ve girê dide. Ku mirov kêmek li ser karakterên Rindê û Zîzê hûr bibe dikare gelê Kurd û zehmetî û êş û azarên gelê Kurd di wan duyan de bibîne. Vêca ev tê vê wateyê ku li ber çavê nivîskar kesayetîya şex ev qas mezin e ku bi mirina wî hema bêje Kurd sêwî dimînin.

Çîrok û bûyerên ku di nava çîrokê de diqewimin ev qas hevgirtî ne ku mirov dikare hest bi hêza pênûsa nivîskar bike. Peyama ku Celadet di hevoka dawî ya çîrokê da dide tam têkildarî hevoka yekem ya çîrokê ye û bi gotineke din mirov dikare bêje ku nivîskar li kêlek girîngîya ku bi zanebûn û hînkariyê dide, girîngîya xencerê jî ji bîr nake û hetrim weke keseke tolhildêr tev digere. Ku mirov peyva tolhildêr jî bikar neîne mirov dikare bêje ku Celadet bi vê çîroka xwe hiş û mêjîyê tedbîrgirîyê esas digire û dixwaze bêje ku hetrim pêwîst e xencera mirov ji bo berxwedanê amade be.

### **3.5.4 Ehmed Muxtar Begî Caf (1896-1935)**

Ehmed Beg, kurê wesman paşa kurê mihemed paşa kurê keyxusrew axayê cafane. Li sala 1896 li Helebceyê ji dayk dibe. Yek ji wan helbestkarên bi navbang û mezin ê wêjeya Kurdî a klasîk û wêjeya Kurdî a nû ye û di sedsala 19. De derketiye û di wêjeya Kurdî de xwediyê cihek diyar û berbiçav e. Ehmed Beg bi devoka Silêmanî û Helebceyê helbest nivîsî ye. Di helbestên Ehmed Beg de hûrgiliya ziman, piştguhkirina

hevoksaziyê û bi şarazayane bikaranîna ziman derdikeve pêş. Ji ber ku helbestkarî ev yek bi riya helbestê di wêjeya Kurdî de kiriye, bûye helbestkarek pêşketî û bi navbang. Helbestkarî di helbestên xwe de bi riya wêneyên ku hatine bihîstin û dîtin wêneyên honerî û xeyaliyane dirust kiriye. Paşan jî: “Helbestkar Ehmed Begî, wek rewşenbîrek şareza; zimanê Erebi, tirkî, Farisî û her wiha kêmek jî ji wan zimanên din ên ku cîranên zimanê Kurdî ne, zaniye û bi taybetî girîngiyek mezin daye rewanbêjiya Erebi û ta ku vê rewanbêjiyê jî di wêjeya Kurdî de reng vedaye” (Resul , 1989; 231).

Ehmed Muxtar Cafê nivîskar, şazadeyek wisa nebû ku li dîwanxanê li ser kursiyek hewrîşm danîşe û biryar û fermanên li ser kesên ku di jêr desthilatiya wî de ne bike. Ew dehan car çûye serdan û dîtina hevalên xwe yê ronakbîr ku ji kesên wek; Mahmud Cewdet, Îsmâil Heqî Şaweys, Mustafa Paşayê Mulkî, Tofîq Wehbî, Selam Azabanî, Şêx Nûrî Şêx Salih, Qanih, Muftî Pênciwênî, Natiq, Goran, Kemhêl, Fayeq Bêkes ... hwd. pêk tîn.

Ev kesên wesa di wê serdem û rojgarê de çirayê ronkirina jiyana û hişmendîya xelkê Kurd bûn. Helbestkar Pîremêrd yekemîn kes e ku sê roj piştî kuştina wî di rojnameya jiyana de li ser wî nivîsiye û dibêje: Îxratî wate kesek zêde dilsaf bûye û ev taybetmendiye jî bûye sedema bextreşîya wî û her wiha camêriya wî a ku xizmet ji xelkê re dikir, zerer daye wî. (Berzencî, 2003; 22)

Çîroka Ehmed Muxtar Caf heta 35 salan piştî kuştina wî derneket ku di sala 1935an de di 5 şubatê de hate kuştin ku di wê serdemê de temenê wî 39 sal bû. Heta wê demê bi tenê wek helbestkar dihate nasîn lê piştî derketina çîrokê dîyar bû ku behreya çîroknivîsînê û heza çîrok nivîsînê jî pê re hebûye. Di nava wê destnivîsê ya Ehmed Begê ji perên 11-12 heta berperê 47-48an ya destnivîsê bi tenê berperê 33-34 ya çîrokê hatîye çapkirin (Hiseîn, 2011; 26). Kurtiyek ji çîroka Meseley Wîjdan, Yan Çûn bûm Bexanedan çîrokeke ku piştî wê bi 42-43 salan nivîsiye heta ku Dîktor Îhsan Fuadî di sala 1970an de ji wê xewa dûr û dirêj hesta û digel pêşekiyekê belav kir. Dîktor Îhsan Fuad di ronkirnevekê di derbarê sala nivîsandina çîrokê de ji zardevê bavê xwe ku destnivîs di nava pirtûkxaneyê bavê wî de bû dibêje, “Ehmed Muxtar Begê Cafî ev

serhatîys li dewruberê salên 1927-1928an de nivîsandîye. Destnivîs jî bi destxeta mamosta yê helbestkar “Elî Kemal Bapîr” hatiye nivîsîn ku digel rehmêtî Ehmed Begî hevêlnîneka zêde germ hebûye û digel komvekirina peşek ji hozanên wî û Meseley Wîjdan. Ehmed Beg postên cuda yê mezîna mina qîmeqaim û endam perleman wergirtine di hukemeta rejîma Îraqê û becke beg û şazadeyê Kurdan bûye. Belê edîb û ronakbîr û xwedan heset û wîjdaneka xawîn û ji dil û derun hevdijê zulim û zordarîya kar bidestan û axa û derebegên xwînmij bûye (Hiseîn, 2011; 26).

### **Meseley Wîjdan, Yan Çûn bûm Bexanedan**

Zorab di malbateke destteng de çavên xwe vekiriye li qezaya Helebce bê bav û dayik hatîye perwerdekirin. Dema ku çavê xwe vekiriye berev cemserê resguyê veçûye û hezkirîye rastîyê bigirît, ku civak hatîye destederkirin bi bertîl xwarinê. Zorab jî ji bo wê girtinê hêza xwe difroşe ji bo xwarina xwe ya rojane û li ber destê asinger û dartaş û pinî duzî û dikandarekî bazirgan kar dike û kar û kiryarê wan dide ber azmûnan. Her wiha şarezayeke baş bi dest xwe dixê li ser karkirina bazirganên bajêr û cuotîyar û desteya derebegan. Li gund ji hemû wan yarîya û têkelbûna bi wan hevdijîyên germ û petdabûna wan di navbera Zorabî û wîjdana wî û komalgehê ku tê ketine. Bi neçarî bajêrê xwe bi cih dihêle û berev ciheke din berê xwe dide rê û li qezayeke din dimîne û ji wî cihê nû bi erîze nivîsînê dema xwe bi rê dike.

Piştî demek kurt bi tawana xetnexweşîyê û neşarezahîyê wî berev zîndanê dibin. Di wê demê de Zorab kete di nava wê lehiya bertîldanê û hemû rê û rêbazên jiyana wî hatine guhartin û kêşeya wî jî hate çareserkirin û bi baştirîn erîz nivîs hate li qelem dan.

Û ji piştra bû memurê nivîsînên serokê qezayê, li vir ji bo wî derket ku bi rastîyê nagehe çî armancan lê bi derew û vedîtina riyekên kaselêsîyê dê postan werbigre. Ew Zorabê ku ji destpêkê bêz li her reftareke xirab vedibûn niha bû jêdera karên xirab (Resul , 1989; 234).

## Şîrovekirin

Çîrok rexneyekî civakî ye. Kêşe û nakokîyên civakê di hişê Zorabê serlehengê çîrokê de wê dikin ku berî her tiştî li pey bersiva vê pirsê be ku çima civak ev qas gendel e. Zorab ji ber ruhê xwe yê pak û paqij nikare tu karekê berdewam bike û her pîşekarê ku dibîne rexne dike. Herî dawî dest ji her tiştî ber dide û li pey xewin û arezûyên xwe diçe û dixwaze cihekê peyda bike ku mirov û mirovahî têde serdest e.

Geşta Zorab wê dike ku bibe hêmaneke dadmendîyê. Zorab di karê daxwaznamenûsîyê de dikare xewnên xwe bike rastî, lê ev rastî jî zêde dewam nake û gendelîya civakê wê dike ku ji ber sedema xirabbûna destxetê xwe doz li ser wî bê vekirin.

Belgeyê serekî yê dozê jî ne têkildarî kêmasîyeke hizrî an derûnî an kesayetîyeke nebaş yê lehengê çîrokê ye, lê belê têkildarî rewşeke derweyî an ku xerabîya xetê wî ye. Herî dawî Zorab nikare ku xwe li pîsîya civakê biparêze û di nava heman cihê ku weke paktirîn cih difikirî, bû endamekî gendelkar yê civaka xwe.

Nivîskar dixwaze bi vê çîrokê bêje ku bandora civakê li ser endaman bi tu awayî nayê redkirin û ji bo ku kesek pak û jêhatî û bisûd be pêwîst e di nava civakekî pak de bijî.

## Berhemên wî

1. Berhemên hozanên wî bi gelemperî diçine nava (xezel)ê .
2. Hozaneka cût qafîya (mesnewî) li dîwanawîda berçav dikeve, li ser kêşa behra erûzê nivîsandîye.
3. Hozanên wî hene li ser Bend (kûple) nivîsandîye.
4. Hozanên wî hinek ketine bin karîgerîya Şira Romantîkî Osmanî li ser kêşa Sîlabî xomalî rêkxistîye.

5. Çîeoka Meseley Wîjdan. (Xeznedar, 2005; 454-471).

### **3.5.5 Osamn Sebrî (1905-1993)**

Helbestka û çîroknûa û sîyasetmedar Osman Sebrî di 7\1\1905an de li gonde Narneya Kolîga Semsorê te ser dinê. Kure Serokê Êla Mirdîsan e. Bavê wî di sala 1905an da diçe ser dilovanîya xwedê. Ji ber vê yekê ev li ba apê xwe yê ku bibo serokê elê mezin dibe.

Piştî serhildana şêx seid di sala 1926an de li gel her du apên xwe şokrî û nûrî tê girtin. Her du apên wî di zîndana Dîyarbekrê da tîn bidarvekirin; Lê ev du salan di zîndana bajêrê Denîzliyê de dimîne û piştî efoyeke giştî, di sala 1928an de tê berdan. Di sala 1929an da careke din li gel 26 serokên Kurdan tê girtin û dîsa piştî sizayekî sivik tê berdan.

Osman Sebrî ji ber pest û pêkutîyên dewletê di 24/12/1929an de mecbûr dimîne bireve Sûrîyeyê. Li Sûrîyeyê dibe encamê partiya xweûbûnê û di kovara hawarê da li ser mijarên jihêreng, Helbest, Fabil, Çîrok, Nirxandin, Dannasîn, Gotar û ceribandinan dinvîse.

Helbestvan û nivîskarê wêjeya Kurdî apê Osman sebrî, di sala 1954an da alfubeya Kurdîya Latînî diveşûne û hin pertûkên mîna bahoz, komik, derdên min û çar leheng dinvîse. Gelek helbestên wî yên neçapkirî jî hene.

Di sala 1957an da li gel hin welatparêzên Kurd, di xebata damezrandina partîya democrat li Sûrîyeyê de cih digre û wekî sekreterê partîyê tê hilbijartin.

Osman Sebrî di 11/10/1993an de diçe ser dilovanîya xwedê. Gora wî li gondê berkevrê li gondê binxetê yê. (Sebrî , 2017; 4)

**Berhemên wî**

1. Li goristana Amedê, çîrok (2007, çapa duyem 2016, weşanxwaneya Lîs).
2. Hevalê çak, Pexşan, 2011, Lîs.
3. Serên Sasûsê, Dîrok, 2016, Lîs.
4. Bîranînên Min, Bîranîn, 2016, Lîs.
5. Çar Leheng, Vegotin, 2016, Lîs. (Sebrî , 2017; 4)

### **Li goristaneke Amedê**

Îşev ji hemo şevan pitir bêhna min teng bibû. Dîsan derdê min serî bi derxistibû. Şaxên mor li kola min a devbernixûm dîyar bûn. Tajan û tîvancan, jidil xwe dirêjî kilox dikir. Tezîyên ser ji binê lingan heya qota serî diçûn. Qefsîng li min teng bibû û têra dilê min nedikir. Wekî nexweşê ku ta li serî dide, min dixwast çilên xwe biçirînim. Xwêdaneke sar û zilqok bi enîya min ketibû. Min li derdê xwe kiribû der, lê mekûna wî tunebû. Kela gîhana welêd... kela gîhana welêt...

Min da xwe rabûm nabvera mala me û behrê 200 gav hebûn. Ber bi behrê ve çûm (her car kuev kele li min radibû ez diçûme ber behrê. Ji ber ku derdê min û vê bi hev diman ku timî bipêl e, hevîniya min pê dihat) hêdî hêdî diçûm ku mîna pêlên behrê dengên wirewir û kan û zirîna teyarekî şevê di zik hev de wekî lorîka dîyal li ber dergoşê bi canê min şa dibûn. Dilê min fire xweş bû, kela min pitir radibû, li min wilo qewimî ku pîyan min pirê caran nehihan erdê. Çengên min radibûn. Vê gave min fîra teyaran dixwazadin. Bi şêna yezdanê gewre ba ket bin çengên min û ez firîyam. Ez difirîyam lê zûka ji teyaran balafîran û kamilkan difirîm. Bi vê çûnîyê de seatekê da, min dikarîbû di ser hemû dinê ra derbaz bibim. Cîyê ez biçûmayê nezîng bû, di bêhnekê da, min Filestîn, şerq, eUrdir, Sûriye, derbaz kir û ez li tela serê kanîyê li sînorê welêt raperîm. Di navbera Mardîn û li wêranşehrê re min xwe gihand ser Dîyarbêkrê. Lê gava gehîştin dîyarbêkrê li hela derê çîyan tîrêjeke norê wekî kesk û sorê lê stor bi ber çavê min ket. Çavê min delîyan û hinekî ez weremat mam. Paşê min xwe lê girt û çûm. Gawa gehîştin tîrêja norê wekî perperokên ku per diveşînît ez jî jor de hatin xwar û ketim. Hîn êwar û zû bû. Cihê ez rê ketî li pêşberî rawesteka balafîrên roman bû. Kîlos (eskerê tirko) di serhêl û binhêla min ra derbaz dibû. ez di cihê xwe da mam, piştî demekê din qerîya (reş)



û ker bû her kes nivist. Tenê dengekî bişên di Dicle dihat. Serekî min dûralîyên xwe çav kir. Ji neyaran nîşan nemabû. Hîn tîrêja norê bi hemdê xwe şewil dide. Ji ber ku du mamên min jî di vê erdê da weşartî ne min zanîbû ku kî şêr li vê radizê... şêx seîdê kal. Min hêdî hêdî xwe gend tîrêjê.

...

Li ser bêmadîya hevalan êdî min nexwast li wir bimînim. “hişyarû” ya ku di destê min da min pêça ku têxim bi rêka xwe. Min dît destekî mezin dirêjî ber devê min bû. Min nas kir destê ruhîstîn bixwe bû. Destê min ê ku hişyarî têde bê hemdê min li destê ruhîstîn de û ketim rê. Bi helweşandina hestê min re êşekê li dilê min xuya kir. Min çavên xwe vekirin ku li nêzîka vehrê li ser mêrgekê razayî me û min piştta destê xwe yê rastê di rex xwe de li koçkî daye û xwîna gerim jê tê. “hişyarî” jî di destê min de tunebû. Şefeqê hîn nû gewir kiribû. (Osman S. , 2017; 27-28)

Mesu' Keviya deryaya Sor: 15 golanê, hawar, 1933, hejmar 21ê.

### **Şîrovekirin**

Di vê çîrokê da nivîskar bi awayeke pisporî bûyerê di nav bedena çîrokê da berbelav dike û ji paragrafa yekemîn heya xêza dawî ya çîrokê li ser bûyerê diçe. Çîrok di rastî da ji xevneke bedev pêk tê ku xwîner dikare bi başî hest bi hêmanên cih û demê bike. Navên cihan ku di çîrokê da tînan bikaranîn navên rasteqîn in, berovajî awayê derbirîna çîrokê ku xeyavî ye. Ji bo cara yekemîn di vê çîrokê da hêmana rengên netewî an ku kesk û sor û zer girêdayî mijareke netewî tînan bikaranîn. Çîrok amajeyêke dîrokî bi lehengên wêjeya Kurdî û di nava wan de Xanî dike. Geşta nivîskar di nava çîroka xwe de geşta kesekê dilnizm e li hember mezinên Kurdan.

Bikaranîna peyvên weke qewm, şehîd, ol, agir, şêr, Kurdîni, Buheşt, leheng û hwd bi zanebûna nivîskar û bi awayeke berfireh hatîne bikaranîn ku bale bikîşînin ser

naverokeke Kurdewar a çîrokê. Gelek peyvên din jî ji aliyê nivîskar ve weke kodên girtî hatîne bikar anîn û nivîskar erkê vekirina wan kodan xistîye ser şanê xwînerê çîrokê.

Kesayetîyên vê çîrokê ji nas û kesên nivîskar bigre heya lehengên Kurdan pekten. Buyer gešta xeyalî ya nivîskar e ku têda meseleya ziman ev qas tê mezin kirin ku pênameya buheştê jî girêdayî awayê têkildarîya li gel ziman dimîne.

Karakterê sereke yê vê çîrokê bi pênuşa nivîskar vê peyamê dide ku xwandin girîng e û di pêwajoya xwandinê de jî Hawar ev qas rêveker û girîng e ku karakter dixwaze bi her awayî xwandinê bidawî bîne.

Dîyalogên çîrokê bi pênuşeke bihêz wisa di nava çîrokê da hatîne bicihkirin ku dariştaya çîrokê têk nade. Dîyaloga di navbera melîkan û nivîskar de mînakê ve angaştê ye. Nivîskar bi vê çîrokê hêmanên hişmendîyeke Kurdewar jî dide nasandin. An ku kes li serê xwe û bêyî nasîna kesayetîyên Kurdan, cihên tayebet, bûyerên teybet û hwd nikare kesayetîyeke temam di xwe de biafirîne.

### **3.5.6 Pîremêrd (1867-1950)**

Navê wî yê dirust Tewfîq Mehmûd Hemze ye ango Tofîq Begê Mehmûd Axay Hemza Axayî Mesiref e, di sala 1867ên mîladî û li hemberî 1288ê hicirî li taxê gwêje li şarê Silêmanî ji dayik bûye (Umêd, 2001; 49). Bapîrê wî (Wekîl Xerc) berpirsyarê Ehmed Paşay diwahemîn mîrê baban bû, her ji ber vê çendê hatiye naskirin bi "mesiref" (Qenatê, 1922; 297).

Pîremêrd di temenê şeş saliyê de diçe ber xwendinê. Bo cara yekê diçe "Hucire" yê ji aliyê Mela Huseyne Goce quran û kitêbên seretayî xwendina hucireya wê demê temam dike. Piştî hingê ji bo xwendinê diçe cem Se'îd Zilizileyî, piştî wê çendê ku dikeve ber xwendina dînî feqeyetî dest pê dike. Di destpêkê de di mizgefta bapîrê xwe ku niha jî maye li Silêmaniyê bi navê Mizgefta Hemzaxa ye ku nêzîkî mala bavê wî bû,

li cem Mela Mehmûd dersên Erebi dixwîne. Di xwendina Erebi de ta asteke baş diçe pêş û dest dike bi xwendina "Siyutî" xwendina wî diqede. Pişt re mîna hemû helbestkar û nivîskarên Kurd di destpêkê de ji bo zanist û xwendina dînî geriyaye û dûr dikeve ta digehe mizgefta şarê Bane li Roj helatê, maweyekê li wê derê dimîne piştî hingê vedigere Silêmaniyê.

Di Îlona sala 1882ê de di temenê 15 salî de dibe katibê nifusê yê Silêmaniyê, gelek di ser derbas nabe dibe katibê dadgeha Silêmaniyê. Di hizîrana 1883ê de dibe katibê humayunê li Helebce. Di teşrîna yekem ya sala 1895ê de bûye miawin mudîrê şarê Kerbelayê bes neçûye û dest ji kar kêşaye, paşê dest ji her cure karên hikumetê kêşa. Şêx Mistefa Neqîb kiriye wekîlê xwe bo raperandina îş û karên jiyaneke baş. Li ser vexwendina sultan 'Ebidulhemîd, Şêx Mistefayê Neqîb û Şêx Se'îdê Hefîd, Karwanekê rêkdixin û di sala 1898ê de diçine Tirkiya yê, Pîremêrd jî dibe hevseferê wan. Li Stenbole li mabeynê dibin bi mêvanê sultanî, piştî salekê digel Şêx Se'îd û Şêx Mistefa û gelek rewşenbîrên din diçine hecê Tewfîq dibe bi Hacî Tewfîq, ji aliyê sultanê Osmaniya paya begêti sitendiye û bûye bi Hacî Tewfîq Beg. Di wê salê de Zet Paşa katibî derbarê şehriyar, bersiva wê nameya ku Nasiredîn Şa ji bo sultan Ebidulhemîdî nivîsîbû dide. Şêweyê nivîsandina nameyê bi zimanê Farisî û zîrekî û Hacî Tewfîqî gelek bi dilê wana bû. Her ji ber vê çendê di 14ê îlona 1899ê de fermana sultanî bo wî derdiçe û dibe endamê meclisa bilind a Stenbolê. Her di wê maweyê de bi alîkariya Zet Paşa koleja yasayê tamam dike. Di temuza 1905ê de banga meşrûtiyetê hate dan û meclis têkçû. Pîremêrd bi karê mihamyeta kovar û rojnameyan ve bû. Di sala 1907ê de Komeley Kurd bi nihênî li serokatiya Şêx Ebidulîqadirê Şêx Ebidualiyê Şemzînî hatibû damezrandin û di 1908an de hizba Îtîhad û Teraqqî" sultan ji ser text bir, ew komel xwe aşkera kir Pîremêrd jî yek endamê komelê bû. Di meha îlona 1909an de bûye devedarê (qaîm miqaîm)ê Culemêrgê. Di meha nîsana 1912an de bû ye devedarê Qeremursil. Di şubata 1915an de bûye devedarê Balawa. Di îlona 1916an de bi heman post ji bo "bît alişbab" hate dayîn. Di adara 1917de bi heman post ji bo Gumuşkuy hate dayîn. Di meha nîsana 1918an de bûye miteserfê şarê Amasyayê li Tirkiyayê, heta sala 1923ê li wê derê bû.

Dema hikumeta Îraqê di sala 1923-1924ê hate damezrandin, Pîremêrd ji Tirkiyayê vegerya bo Bexdayê û ji wê derê jî bo Silêmaniyê. Di meha kanûna duwê sala 192an de gehiştê Silêmaniyê. Her di wê demê biryar da ku kar li dezgehên mîrî neke. Di sala 1926an de rojnameya Jîyan ji aliyê bajarvaniya Silêmaniyê hat damezrandin û Hisên Nazim bû mudîrê îdarê û serokê wê, Pîremêrd jî bû sernivîskarê rojnamê. Di sala 1932an de dema Hisên Nazim wexer dike, Pîremêrd dibe bi mudîr û mesulê rojnamê. Di sala 1938de navê rojnamê diguhere û dike Jîn û heta 15ê hizîrana sala 1950 hezar û pazde jimareyan çap dike (Umêd, 2001; 49-50) .

Pîremêrd li Stenbolê jiyanêke dirêj jiyaye, Umêd Aşîna ji bo jiyana Pîremêrd weha dibêje: Ez, Pîremêrdê xwe li Stenbolê li giravên ku pîrensên rûman lê bi rutbe, nîşan û endametiya meclis hêl ve dijiyam, dema ku ez radizam min di xewnên xwe de li Gurgederê ji baxçê Şêx Ehmedî bazlîxa hinaran didiziya (mehemed, 1999; 75). Di vir de em dibînin ku Pîremêrd li giravên Stenbolê jiyanêke gelek xweş derbaskiriye û dîsa her li Stenbolê digel jineka tirk zewiciye.

Pîremêrd li Stenbolê tenê bi rewşenbîrên tirk re têkildar nebû ew di heman demê de bi rewşenbîrên Kurd re jî di nav peywendiyê de bû, bi taybetî li gor Qenatê Kurdo, kurê Şêx Ebdualiyê Nehrî, Seîd Ebdulqadirî ew hildabû bin bandora xwe. Dema ku Pîremêrd li Stenbolê bû, peywendiyên Pîremêrd bi Kurdên rewşenbîr ên li Stenbolê dijiyan re hebû, hin ji wan rewşenbîrên Kurd ev bûn: Emîn Feyzî, Tewfîq Wehbî, Emîn Zekî Beg, Mistefa Paşa, Eşref Hemze, Salih Zekî Beg, Me'ruf Çiyawuk, Ebdula Cewdet, Şerîf Salih Paşa, Kamiran Bedirxan, Şêx Mistefa Neqîb, Şêx Mihemed Celaledîn, Şêx Mihemed Mutfî,.....) (mehemed, 1999; 76).

Pîremêrd di salên yekem de di gihîştina wî ya bo Tirkiyeyê de her di wê demê de bû endamê meclisa hêl li Stenbolê. Paşê bû xwendekarê hiqûqê dest kir bi nivîsîn û wegêrana helbest û gotar û zindîkirina edebiyata Kurdî û nasandin bi cîhana nû. Di vira de navê wan kovar û rojnameyan dinivîsîn ku Pîremêrd xwedî û sernivîskar bû yan jî di desteya nivîskaran bûye yan jî nivîskarekê çalak bû bi pênivîsê xwe rûpelên rojname û kovar razandî:

1. Kovara Resîmlî Kîtab, xwedî îmtiyaz Hacî Tewfîq Beg Stenbol.
2. Rojnameya Kurd yan jî Kurd û Te'awn û Teraqqî Gezetesî.
3. Digel Faq Sebrî Beg rojnameya Misewr Mihît yan derxist.

Beşa herî zor di rûpelên rojnameya Jînê de\*( Ev rojname di sala 1918-1919an de li Stenbolê bi Kurdî û tirkî derdikeve, birêz Mehmed Emîn Bozarslan ê dilsozê Kurdên Bakûr, hemû jimareyên wê wergerandiye ser tîpên Latînî û çap kiriye) helbest û nivîsên wî hene:

1. Di rojnameya Şems de gelek caran li Tirkiya helbest ji bo dinivîsand û dişand bo Tahranê, xwediyê vê rojnameyê Seîd Hisênî Îranî bû. Pîremêrd di vê biwarê de nivîsî ye: "gelê xizimetî xezetey şemis-mi ekirid ke Seîd Hisênî Îranî xawenî bû".
2. Di kovara Ferheng û rojnameya Şefeqî Surx deku li Tahranê derdiket, herdem nivîs û helbestên wî hebûn.
3. Sergotar ji bo rojnameya Îqdam û Hiryetê dinivîsî.
4. Li Stenbolê di sala 1904-1912an de di kovara Îtîhadê de berhemên xwe û Nejadê kurê xwe belav dikir.
5. Di rojnameya Tercimanî Heqîqet ya Mi'lim Nacî de ku li Tirkiya derdiket helbestên wî hene.
6. Bi Dawid Heyder kurê Îbrahîm Heyder re xwendekarê lîsansa bilind bû li Ferensa di rê de helbestên hêl û nivîsînên Kurdî ji bo rojnameya Tanê dişand, rojname li Parîsê derdiket (Umêd, 2001; 54-55) .

Niha ew hemû helbest û nivîs û wergerên cuda cuda yên Pîremêrdî ku di kovar û rojnameyan de dihatine belav kirin ji bilî pazde jimarên kovara Jînê, ewên din li ber dest nemane. Ew wergerên tirkî û farsî zor zehmet emê bibînin. Hebûna Pîremêrdî mîna keseke helbestkar û edîb û rojnamenivîsekî weha di maweyê bîst pênc salan di nav cîhaneka şaristanî di Stenbolê de jiya. Ew bi xwe xwedî pirtûkeke serbixwe yan jî dîwanên helbesta ye, di vir de bo me diyar dibe ku em ta niha bi beşekê girîng ya jiyana vî edîbê welatê xwe nizanin.

Hacî Tewfîq ne bi tenê di aliyê rojnamegeriyê xebitî ye ji xeyrî wê dema ku li Silêmaniyê bû ji aliyê zanistî û çavkanyasê de jî xebatên wî hebû. Pîremêrd endamê komeleka bi navê Zanistî bû, paşê bû sekretêrê vê komelê û dîsa bû serokê vê komelê û bi salên dirêj ve serokatiya vê komelê kir.

Bo cara ewwil digel belavkirina helbesta “beyanî bû le xew hestam befir baryue” re di hejmara 312ê ronameya Jiyanê de di sala 1932ê navê xwe ji Hacî Tewfîq Begî ve guherand bo Pîremêrd. Eger em bi hurî li babetên rojnameya Jiyanê binêrin bi taybetî her ji hejmara pêşiyê heta diwayî hejmara rojnameya Jiyanê ku hejmara 553ê bû di 10ê adara 1938ê derket. Behra pitir berhem û pênivîsê Pîremêrdî bi xwe ye, bi taybetî sergotar û pendên pêşinan û helbest û wergêrên Mewlewî (Umêd, 2001; 58). Di sala 1938ê de ji aliyê Mecîd Ye'qub"î ku bi regez tirk bû bi biryara wî rojnameya Pîremêrdî hat girtin. Lê Pîremêrd di hewl û çalakiyên xwe de berdewam bû û çapxaneyek avakir. Her wiha îmtiyaz jî wergirt, 26ê kanûna duwê 1939ê de li ser heman hejmare zincîra Jiyanê re hejmara 554an ya rojnameya Jînê derxist û heta hejmara 1015ê di 15ê hizîrana 1950ê de dewam kiriye. Ango em dikarin bibêjin çar mehan pêş mirina wî, diwahemûn hejmara rojnameya xwe pêşkeşî cîhana rojnamegerî û neweyên dahatî kir.

Gelek çalakiyên balkêş yên Pîremêrdî hebûn ku çalakiyên wî yên ji bo newrozê yek ji wan e. Li Silêmaniyê Pîremêrd cejnên newrozê vejandibû, tiştê ku ji bo vê yekê kiriye heta Melîk Mehmûdî jî nekiriye. Di newrozê de Pîremêrdî nêzî hezar bar dar li aliyê Girdê Seywan vêxist û li wir çadir çê dikir, ji bo vî tiştî karmend û xwendikar û bazirgan û rewşenbîran dawet dikir û gelek mesref dikir ji bo pîrekan jî çadirên cuda çêdikir û ew jî dihatine wê cejnê.

Pîremêrdî di nivîs û helbestên xwe de gelek nasnav bikaranîye, ew nasnav bi qasê ku me tespît kirine ev in:

Sulêmanî M. Tavîk (Komela Hevkarî û Pêşketina Kurd ku li Stenbolê çap bûbû de), m. Tafîk (Komela Hevkarî û Pêşketina Kurd li Stenbolê çap bûbû de), Sulêmanlî Tafîk (Komela Hevkarî û Pêşketina Kurd li Stenbolê çap bûbû de), S.Ti (kovara Jînê ya ku li Stenbolê çap bûbû de), Tafîk (kovara Jînê ya ku li Stenbolê çap bûbû de), PîreKurd

Tafîk (kovara Jînê ya ku li Stenbolê çap bûbû de, Hacî Tofîq/ Hacî Tewfîq, Hacî Tafîk, Hacî Tofîq Beg, Pîremêrd, Bênav, Bîsaranî, Cêşaneyî, Debaşanî, Ebidulwefa, Ebidulwefay Kurdî, Gurgederî, Kesnezan, Kunemasî, Kiwêxe Remezanî Wurimiziyarî, Mecizub, Melay Heyasî, Pîrweysî Xelk, Qember Elî, Qere Tûxan, Şêx Ebidulwefa, Şîrî Ezîzî, Tazediyuane, Welî Diyuane. Xak Xolî, Zergeteyî) (mehemed, 1999; 69-71) .

Pîremêrd ji bilî karê rojnamegeriyê gelek berhemên din hene, berhemên wî ev in:

1. Ruha Mewlewî du cilt, di sala 1935 li weşanxaneya xwe çap kiriye, metnên hewramî navê wê kiriye Esil, li hember metna resen wergera wê ya devoka Silêmaniyê jî weşandiyê navê wê jî kiriye Roh bi ramanê roha Mewlewî tê.
2. Mem û Zîn, ku çîrokeka tirajîdî dildarî ye, ev çîrok di şeweyê şanonameyê de amade kiriye ji her hêlê ve ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî cudaye.
3. Diwazde Siwarî Merîwan, çîrokeke honerî ye ku di sala 1933an di rojnama Jîyan li hijmara 366-376 de nivîsî ye (Resul , 1989; 241).
4. Şanoya Mehmûd Axay Şîwekel di sala 1942an de nivîsî ye.
5. Galte û Gep yan jî tirane pêkirin, di sala 1947an de nivîsî ye ji hinek bûyerên xweş yên nav civaka Kurd. Hem ji bo pêkenînê hem bo pendê nivîsî ye.
6. Romana Kemançejen, di sala 1942an ji tirkî wergerandî ye ser zimanê Kurdî
7. Dîwana Mewlana Xalidê Neqşebendî ku bi çend caran li rojnama xwe de belav kiriye.
8. Helbestên Welî Dîwana Bêsaranî ji hewramî wergerandiye ser devoka Silêmaniyê.
9. Çend pexşanên honerî nivîsîne.
10. Çend gotar di derbarê dîroka Kurdan û mîrnişîna Baban û xêl û tîrên Cafan nivîsî ye.
11. Hezaran beytên şîrî, pendên pîşînan hene ku Kakê Felah hemû ko kiriye û çap kiriye.

12. Çend bend û beytên folklorî û çîrokên zarokan û metel ku eve jî dibe bi pirtûkek (Umêd, 2001; 62).
13. Sanatkar Dünyayı Gezen Bir ji elmanî wergerandiye tirkî û ji tirkî wergerandiye Kurdî.
14. Kürt Darbı Meselleri hejmara van gotinên pêşiyên 4800 (Zekî beg, 1998; 172).

Di roja 19ê hizîranê sala 1950ê mîladî de li Silêmaniyê bi nexweşya şeker û gurçîlan ve di temenê heştê û sê saliyê de wexera dûmah, yê dîke û li ser wesiyeta wî li girê Mameyare yê li Silêmaniyê tê veşartin (Umêd, 2001; 50-51).

Ev çîroka ha weke Pîremêrd bi xwe aşkera dîke û dibêje ku destaneke folklorî ye bi bet û meqam hatîye gotin û bi rêya zardevî hatîye veguhastin, Pîremêrd jî vê destanê bi renekî nû weke çîrokeke honerî ji nû ve nivîsî ye (Hiseîn, 2011; 35-36).

Berîya ku jiyannama Pîremêrd bi dawî bê min dixwest behsa wergera wî ya Kemançejen bikim ku ji tirkî wergerandiye bo Kurdî. Kemançejen romaneke tirkî ye û bi kareke edebî yê resen û zimanekî rehwan û puxt kirîye Kurdî, kewate Pîremêrd bi vê berhema werger re yekem kese ku çîrokeke biyanî wergêraye ser zimanê Kurdî.

### **Diwanze Siwarê Merîwan**

Li bajarê Qelaçuwan Ehmed paşayê mezin bi nav û bange bi Şah Xazî êhmedê leşkir şkên bi dest helat dare. Êvaran li kenarê çemê Qelaçuwan rudiniştin û mirovên jêhatî li dorawî kum dibûn êk Mela Hemzeyê Evxanî û Ekremê kurê wî dihatin bû dîtinawî û girew dikir li ser li ser leyzitina Dest û Bazuyên Ekrem û Selîm Begê Mamê Ehmed Paşay. Ji encam Selîm Beg wê girewê dibe û ji piştra Axayê Bekravê û Axayê Xurmalê diçine rava Berazan.



Selîm Beg jî digel wana biryar dide kû digel wana biçe bû nehêştina Berazan. Dinêrine dîv çend zelaman ku hemî xirvebin û rêk dikevin li dola Gelalê li serve heta Sibhan Axeyê û li binê Seyd Sadiq ve rave encamp bi den çukî ew cihe serukanîya Qumaşîye belkû telhawan bi hişyarî serbigre û birevînin jib û xiwar Bekravê.

Siharê hemî siwar dibin û berev cihê dîyarkirî dicin piştî hingî deng û bas digehine Ehmed Paşa ku Leşkirê Îranê gehiştîye Merîwanê li destpêkê Ehmed Paşa wesa hizir dike ku bç beref dola Gelaleyê çukî kesê wesa li devwî nemabû. Belê piştî lêkdanevê wesa biryarra revînê û şernekirinê radigire û ferman dike bicine nav cergê şerî. Li rêda siwar çakên xwe dibîne û pêra di bêje bi pêşkevin ewjî diçin bi hevre li êvarîyêda digehine sinurê nêzîk ordûya Îranê û dabeş dibin bi ser Diwazde rexanve ji hemî alîyekîve dengê tepil û dengê aman aman têkhelî hevdu dibin û li nîve şevê da bi ser dujminî digirin û dişkênin navê xwe li serbilindî li berperên mêjûyê dinivîsînin (Resul , 1989; 244).

### **Şîrovekirin**

Vekirina babetê çîrokê gelek sade û sakar e. Lê herçiqas ku pênuşa Pîremêrd pênuşeke bihêz e jî, ev çîrokê de li berawirda li gel çîrokên berê ji hêla honerî ve di asteke nizim da ye. Dîyalogên veşartî yên ku di nava çîrokê de cih digirin wisa dikin ku xêza çîrokê têk neçe û her yek ji wan dîyalogan jî xwedî peyameke xurt in û bandorê li xwîner dikin.

Babeta din a ku di derbarê vê çîrokê de girîng e û mirov dikare amajê pê bike ew e ku nivîskar hevgirtinê weke bingeha serkeftina Kurdan binav dike û wê peyamê dide ku kêmbûn hejmarê nabe sedemê şikestê, dema ku ev hejmara kêmbûnê hevgirtî be.

Ev çîroka pîremêrd ji hêla dîrokê ve xwedî du taybetmendiyên cuda ye. Ya yekem ew e ku çîrok berhemê hizra nivîskar nîne, belku bûyereke rastîn e ku demek dirêj berîya nivîskarî rû daye. Bûyera ku bi pênuşa nivîskarî rengekî nû ye honerî girtîye

û di nava wêjeya Kurdî de bicih bûye. û taybetmendîya duyem jî ev e ku dikare amajeyeke honerî be ji bo bûyereke serdema pêxemberê îslamê û şerê Bedrê.

Nivîskar di kesayetîya lehenhên çîrokê de mêrxasî, azayetî û qehremanîyeye bêhempa berçav dike ku ev çend jî ne xeyaleke nerast lê belê rastîyeye civaka Kurdewar e. Hem mîr û hem jî siwarên pê re her yek lehengek e wê civakê ne ku temsîla başî û welathezîyê dîkin.

### **3.5.7 Mihemed Elî Kurdî (1905-1957)**

Mihemed Elî Kurdî li Hoza Mengure. Li sala 1905an li gundê Sindolana navçeya Sengeserê li dayîk bûye. Li destpêkê dest bo Quran xwendinê kirîye li cem babê xwe. Dema ku babe wî dimire, ev bixwe neh salî bûye, berê xwe daye Sablaxê û usûlîya dîn û zimanê Erebi lê xwendîye. Piştra dice mizgefta mazina bajarê Sine. Piştra vedge alîyê xwe, û li Mizgefta “Xadîmul Secadî” ya bajarê Koyê dixebite, ji aîliyê Mela Mihemedê Mezin dubare dest bixwendinê dike, û li sala 1919an digel Hacî Îsmail bi navê tîcaretê li koyê diçê Bexda, bi palpiştîya hevalên xwe li zanîngeha Al îmam Al e'zem hetîye wergirtin. Salekê bitenê li wî cihîmaye, piştra dihête veguhaztin jobo xaneya bilin ya Mamostayan Dar Al Mi'elimîn Al Mimtaz, piştî dû salan tamam kirîye, liqezaya “’ane” bi mamostayetî dadimezre û 8salan li wir xebatê dike. Liwir jineke ereb buxwe anîye. Ê liçek bi tenê hebûye û nav lê naye “Hind” ew jî dibe mamosta.şarezahî di ziman û edebîtat û lêkdaneva Quranê hebuye, û şîrên “Ebî Newas” ji ber kirine.

Dinava salên sihan hatîye veguhaztin ji bû bajarê silêmanîyê û li qutabxaneya “çubarbax” bûye, û piştra hatîye bajarê Bexdayê û qutabxaneya “Alşerqîye” mamostatîya mêjû û zimanê Erebi bûye.

Li sala 1935an li ezmuneke Wezaretê Navxwe bi êkem derdiçe, û bûye bi Rêveberê Nahyeya “Biradost” li qeza Rewandizê, belê ne çuye serkarê xwe her li

Bexdayê vemaye, dema Wezîrê Navxwe û wekîlê Wezîrê Dad dizane kesek heye pirzanaye û rexne gire, naçar diken bizivire ser karê xwe li Rewandizê. Li wir Baheştâ Hisên Huznî Mukrîyanê dinase.

Li sala 1945an dîsan bû Rêvaberê Nahyeya Pêbazî ya ser bi Qezaya bajarê Kifrê, û li wezîvê, hatîye derkrin ji ber nekarkirinawî di wezîfa xweda (Alî H. M., 1958-10-28). Ji bûy egehîyên baştir li ser vî ronak bîrî derbarey jîyanwî bi dirêjahî di kovara “Yadgarî Lawan û Dîyarî Lawan” binêrin ji aliyê çpemanîya Jîn belav kirîne ku çapa dûyê li sala 2005an dûbre egehî belev kirine

Li dawîya jîyanaxwe, li Xir nabata nêzîkî bajarê B’qube. Bûye harukarê rêvaberê qutabxanê, heta li 5ê şubata 1957an kuça dawîyê dikem wesyet dike kû, li ser layekî Çîyayê Hemrînê bihête sparidin bi axêre (Berzincî, 2019).

Mihemed Elî Kurdî, li zimanê Erebi û Rêzmane Erebi gelek şahreza bûye, û ji ber rastgoyê û pakî û heqbêjîyê bûye sebabê pile bilind bûnawî li nava karubarê dewletê de. Wîtar nivîsînên wî di rojname û kovarên Erebi dahene, û dinava Ronakî û Hetaw da belev kirîne.

### **Berhemên wî bi Kurdî**

1. Çend nameyên şe’rî ji bo Tewfîq Wehbî û Salih Zengene û Şêx ‘Elaedînê Zînwê û Hawara Ranîyê bo Se’îd Qezaz-1935.
2. Çîroka Biznoke û Meroke.
3. Hikayeta Zadiç, Çpxaneyê Me’rif-Bexdad, 1954. Çîrokeke wergêrahîya li Erebi bo Kurdî û Teha Hisên li Firensîyê wergêraye Erebiyê.
4. Pertoka Eşya û sîhihe y qonaxa şeşa seretayê kirîye Kurdî.
5. Nazdar. Yan keçe Kurdêke gundî. Li beşeke kovara Ronakî da hatîye belav kirin.
6. Ê çendîn şe’rên bi zimanê Farisîhene.

### **Berhemên wî bi Erebi**

1. Nawdar, ew Al Ftat Al Kurdîye. Bi Kurdî nivîsîye kirîye Erebi.bi Romaneke rasteqîne ye.
2. Abû Al Zehra Al E'rabî. Diramayeke edebîye. Li sala 1949an nivîsîye.
3. Risale Mi'elim îla Exwanehu Al Mu'elimîn wel Muderisîn, Metbe'e Dar Al Me'rife-Bexdad.
4. Çend raportên Znastî û Rexneyên perwerdeyê derbarey ziman û mêjûya Erebi.
5. Çend witarên sîyasî derbarey Felestîne û dewletên Ereb û îşlamî bi Erebi.
6. Mihazire 'en lixe Al Kurdîye we Edebuha.
7. Mihazire 'en Al Lehcat Al Kurdîye fi Îraq na.
8. Mihazire 'en nimazic min Al Şe'I Al Kurdî Al Wicdanî (Şirhe û 'eliq 'îfye).
9. Komeleke witar û çîwarî li havîna 1950an li radyoya Bexdadê vexandîne.
10. Mizekerat Tifil meşum (bîrewerîyên wî).
11. Dû pertûk bi zimanê Erebi li ser cugrafi û mêjûyê bo Wezaretê mi'arif danîne û hatine çap kirin (Alî H. M., 1958-10-28).

Danana çîrokên wî bi kurtasî

Yek: Çîroka **Diway Serxweşî Zor Şetîye** ku di sala 1934an de di kovara Dîyarî Lawan de hatiye belavkirin, çîrokeke rastewxo berê xwe dide amanceke civakî ya sakar û kem terxemîya û rewîştê xirab yê mirovekî nîşan dide. Di çîrokê de rexnê li leheng tê kirin meyxor e, lê di şexsê wî de rexneyê li civakê dike. Jina leheng nesax li hundirê malê li jûra xwe û mihtacî çavlêkirinê ye bes ew guh bi vê yekê nade û diçe cihê şevane yê mey vexwarinê. Demeke şevê bi derengî vedigere mala xwe bê ku jina bipirse, dinive. Siharê dema ji xew radibe dibîne ku jina wî miriye, di dawîyê de ew jî bi xwe ji xem û xefetan dîn dibe. Nivîskar bi nîşandana lehengekî xerab şîretan li civakê dike ku meyvexwarin çiqas xirab e. her wiha girîngiya malbatê û jihevhezikirin, merhamet û alikariya ku pêwîst e jî nîşan dide. Mirina jinkê û pê re dînbûna leheng du buyerên girîng in di çîrokê de ku her du jî encamên van kiryarên xerab yê meyvexwarî, nebaşî û bêrehmîyê ne.

## Şirovekirin

Çîrok herçiqas ku gelek kurt e lê belê xirabîya rewşa jina Kurd nîşan dide. Di rewşekê da nexweş e û di nava nivînan de razaye û li her demê zêdetir pêdivî bi çavdêrî û alîkarîya hevjinê xwe heye, tenê û di nava bêxwedîtîyeke bêsînor û dilêş de ruh dide.

Karakterê serekî yê çîrokê ev qas neberpîrsîyar te digere ku hemî heyînên jîyana xwe dike qorbana vexwarineke heram, an ku mirov dikare bêjê ku bi tişteke heram ne tenê laşê xwe lê belê jîyana xwe jî heram dike. Herî dawî bi xwe dihesê û dizane ku bûye qorbanîyê nezanî û kêmtêrxemîya xwe lê nikare serî bilind bike û encamp ev qas tal e ku rasterast di sernaavê çîrokê de amaje pê hatîye kirin. An ku karakterê çîrokê şêr dibe û êdî nikare di jîyana asayî de bijî.

Duyem: Çîroka **Nazdar yan Jinî Kurd le Ladê** ku di sala 1936an de di kovara Rûnakî de hatiye belav kirin. Bi xwe di binê wê de nivîsî ye ku “romaneka Kurdî ye ji 100 rupelan hatîye nivîsîn.” Vêca bi xwe di pêşekiyê de nivîsîye “merema min ji nivîsîna vê romanê ewe: ji jiyana qewmê Kurd rupelekê nîşan bidim ku bi çavekêbi girîngînedan û feqîr, belê ji nefis amir de gelek bi biha û mezin e.” Heta ku dibêje “Nazdar bo me nîşan dide ku jina Kurd li gundan çend azad û serbilind e.” Yekem elqeya çîroka wî di hejmarê 7an ya 28/adara/1936an de hatiye belav kirin û piştî wê elqeya duyem û sêyem di hejmarên 9 û 11an de hatine belav kirin û vêca ji ber derneçûna kovarê ew jî ji wêrê hatîye veqetandin.

Bivan sê helqan bume derdikeve ku nivîserî çîrok ya beş beş kirî û nav li herbeşe danaye. Beşê yekê bi navê Aştî ku pêk dihêt ji çar çapteran 1- minzirey Ladê. 2- Şew rabwardin. 3- Zorebanî. 4\_ Rojê le Behar. Beşa duyê bi navê Şer û Talann ku dikeve du mahîya jimara kovarê û livir diqete (Arif, 2011; 38-39).

### 3.5.8 Wezîrê Nadirî (1911-1946)

10/05/1911ê li gundê “Boralan” a serhedê ji dê û bavên bi navê Norê û Cebarî ji dayk dibe. Li gor adetên Kurdî di nav xelkê de Wezîrê Nadirî hatîye nasîn. (Xeznedar, 2016) Hê ev sê salî ye bavê vî dimire û ev sêvî dimîne. Li ser vê rewşa îdareya mala wan xera dibe. Nurana dayîka wî jineke xebatker bûye û di malên dewlemendan de bi karê paqijîya wan zarokê xwe xwedî kirîye. Salih û Yusifê birayên wî şivantî kirine, lê Şero biçûk bûye. (Xeznedar, 2016) Di 1926an de tevî malbata xwe ji ber zolma dewleta Tirkîyê li gelek malbatên din yên Kurd derbasî Sovîyetê rosîyeyê- Ermenistanê dibin. Wezîrê Nadir li vir hemû perwerdehiya xwe diqedîne û li zanîngeha Erîwanê dibe mamosteyê zimanê Farisî. Teza wî ya zanîngehê li ser melayê Cizîrî ye. Piştî sirgûna 1926an a romê îcar Sovîyeta Rosîya bi fermana Stalîn di 1937an de Kurdan dîsa sirgûn dike, îcar cihê sirgûnê asîyaya navîn Kazakistan e. Di wan salan da wezîrê Nadir di istixbarata dewleta sovîyet da dixebite û xwedî raye û roleke mezin e; tê malbata xwe dîsa vedigerîne Erîvanê. Wezîr ji bilî zimanê dayîka xwe zimanê tirkî (azerî), Farisî, rûsî, Ermenkî û gurgî dizanî. (Xeznedar, 2016) Gava ku duyem herba cîhanê der dikeve, wezîrê Nadir di nav “arteşa Sor” a Sovîyetê de dikeve herbê. Piştî serkeftina vî ya di herbê de, dewlet wî dixe rêxistina istixbarata Sovîyetê û ji vir jî bilind dibe û dibe serokê îstixbarata Sovîyetê ya beşa îranê. Wezîrê Nadirî di 26/11/1946an de ji alîyê hêzên tarî ve tê kuştin. Vê gavê gora wî li Erîvanê ye. (Jîyan, 2014; 1).

#### **Berhemên wî**

Giringtirîn kitêba perwerdeyê ew e ku Wezîr ji bo xwendekaran nivîsandîye û ji alîyê wezareta perwerdeyê ya Ermenîstanê ve biryar li ser hatîye dayîn ku wekî kitêbeke çavkanî di xwendegehên Kurdî de bê bikar anîn. Ev kitêb bi vê navê hatîye weşandin: “Zimanê Kurmancî –Zimanname, Rastnivîsar, Axaftina Xeberdanê. Ew ji alîyê Mînistirya Ronayî Ermenîstanê hatîye pesend kirin”, li Êrîvanê di sala 1947an de hatîye weşandin. (Xeznedar, 2016) Bi giştî berhemên wî ev in:

1. Berevok: çîrok, gotar, poema, helbet: di rêya taze da hatine weşandin. Di 2009an li almaatayê, Kazaxîstanê hatîne weşandin.
2. Reva Jinê, Tîatro; 1935 Erîwan.
3. Nûbar (helbest û çîrok): 1935, Erîwan.
4. “Zimanê Kurmancî, Ziman-name, Rastnivîser, Axiftina xeberdanê”, du salan di dû wefata wî da 1947 li Erîwanê bi herfên kirilî hate çapkirin.
5. Weten û hezkirin: 1961.
6. Dastana Nado û Gulîzer: Hatîye çapkirin. Dastana evîna Nado û Gulîzarê ye ku herdu li herba cîhanî ya duyemîn da li dijî Elmanîyayê şer dikin.
7. Dîwana Melayê Cizîrî, Ev xebata wî ya doktorayê ye. Ji ber ku di wan salan da çûye eskerîyê, nehatîye çapkirin.

Kurte çîrokên wî di berhemê bi nave Nûbar (helbest û çîrok) de û bi zimanê Kurdî û bi tîpên kirilî hatîye weşandin. Ev berhem di sala 1935an da ji aliyê “Neşra Hikumeta Ermenistanê” û di bin nave “Sêkesîya Kitêbên Kurmanca”, li rewanê hatîye çapkirin. Redaktorê çavdêr yê berhemê Casimê Celîl û temîzkirin jî ji aliyê wezîrê Nadîrî ve hatîye kirin. Ev berhem ji du beşan pêk tê ku beşa yekem çîrok in û beşa duyem jî helbest in. Beşa çîrokan jî ji 7 kurte çîrokan pêk tê û em dê li jêr amajê bi wan çîrokan bikin:

1. Çaxirbegê da.
2. Rêwîtiya Min.
3. Dardar şro dikir.
4. Berê Kurê Koso paşê Zekî.
5. Elî û Dîlber.
6. Ber Çetiniya Huner.
7. Xebata Dewrêş (Nadirî, 2016; 14).

## Çaxirbegê da

Gundê ku em lê diman, welatê romê, li ber devê gola Wanê bû. Gundî zûdebû kevçenê gund da gelek karêzên avê, yekî anîbû nav çung, kiribûn kanîyê lolekirî û derxistibûn. Meger çîman, bax û çend heb jî golên bi dest çêkirî hebûn. Li ber wan gulan çen heb açên sêçar çevî dixebitin. Fêza gund, alîyê koçika axê, kelefekî aşê bû, hebû. Wekû berê bi qeweta bê ji mala axê ra hatibû xebatê.

Gund da, helek jêmayînêd fîdala jî mabûn. Kela kevirî; gemîyêt mezin yên li ser behrê, rîzyatî sekinî mabûn. Hemû yekî, bi destê gundîyên xebatkar bi qeydê bêgara axa hatibûn çêkirin. Çêkirina wan wekî xebata gelek pale dixwast lê eyan bû, wekû gund da çiqas axa, dewletî hebûne, ji wan zefittir jî kesîb; çemku rast e, nav gund da xanmanê bilind, tewlê mezin, hesrê fireh, kadîne dirêj hebûn. Lê xanîyê kuxtîkî, tewlê çûk, nolanî kuxtîkê mirîşkan, du caran qasî wan bûn yên ussa jî hebûn. Wekû merîya bikaribû rewe ser pîyan.

Nav merzel da hebûn, qebir, yekî ser kêlekê wan e neqşandî, dora wan e hezkirî û li ser wan kompoze çê kiribûn. Hinde qebir jî bebûn ku qebrê ser kêlekê wan yê katî, dorê wan e vekirî. Tirbê helişîyayi, heywan ser ra diçû, dihat.

Bîra min tê wekî nav merzel, berqebra axê gundî berê, Hesen Begê Millî, dareke gûzê hebû, gundîyan vê çaxê jê ra digotin dara meşur. Ev dar ji bona gundê me zîyareteke kevîj bû. Wekî her sond û înakirina wan, bi vê bû. Çawa ku xwe da miqetî ji darê dikir: xwelîyê bi fisfor, wala dikirin dora vê û av didan. Ji vê xwelîkirinê jî dar zehf mezin û her belgeki vê weke destmaleke ser desta bûbû. Belgê vê, kevin û taze ketibûn ser hev û bida wek erduyê sê malan jî zivistanekê, darê kevin hebûn. Bi gotina rûsipîyên gund, “kê darê vê bişevitanda, bêşkendanan, waymîş nedibû û bi berpêya xwe nedidût”, Lewma jî kesê taqet nedikir û ser darê da nediçû. Gava ku hesenbeg kurê Eyub begê dîya wî ji mala şêx dewerêş bûye; vê malê ji mare çûlê girtine û anîne mal, hînî qayde, qanûnan kirine.



Gund da hesen beg bixwe jî mirovekî “zefadil” wekî gund da yekî destdirêjî kirîye, yanî tişteki yekî birîye; hesenbegî dest xwe ra emrî ser xulaman kirîye mala wî talan kirîye, ev kuştine û kulfeta vê jê standîye firotîya yekî din. ‘lewma, çaxê mirîyê li ser qebra wî şev sê çar çîra veketîye. Û salekê şûnda ev dara gûzê şîn bûye’”

...

Li vê derê, çendekî man, lê ebarû min jî dest zîyaretvanîya, nedibû, ewana kerîyê pez dianîne binetara vê, didane mexel. Hinek heldikişîyane ser zîyaretê hinek jî nevêr bûn, diman li jêr, xwarin çê dikirin, min jî xwe dabû ber hesarê, bin pelekî da rûniştibûm; sewa min nevînin. Eh, ussa jî nave, her ro li çola tî, birçî, nolanî, merivê beyanî. Xeft lazim e ji bûna azabûnê, min got û îdî nolanî jî canê xwe derbaz bûya, min dest bi xevatê kir. Ez êdî nêzîkî zîyaretçîya dibûm. Min bi wan ra bi forma zîyaretvanîkî xeber dida û caran jî derheq gundê me têlîyê ji wan dipirsî. Gilî dianî ser zulma hesenbegî wekî anîbû serê kasîbê gund xeber dida.

Min, ji zîyaretvanîyê derheq li rewanê teşkîlbûna teşkîlata xebatçîyan, miqabilî aqan û began e jî bihîst. Yek jî min bihîst wekî çar hevkesîb li şeharê Wanê hatine girtin û gulle kirin. Dîsa bi fesadîya axa. Ji vê jî ez rabûm bi qilîxê belengaza hatime gund. Bi rojê, min û têlîyê me hev dît û gillî kire yek. Wekî êwarê Arifbegî jî bikujin û ji vê jî birevin. Herin welatekî din, têkevîne nav teşkîlata pala. Bi wan ra jî bixebitin, bûna azadîya xwe.

Êwar bû. Gûndî, seteqrî; tenê dengê guzeguza rûvîyekî dihat ku sancûyî bûbû, hatibû fêza gund dikire zûkezûr, se pê di rewîyan, ewta'ewta wan bû.

Me, dil û cigerê xwe tev anî û em ber bi mala beg çûn. Dest min da jî tenê kêrek hebû. Lê têlî destwala nîn bû. Evê, baltê bavê xwe yî tûjî hildabû. Em pê ra gehiştîn. Her bûyîna bîra min tê min dît ku têlî ber stûya kirasê min diqelişe û mal da jî bûye xîre xîr û, merî destpêyên xwe dikutin.

De te beg kuşt, nin jî kur, berev têlîtê digot: ê xwe da çîya, benîya; sawa çûna welatekî dinê. (Nadirî, 2016; 21-33).

### **Şîrovekirin**

Çîrok xwedî fromeke hevgirtî ye. Rêza bûyeran pir bi zelalî tîn ziman. Lê awayê vekirina bûyerê pir xurt e. Karakterê serekî hêdî hêdî pirsra çîrokê (meseleya gûzê) mezin dike û li pey bersivan digere.

Çîrok bi wesfeke xwezayî dest pê dike, lê belê di vê wesfê de hewl dide ku xwezaya mirovî jî temsîl bike (minak gemîya rizyayî). Çîroknivîs hizir û bawerîyên olî pir bi zelalî tîne ziman û amajê bi pîroziya cih, war û tiştên dîrokî dike. (mezar û dara gûzê) her wisa bandora bawerîyê li ser pîrozîyê wesif dike. Ji aliyê din ve bi pênuşeke rengîn kevneşopîyên Kurdan (weke xwedîkirina maran) tîne ziman.

Karakterê sereke xwedî taybetmendîyên balkêş e. Vekoler e û ji sedemê bûyeran digere. Peyama serekî yê nivîskar ev e ku pîrozîyê bide berxwedana gel û re'yetê li beranberê axa û began. Dixaze bêje ku azadî tenê bi tiştêkê pêk tê ku ev jî jinavbirina desthilatdarîya mîr û beg û axayan e.

Herî dawî bi kuştina axayî çîrok diqete lê belê azadîya ku nivîskar di mêjîyê xwe de û di nava çîrokê de wêne dike pêk nayê an mirov dikare bêje ku azadîyeke wala ye. Ji ber ku li gor hevoka dawî karakter mecbûr dimînin ku welatê xwe bihêlin û biçin welateke din.

### **3.5.9 Sîras (1902-1983)**

Sîras (Himayag Sahahî Vosganyan) nivîskar û zehmetkêşê rewşenbîrîyê Ermenî yê komkara Ermenistanê ya sosîyalîsta yekîtîya sovîyetan. Di 15ê reşemeya 1902yan de li zêdkana qerekilîseya Bakûra ji dayîk bû. Di sala 1914an da, bi malbata xwe ra koçî tîflîsê paytexta Gurgistanê kir, li vir, dest pê kir di çapxaneyekê da karê tîprêzîyê kir.

Sala 1921ê, Sîras li Erîwana paytextê Ermenistanê akuncî bû, di navbera salên 1922-25an da, di fakolteya dîrokê da xwand; di sala 1924ê da bû endamê partîya komonîst ya yekîtiya sovîyetan, di salên 1928-28an û 1933yan de, di kovara Panvorê (karker) de edîtorî kir. Nivskêr di 1932yan da ji enistîtûya rojnamevanîyê ya Moskovayê kote kir û di navbera salên 1938-39an da di kovara Soveydagan kiraganityûnî (Wêjeya Sovîyetê) ya mehane wekî edîtor xebit Wî di navbera salên 1938-41ê û 1946-48an de ji serokatîya desteya rêveberîyê ya yekîtiya nivîskaran a Ermenistanê kir. Nivîskar û zehmetkêş Sîras, di navbera salên 1941-45an da, di henga şerê cîhanî yê duyemîn da tevî şer bû. Piştî şer di navbera sakên 1954-57an da dîsa edîtorîya Sovedagan kiraganityûnî Kir.

Sîras di sala 1968an da bi payeya zehmetkêşê rewşenbîrîyê yê komara Ermenistanê yê sosyalîst a yekîtiya Sovîyetan hat pero kirin.

Sîras cara pêşîn di serê sala 1920î de bi kurteçîroka xwe ya bi navê Yeratsogh, Gatsan (Beroşa ku dikele), ve di meydana wêjeyê da hat xuyanî, di dîv re jî di sala 1922yan de, kurteçîroka wî ya bi navê Talisman, (Tilisme) hate weşandin. Çîrokên gelerî bala sîras kişandine. Di 1934an da berhema wî ya bi kurmancî ya bi navê Memê û Eysê bi navê xwe yê nivîskarîyê (H. şeva reş) û di sala 1936an de, dîsa bi kurmancî ya bi navê Letîfe hate weşandin. Kurte çîrok û çîvanokên wî, di sala 1934an da di jêr navê “Gîyanekî Garodî” (Bêrîya bo jîyanê) wekî pertûkekê hate çapkirin. Lê belê ji vê yekê zêdetir romannûsiya Sîras li pêş e. Jîyana berîya şoreşê, şoreşî jîyaneke civakî û bi dab û nerît bi alîyên xwe yên berbiçav dibine mijarên romanên wî. Di 1931ê da, romana wî ya bi navê Hartsîrek Nrants (ji wan bipistin, Moskova) hate weşandin, bi dîv re jî ev romana wî di 1954an da di awayê xwe yê berfirehkirî de bi navê Nakhorîgîn (Roja çûnî) hate weşandin Romana wî ya bi navê çikirwadiz ornek (Qanûna nivîsandî, 1936) peywendîyên mirovan ên pergala sosîyalîst a bi şoreşê ra hatî ji xwe re dike mijar. Wî ev romana xwe di 1940î de berfireh kirîye û bi navê anahît daye weşandin. Wî di 1947an de romana bi navê Hayîryevortî (bav û kur) û di 1950yê da ya bi navê Ararat nivîsî ye ku mijara wan şerê cîhanê yê duyemîn û Ermenistan e ya ku tevî vî şerî bûye. Çîroka dîrokî ya gelê Ermenî yê sedsala 20an yê têkoşana wan ji bo ku jîyana xwe ji nû ve ava bikin, mijara romana Sîras ya bi navê Hayreni Aşîkar (cîhana bav û kalên min), ya ku wî di

1974an de nivîsî ye. Bi pertûka xwe ya jînenîgerî ya bi navê Camanagî Hankoytisnîr (çivangehên demê, 1982) ve ji heman hestan û heman hemayê ji xwe ra dike mijar.

Sîras her wisa bend û çîrokên zarokan jî nivîsîye. Berhemên wî bo zimanên çikî, firansî, ingilîzî, Farisî û gelek zimanên din hatîne wergerandin. Sîras di saxîya xwe de xelatên rûmetê yê wekî ala sor ya kedê û stêrka sor vergirtîye.

Sîras nivîskar û zehmetkêşê rewşenbirîyê di 14yê rezbera 1983yan de li Erîvanê mir (Sahagî Vosganyan, 2012; 4-5).

### **Letîfe**

Gava ku mele li ser lêva mizgefta qomkî ye kevin tar girtibû, cara paşîn xwe giwaşt, bang da, xeberên paşîn ji gewrîya wî firîyan, gava ku îslamên dînbawer rûyê xwe yê tefşîkî hin nekirî, bi tîmarkirin dilezandin hindirê mizgeftê, hema vê çaxê tenê Serdar xan bû wekî vê rojê nexwast ne li azana melê guhdarî bike, ne jî li îslamên dînbawer binihêre, yê ku dilezandin hindirê mizgeftê.

Agir ji sifetê wî dibarî, kefa seyê bi her dev ketibû, çavên bizoqî ji kurtikan derkeftibûn, firîyabûn, tepa li serî notila hirça birîndar di herema jinên xwe de deçû û dihat.

Li vê derê, bi sîrê sekinîbûn, heşt jin di nava panzdeh salan da wî yek bi yek bijartibûn. Her yek ji wan helbijartibû bi şewata xwe, bijatribû bi erenûsîya xwe, bijartibû bi şikl û şiwatê merivê rojhilatê û vê gavê wî li ser her yekî ji wan dinihêrî çawa li eşya, yan haceteke xebitandinê yê ku bi hebûna, wî miqîmê destnedayîne bûn û çawa ruhber ev borcdar bûn, wekî fam bi ken nêta her lîptandineke wî yê ku notêla çaba dar li ber bêwar be dibûn, wisa jî ev hêsirê belengaz beşdar bûn. Bi lebitîn wîsa, çawa ku kêfa wî dixwaze. Û li serê alçax lê bi çavên hazir û şeng heşt jinan di binê birîyan ra kirr û lal sekinîbûn û bêhna xwe didane çûyîn û hatina Serdarê har.

Heşt jin, Serdar gav radihiniştin, û dijmart; yek, dudu... heta heştan. Heşt jin, heşt gûgerçin. Çavên yekê notêla kormek agir dişixulîn. Wekî dikaribûn di şewa reşê de îşq bidin çarnikal. Çavên ya din hêşîn bûn, notêla bîrên îranê ye kevin e bêbinî; yek def û lêve şekirî bû, Yek torîn û nazik bû, notêla gula taze bişkok dayî, ya din notêla lal û dor bi rojê re pirlêmîş dibû, yek gugerçina li ser zinarên Gerîdaxê bû û ji gişkan bêhna cinetên diavêt.

Serdar li jinan dinihêrî û çiqas zehf dinihêrî, ev qasî kela wî tijî dibû, hêrs lê gurr dibû.

Çiqas bedev, nazik û delal bûn ev her heşt jin çiqasî mirov hewes hijmekar bû, li bejn û bala wan gugerçinan binihêre, evqasî bêçûre bû. Serdar bi qetlê tijî di xwe da dikelijî, dil û dînê wî li ber hev nedida.

\_ Kanê Letîfe? Ev çawa revî ye? Kê komek davê, erê, tu nizanî? Tu jî? Tu jî nizanî? Nizanî, tu jî nizanî? Erê ez fam dikem. Dijminatîya we gişkan bi min re heye, her yek ji we di dilê xwe de şiklê yarekî xweyî dike. Dibe ku we qelîştoker di derî da dîtîye. Notêla pişikên cendekê we diteve û di vê qelîştoka heyî re, erê! Zîrar tune...

Serdar xeber dida bi hucet û bi kela tijî, ha çavê xwe dikuta, vê jinê, ha jina din û careke din notêla seyê har diçû wî serê heremê, vedigerîya serê din.

Ji du roj pêşda ji herema Serdar xan revîya bû, jina wî ya nihan, Letîfe: Ev ji wan her heşt jinên wî yê din cihiltir û bedevtir bû. Temam çar mehan ve qîza şanizdeh salî li ber ruhê xwe dabû. Li ber zulm û zora Serdar teyax kiribû. Çî û balgî pê kiribûn; exîrîya paşîn revîyabû. Çawa revîyabû, bi kîşan alî ve revîyabû. Serdar pê nezanîbû zelal bike.

Wî vê seetê serê sê dergehvan jinan da lêxistin, paşê bi çar alî ve casûs; bi vî alî vî alî ve şandin, Lê ev casûsê wî temam bi şûnde vegeerîyan, yekê jî tu salix û silûx neanîn.

A wiha ev qewimandina han bû, wekî ji hed û hesab der Serdar har kiribû, hema ev bû me'ne, wekî Serdar kela xwe di wan her heşt jinên xwe yên mayîn de dirêt, notêla seyê har, ha holkomî vê jinê dikir, ha ya din...

Vê gavê wî ji hezkirina wan a yekê bawer nedikir; li ber girîna wan ji hezkirina wan qeder û sîyaneta wan ji Serdar ra dikir û digirt. Li ber çavên Serdar gişik qelib xwanê dikir, li Serdar eyan bû, wekî ev wan lavayî dikirin ji tirsar ruhê xwe, ji zora kolmê.

Vê fikirê ji hed û hesêb der kela Serdar tijî dikir, hêrsa Serdar bibû hêrsa xinzîrê beyanî.

“Di herema rojhilat da, heskirin tune, hezkirin nikare hebe jî li vê derê, li kêderê ku bî qeyd e û zor û zilm e, li kuderê kelrêtina heywanetîyê heye, li kêderê merev wisa li jinê dinihêrin, çiqasî ku ferz e bo kêfa wan, li cihê wisa helber ku vê hezkirin tune ve”.

Hizirkirin, ev ne'mete tebîetê yê delal gul dide di gundan de, di paşîla mexloqatê xebatçî da ye ku diçilmisî bi destê zorê û zilmê, vê gavê Serdar dixwest yêke wisa, wekî bi dil û riza serê xwe dayîne ber rihîna wî, neku ji tirsan, bi rastî jî bi dil û riza, wî li wan her heşt jinên xwe nihêrî, di nava wan de nedît yekî wisa, wekî çawa Serdar dixwest wisa jê hez dikira, û Serdar cardin di nava herema xwe da çû û hat, li ser textê rûnişt, panîyên xwe danîn binê xwe, tijmî ji destekê avêt destekî din û wiha wekîland:

\_ Simîzer, nazik were!

Ji nava koma jinan bi pêş da hat, jineke çav û birû belek, porê reş notêla qeytana dora kîsan, çapîk û çeleng, mirov hewesa hijmekarê vê bejn û balê,qaş û qeleman bû, jin li ser peçîyê pîyan nêzîkî Serdar bû; kirasê qînawîs ancax serê memkan girtibû, wisa ber bi jêrê ve peya dibû, heta mûyên herem te qey digot horî û melek e, bi wî terzî wekî çavên benî adem pê diket vê ji xwe ve biçûya, dil û îman pê ra nediman;

Simîzer nêzîkî Serdar bû, çûng da erdê, pêşa çoxûyê xweyîyê xwe ramûsand.

Serdar destê xwe bir nava porê qeytanî notêla hawrîşm, serî tîmar kir, paşê bi çenê girt, serî bilind kir û li çavên gugerçînê nihêrî. Serdar bi temamîya qeleferê xwe ricifi.

Jê pirsî Serdar:

\_ Tu ji kî hez dikey?

\_ Li jorê xwedê, li jêrê xweyîyê min, xanê min, yê ku ez hêsîra wî me, yê ku ez di oxira xwastinên wî da sekinîme wekî taqe dikim lêvê çixuyê wî ramosim.

Wekiland simîzerê û carek din pêşa wî ramûsand.

Serdar xêlekê rûyê xwe yê temîşkî tîmar kir. Serê xwe hijand. Bir û anî û li serê, yek bi yek ev pirsyara han ji wan kir, çiku dabû Simîzerê.

\_ Na! Na!

Bo herimîna Serdar.

\_ wê jî, Letîdeyê jî wisa, gandî wisa sond dixwar, lê ev rewîya, erê, rewîya... hûn gişik jî xeberê ji dij divekilînin...

\_ Hêr! Sahîb! Berdestî!

Sahîb notêla pişikîkan tevlebazek da xwe, hat li ser fêza jinan sekinî, guhên xwe digirt, li hêvîya hukmê xweyî xwe sekinî.

Xeber da xan...

\_ Sahîb, wan her heşt jî bibe here di otaxê li pişt emareta min de bicî bike, vê seatê bi kevîran û herîya qevîn ekûj bike û pêncereyan bixetimîne, wisa wekî tîrêncavê nede ser wan, heta şeş mehan gerek ev rûyê rojê nebînin, şeş mehan teman!

\_ Xeberên te zagon û qanûn in xan; xweyî û xwedanê mezin ji îro û şûn da hida tav nade ser heşt xaniman.

\_ Lê hûn çi dibêjin? Gelî xaniman!

Pirsî Serdar.

\_ Sozên te zagon in, xan.

Berê ewil wekiland simîzerê û li pey vê heftên din.

\_ ji îro şûn de diha li rûberê dinyayê tav nazeriqe. Pence nade.

Û gawa ku Serdar ji qirara xwe razî bû li ser pê, cardin tizmî ji destekî avête destê din, vê carê kobar û mêrxas dîsa li nava heremê kete seyrangê, çû û hat. Sahîb heşt jin dane pêşîya xwe, ber bi otaxa nîşandayî bir. Welî biqetîna hukmê xan.

...

... Serdar ji herema xwe derket, ji cineta esmanî têr bûyî, lateke wisa çenitî ter bûyîm wekîm tayê vê deneyê û xelatên degme di ceneta mayîn da hebûya. Gava ku Serdar gihişt sivderê, sehabîyê jinên wî nêzikî vî bûn, serê jê re danî, temena bû, elam kir:

\_ Rebê min, çend deqe bi pêş da Simîzer wefat kir. Vê sê caran tîrêja tavê tewaqe kir û min her sê caran jî tewaqeya wê bi şûn de da. Nehîşr rûyê tavê bibîne bo temîna ku te li min kiribû.

\_ bi min ra xeber de, bi tenê derheq saxan de!

Bo herimîna Serdar, nexwest kêfa kirî perîşan bike.

\_ her heft xanimên din jî gelek tewaqe dikin wekî wan derxin dunyaya ronak.

\_ Ev çi hukmin der tîn ji wan lêvên te yên gamêşî?

Ji Serdar tewaqe kirin ne lazim e! Serdar bixwe dizane wekî ev yek çi wext lazim e.

...



Û Letîfeyê cift kir ser pencereyê.

\_Bisekine, tu dîn nebûyî qîza bê fam!

\_ na ez, ez vê gavê ji hemû caran aqiltir im!

Û Letîfeyê hicûm kir xwe ji banê heremê da kavkî bike.

\_ Sebir bike, tu çendirmişî nînî, mirin li pêşîya te ye.

\_ Bi vê de, emir li pêşîya min e. Mirin? Belê mirin...

Lê ez dixwazim bimirim, di azayîyê de, di nava bêhna temîz da, ne li kêlega te bi vê bêhna herimî, bila meytê min bibe xurê teyran û tûyan, xurê mişkan û maran, lê bila lêvên Serdar û herem nêzîkî min nebin. Bihêle ez bibim xwelî di naba bêhna aza de. Û bila ev xwelîya ku ji cenazeya min çê dibe tevî vê xwelîyê bike, kîşan ku cenzazeyê mensûrê min teve, ji vir û wisa destê Serdar nêzîkî min nebe. Bi vê de! Bi vê de! Nêzîkî min mebe! Di nava tebîetê de, menzelê min fireh e, gelekî vê fireh be, ji xwe notêla vê tabota me rêve sax nîne. Notêla wî merzelê genî nîne. Letîfeyê vekiland cara paşîn ev xeberên han bi kînî û kelê tijî, Serdar bi vê de dehif da û xwe ji bane heremê de kevî kir ber bi gilî, heta devê Zengûyê. Ji banê vê kela biling heta ber cemê Zengûyê termê Letîfeyê î nazik di nava hewayê de çend caran teqle da, kirasê qinawîz di nave hewayê da verba bû, çava xelîçeya xwanê ye sehrê û Letîfe çû li zinaran û qefeyan ket. Di serê hev de hincirî, derem bi derem.

Dibêjin, wekî ev mirevên ku hay ji derketina Mensûr û Letîfeyê hebûn. Di exîrîya paşîn de weselên cenazeyên Letîfeyê, ku pîrepîryî bûnûn, dîtin, berhevî serhev kirin û bi dizî Serdar ve birin. Li ber devê herqê, di tirba Mensûrê da kirin çal, li ber devê vê helqê ya ku Serdar çê kiribû bi destê zorê Letîfeyê bixwe bide hezkirin, lê hezkirina dilê vê biçirmisîne, bike binê panîya xwe. (Sahagî Vosganyan, 2012; 23-53).

### Şîrovekirin

Nivîskar her ji destpêka çîrokê da bi temamî bala xwînerê xwe dikşîne ser naveroka çîrokê û vekirineke jêhatî ji bo babetê sereke yê çîrokê dike. Vir pêve wesfa karakterên çîrokê dest pê dike bi awayekî ku mirov dikare leheng û serlehengên çîrokê bi başî nas bike û taybetmendiyên wan yên derûnî binase.

Çîrok amajeyeke tal li serdestîya mêr an ku mêrsariyê dike û zilm û zora Serdar bi awayekê neqîş dike ku dibe mînaka civaka ku têde dijî. Nivîskar di diyalogan da ji taybetmendiyên resen yên karakteran dernakeve û ev diyalog û hevok û peyvên tîz ziman tam li gor kesayetîya lehengan e. Weke mînak di beş yeke ya çîrokê da Serdar tu peyvek ku dilovanîyê nîşan bide naîne ziman.

Nivîskar bi çaveke rexneyî li civaka Kurdî û rêsa û yasayên vê civakê dinêre. Rasterast jî di nava çîrokê da zimanê rexneyê bikar tîne. Balkêş ev e ku hest û têna agirê kerb û kina Serdar ev qas mezin dike ku ci cih ji bo hestên din yên mirovî nahêle.

Di dawîyê da jî bi nîgarkirineke tal çîrokê bidawî tîne û lehengê pêşîn an ku Letîfe xwe dike. Lê kesayetîyê Letîfê weke berxwedêrekê wesif dike li hemberî zilma Serdar. Jina ku ji bo parastina evîneke rastîn serê xwe li ber hewes û nîyetxirabiya Serdar natewîne û xwe dike.

## **ENCAM**

1. Ji encamê vê vekolîna di destê me de, destpêkê ji bo me derdikeve hole ku jîyê çîroka honerî ya Kurdî li destpêka sedsala 20an dest pê dike, digel derketina rojnameya Rojî Kurd li Stenbolê.
2. Herweha di vê vekolînê de bi ronî û aşkirayî ji bo me diyar dibe ku çîroka honerî ya Kurdî li destpêka serhildana vê, heya niha jî, ji nava cergê jîyana milletê Kurd ser hildaye, bêyî ku layen û mijar jêre girîng be û her wisa ji sirûştê milletê xwe dûr neketîye.
3. Ev vekolîne xaleka giring berçav dike, ew jî zalbûna şewaza siruştî ya rexnegirane ye li ser çîrokan da. Lê wesa xuya dibe ku ya herîzaltir li ser

naveroka çîrokê, ew jî naveroka sîyasî, netewayetî û civakî ye. Zal bûna wan du layenan li ser naveroka çîrokê sirûştê çîrokê dûpat diket.

4. Divê vekolînê de em gehiştîne cê encamê de ku di nava vekolînên çîroka honerî ya Kurdî de zêdetir arêşe dihêne dîyarkirin lê çareserîya wan arîşeyan nahête dîyarkirin.
5. Di ve vekolînê de ji bo me dîyar bû ku çîroknivîsan gelek tabloyên bi êş û azar anîne ber çavên me ku jîyana milletê Kurd didete nîşandan û li gor şarezahîya nivîskarên çîrokê bi şêweyên çuda hatîne nîşandan.
6. Serçaveyên binemaya çîroka honerî ya Kurdî, ne bi wergirtin ne bi veguhastina rasterast ya çîroka bîyanî ye û ne bi lasaykirina berdewam li hîkayetên millî û babetên fulklorî ve nehatîne wergirtin, belku binçîneya serhildana binemayan bi sûdwegirtin ji herdu serçaveyan, an ku hîkayet û fulklora Kurdî û taknîka çîrokên bîyanî.

## ÇAVKANÎ

- Abdialla, A. X. (1986). *Alneqid altetbîqî altehlîlî*. Bexdad: Aldar alşiûn alseqafiye alame.
- Abdullah, M. A. (2005). *Şakes la Rumanî Kurdîda \_ Kurdistanî Îraq da (1990\_1997) Nama Masterê*. Hewlêr: Kulija Adab, Zanîngeha Selahedînê.
- Agrîn, E. (1999). *Karîgerî Birî Neteweyî Le Geşesendîni Kurte Çîrokî Kurdî Kurdistanî Êraq Da 1961\_1970*. Hewlêr: Çapxana Zanîngeha Selahedînê.
- Al Cizîrî, A. (2000). *Aledeb Şefahî Al Kurdî, ç1*. Beyrut: Kawa Al Seqafe Al Kurdîye.
- Al Helaq, M. R. (1999). *Alnis u Al Manie\_Miqaribat Neqdîye fî Eladeb u Al Îbda*. Dîmeşiq: Menşurat Itihad Al Kitab Al Ereb.

- Al'anî, Ş. M. (1994). *Albîna Al Fenî fî Al Rîwaye Al Erebiye fî Al Îraq*. Bexdad: Dar Al Lşîûn Al Seqafîye Al Ame.
- Alî , T. M. (1991). *lêkulînewe le Çîrokakanî Hisên Arîf, Nama Masterê*. hewlêr: Zaningeha Selahedînê, Kulîja Adabê.
- Alî, H. M. (1958-10-28). Abî Mihemed Alî Kurdî. *Al Iraq*, 2962.
- Alî, H. S. (2000). *Şiwên le Romanî Diz da,*. Hewlêr: Dezgay Roşenbîrî û Rageyandinî Gulan.
- Alibêdî, C. A. (2012). *Atbat Al Kîtabe Alqesesiye Dirase fî FBlaxe Al Teşkil û Al Tedîl*. Surîye: Temuz Lîl Tebae û Al naşir û al Tewzî.
- Alwenî, N. X. (2008). *Karekter Sazî Laromanî Êarey Perwaney Baxtîyar Elî da*. Hewlêr: Çapxaney Mokiryani.
- Alzewahire, R. B., & Alteamine, Ş. E. (2006). *Fen Qise Qesîre*. Eman: Beît Al Efkar Al Diwelîye.
- Arîf, H. (2011). *Çîrokî Honerî Kurdî 1925\_1960*. Hewlêr: Çapxana Aeras.
- Asîhî, L. (2008). Cavpêkeftin Digel (Celal mistefa). *peîv*, 44.
- Aşina, U. (2001). *Pîremêrd Û Pêdaçûneweyekî Niwêy Jiyan û Berhemekanî*. Hewlêr: Çapxana Wezaretê Perwerde.
- Aswed, N. A. (2011). *Ferhîngî Zarawey Adebî Û Rexneyî*. silêmanî: Brêweberayetî Çap Û Belawkirdinewey Silêymanî (Dezgay Bînas).
- Baban, C. (1975). *Cemîl Saîb Le Xewma*. Bexda: Çapxaney Kurî Zanyarî Kurd.
- Babekrî, Y. (1347). Bsî Edebî Pexşan. *Sirwe*, 29.
- Badî, i. I. (1990-Ayar). Xiwandinek di (Dîroka Çîroka Kurdî ya Honerî) da û Çend Tê Dîtinek. *Karwan*, 86.
- Bedirxan, C. A. (1932-3 Tîrmeh). Ber Tevna Mehfurê. *Hawar*, 4.
- Bedirxan, C. A. (2014). *Gazînda Xencera Min*. Stenbol: Avesta.
- Bedirxan, K. A. (1932-1Hizeran). Du Egîd. *Hawar*, 2.
- Berwarî, H. (2010). *Rêbazên Edebî*. Duhok: Çapxana Hawar.

- Berzencî, E. S. (2003). *Awêney Jînim Yadaştekanî Şkîr Ftah*. hewlêr: Rêxistin Û Lêkolînewe.
- Berzincî, U. M. (1978). *Lêkolînewe Û Bibliyogirafiyay Çîrokî Kurdî 1925\_1969*. Bexdad: Çapxana Korî Zanyarî Kurd.
- Berzincî, u. M. (2019, Hizîran 23). Hevpeyvîn Li Silêmanî Yê Liser Jîyana Çîrok Nivîsê Kurd Û Destrengîn Mihemed Alî Kurdî. (K. F. Sûrî, Rêportaj Yapan)
- Berzincî, Y. Q. (1987). Boçî Çilxiwarim Dûwem Çîrokî Kurdîye. *Beyan*, 137.
- Bîmar, E. (1998). *Pexşanî Kurdî*. Bexdad: Dezgehê Rewşenbîrî Û Bilav Kirnevên Kurdî.
- Caf, E. M. (2010). *Meseley Wijadan Yan: Çûn Bûm Be Xanedan - Çîrokêkî Kurdî Ye Pêşekî Û Lêkolînewe: Dr. Îhsan Fuad ç3*. Hewlêr: Çapxaney Araz.
- Caf, H. (1985). *Çîrokî Honerî Kurdî*. Bexdad: Çapxana Ela.
- Caf, H. (1990). *Melamih Tecdîd Fî Qise Kurdîye Hedîse, Musie Sexîre*. Bexdad: Dar Alşîûn Seqafîye Ame.
- Cefer, H. (2007). *Ziman û Edeb Û Mêjûy Kurd Di Govara (Rojî Kurd) Da Li Sala 1913*. Duhok: Çapxana Hawar.
- Celîl, C. (1985). Jîyana Rewşenbiri û Siyasi ya Kurdan (Di Dawiya Sedsala 19a û Destpêka Sedsala 20a de). *Jiyana Nû*, B.C.
- Cewerî, F. (2003). *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)*. Stembol: Weşanên nûdemê.
- Cewerî, F. (2003). *Antolojiya Çîrokên Kurdî*,. Stembol: Nûdem.
- Cewerî, F. (2019, Temuz 20). *Fûad Temo*. Wikipedia. adresinden alındı
- Delikaya, O. (2014). Çirokeke nîvçomayî: şewîş. *Wêje û rexne*, 1.
- Dewlet, M. U. (2001). *Sîmaw Xasletî Karêkter Le Kurte Çîrokî Kurdîda 1925\_1950*. Silêmanî: Berêweberayetî Çap Û Belaw Kirdinewey Silêmanî.
- Duhokî, X. (1995). *Antolojiya Çîroka Nû ya Kurmancên Beşûr*. Stokholm: Weşanên Nûdem.
- Duhokî, X. (2002-1Temuz). Dîroka çîroka Kurdî (Kurmancîya Jorî) û Rewşa Wê ya Niho. *Raman*, H-73.
- Duskî, M. E. (2008). *Ferhengî Sipîrêz*. Duhok: Dezgeha Sipîrêz ya Çap û Weşanê.

- Duskî, T. î. (1993). *Almedxel Lidîrase Al Edeb Al Kurdî Midewin Bilehce Al Şîmalîye*. hewlêr: Menşurat Ulema Kurdistan.
- Ehmed, F. (1975 eîlul). Seretay Peydabûnî Çîrokî Kurdî. *Beyan*, 29.
- Findî, R. (1983 Nîsan). Êkemîn Çîroka Kurdî. *Beyan*, 85.
- Findî, R. (1985). *Elî Teremaxî êkemîn Rêzman Nivîs Ê Pexşan Nivîsê Kurde*. Bexdad: Emîndaretîya Roşenbîrî Ê Lawan.
- Gerdî, E. (1987). *Pexşanî Kurdî*. Hewlêr: Çapxaneyê Zanîngeha Selahedînê.
- H. A. (2011). *Çîrokî Honerî Kurdî 1925\_1960*. Hewlêr: Dezgey Çap û Belaw Kirdinewey Aras.
- Hacî, E. (2005). Despêk di çîroka fuliklorî û romanî da. *Peîv*, 33.
- Heaenî, Y. (1999). Nasnama Kurdî Di Çîrokên (Enwer Mihemed Tahir)î Da. *Peîv*, 13.
- Heîderî, C. (1993). Kurteyek Le Mêjoy Lêkulînewey Pexşan Ê Çîrokî Kurdî Nawerastî Heftakan. *Wan*, 1.
- Hesen, M. E. (5/12/2006). Bînay Rudaw Le Çîrokda. *Raman*, 115.
- Hesen, M. F. (2012). *Ezmûnî Çîrok nivîs*. Silêmanî: Çapxaneyê Lerya Silêmanî.
- Hesen, M. F. (2012). *Ezmunî Çîrok Nusîn*. Silêmanî: Çapxaneyê Lerya.
- Hesen, S. M. (2004). *Çend rêyek bu deqî*. Duhok: Çapxana hawar.
- Hesen, Ş. Q. (2011). *Rolê Deqê di Avakirna Diramaya Kurdîda Nama Masterê*. Duhok: Zanîngeha Duhok\_ Fakultîya Zanîstên Miruvayê tî.
- Hewramî, H. k. (2005). *Edebî mînalî Kurd*. Hewlêr: Çapxana wezaretê perwerde.
- Hisên, H. (2001-5 Eîlulê). Newarokî Kumelayetî Le Çîrokî Honerî Kurdîda. *Raman*, 63.
- Husên, H. (2010). *Derwazeyek Bu Rexney Edebî Niwê Kurdî, ç2*. Hewlêr: Dezgay Tiwêjinewey bu Belaw Kirdinewey Mukuryanî, Çapxaneyê Baz.
- Îsmâîl, I. (1980). *Aledeb û finune dîrase û neqîd*. Bexdad: Dar alfikir alerebî.
- Îsmâîl, S. (2009). *Çemku Îstatîkay Şiwên Le Edeb da*. Hewlêr: Dezgay Çap Ê Belawkirdinewey Aras.
- Jîyan, R. (2014). *Wezîrê Nadîr, Reva Jinê*. Stanbol: Belkî.

- Kerîm, M. S. (1985 Tişrîna yekem). Seretay le Daîk Bûna Çîroka Honerî ya Kurdî. *karwan*, 37.
- Kurdo, Q. (1922). *Tarîxa Ebedîyata Kurdî*. Ankerâ: Çapxan Öz Ge, Yayinlari, Ankerâ.
- Kurdo, Q. (1983). *Tarîxa Edebyata Kurdî*. Stokholim: Weşana Roja nu.
- Melmiszniy, M. (1999). *Kûrit Teavûni Ve Teraki Cemiyeti*. Istenbul: Waşanxana Avesta.
- Mensur, E. (1999). *Bînay Honrî Lekurte Çîrokî Kurdîda 1970\_1980*. Silêmanî: Dezgehe Çap û Paxş Serdem, Çpxana Tîşik.
- Mêzgird, R. (1997-5 Temuz). Çîrok Nusanî Kurd Sebare: (( Çîrok.. Astî Teknîkî.. Ezmun Gerî.. Astengekan.. Dahatû)) Dedwên. *Raman*, 13.
- Mezher, K. (1987-30 Ab). Têgeîştinî Rastî û Şîrînî Le Rojname Nûsî Kurd). *Roşenbîrî Niwê*, 4.
- Mihemed, F. M. (2002). *Bizavî Rojname Nusî Kurdî Le Suriya 1932\_1946, Nama Masterê*. Hewlêr: Koliya Perwerde Zanîngeha Selahedînê.
- Mihemed, Î. Q. (1997). *Lêkulînewey Kurte Çîrokî Kurdî Le Kurdistanî Başurda 1970-1980*. Hewlêr: Zanîn Geha Selahedîn.
- Mihemed, P. S. (1993). *Bînay Hunerî Çîrokî Kurdî \_Nama Masterê*. Hewlêr: Zanîngeha Selahedîn\_ Kolîja Adab.
- Mihemed, T. A. (2011). *Bînay Siwên le Du Nimuney Romanî Kurdîda (Hêlane, Ajdîha)*. Silêmanî: Dezgay Çap û Pexşî serdem\_silêmanî.
- Mistefa, M. (2019, 1 1). *Nucexane*. Nucexane.wordpress.com: <https://nucexane.wordpress.com/cavderi/mire-zimane-Kurdi-celadet-ali-bedirxan/> adresinden alındı
- Mizîrî, Ş. (1989). *Çîroka Kurdî Ya Honerî*. Bexdad: Çapxana Esed.
- Muftî, P. S. (2012). *Gêranewe le Çîrokekanî Ehmed Mihemed Îsmâilda*. Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim.
- Mukrî, K. (1984). *Edebî Fuliklorî Kurdî, Beşayekê*. Hewlêr: Çapxaney Zanko.
- Nadirî, W. (2016). *Nûbar*. Stanbol: Nûbihar.
- Nawxoş, S. (2006). *Ferhengî Oks Furdî Niwê*. Hewlêr: Çapxaney Roşenbîrî\_Hewlêr.

- Nazê, B. (2012). *Ferhinga Têrmên Wêjeyî*. Duhok: Çapxana Hewar\_Duhok.
- Necmedîn, N. X. (2004). *Bînaykat le Sê Nimuney Romanî Kurdîda Janî Gel, Ser, Raz., Silêmanî: Dezgay Çab û Pexşîserdem*.
- Nihêlî, N. H. (2007). *Awazên Xamey*. Capxana Duhok: Weşana Êketîya Nivîserren Kurd.
- Nîzamedîn, F. (2002). *Ferhengî Astêrey Geş, Ç3*. Hevlêr: Dezgay Çap û Belawkirdinewey Aras.
- Omer, F. (1997). Pêdaçunek û çend rawistîyan dideqî. *Peyv*, 5.
- Osman, M. (2010). *Hizirkirin di Pirşêbn Rexnêda Vekulîn\_Nivîsarên Raveyê û Piraktîkîyê di Hêla Rexnêda*. Hewlêr: Çapxaney Ruşenbîrî\_Hewlêr.
- Pîrbal, F. (1997-25 Ab). Çîrokekanî Govarî Hawar. *Raman*, 14.
- Pîrbal, F. (2000 Eîlul). Le Pênaw Ser le Nuwê Nûsînewey Mêjoûy Çîrokî Kurdî-Kir Nolujiyay Çîrokî Kurdî 1929-1856. *Aînde*, 13.
- Pîrbal, F. (2000). *Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799\_1867 Yekemîn Çîroknûs û Pexşnûsî Kurd*. Hewlêr: Çapxaney Wezaretî Perwerde.
- Pîrbal, F. (2001 Payîz-Zivistan). Çîroka Kurdî. *War*.
- Pirêns, C. (2011). *Zaravên Vegêranê\_Ferhinga Zaravan*. Duhok: Wezaretê Rewşenbîrî û Lawan\_Rêveberîya Giştî ya Rojname Nivîsê û Çap û Belavkirnê.
- Qadir, R. H. (2006). *Çih di Romana Kurdîya Dvera Behdînan da Geryan li Babêberze û Duzexa Sipî*. Duhok: Çapxana Hawar.
- Qasim, S. A. (2004). *Bina alrîwaye\_ alzemen fî rîwaye alerebîye ,t1*. Beyrot: Almuasese alerebîye lildîrasat û alneşir.
- Qazî, H. (2005). *Ferhenga Qazî,ç2*. Duhok: Dezgehê Spîrêz ya Çap û Weşanê.
- Reşîd, F. (2007). *Deqî Edebî\_Edgar.Çêj. Beha*. Hewlêr: Dezgay Çap û Belaw Kirdinewey Aras.
- Reşîd, M. C. (2016). *Pexşan û Hunerên wê*. Duhok: Kitêbxana Cizîrî \_Duhok.
- Reşîd, S. (2001 Huzîran). Qunaxekanî Çîrokî Kurdî. *Nûserî Kurd*, 17.
- Reşîd, S. (2002). Peywendîya Dîyalêktê Li Navbera Çîrok û Foliklora Kurdî. *Karwan*, 165.



- Reşîd, S. (2005). *Çîrokî Kurdî Rexne Û Lêkulînewe*. Hewlêr: Wezaretî Rewşenbîrî\_Hewlêr.
- Resûl, Î. M. (1979). *Lêkulînewey Edebî Fuliklorî Kurdî, Ç2*. Silêmanî: Çapxaney Zankoy Silêmanî.
- Resul, Î. M. (1984). Ara fî Al Qise Al Kurdîye. *Al Aqlam*, 2\_3.
- Resul, Î. M. (1984- Nîsan). Nawerukî Sîyasî Û Komelayetî Çîrokî Kurdî. *karwan*, 19.
- Resul, Î. M. (1997). Çiroka Nû Ya Kurdî. *Havîbun*, 1.
- Resul, Î. M. (2010). *Al Waqîe fî Al Edeb Al Kurdîye ç2*. Hewlêr: Dar Aras Lîl Tabie û Al Neşir.
- Resul, Ş. (1989). *Edebî Kurdî û Honrerekanî Edeb*. Hewlêr: Çapxana Xiwûndinî Bala.
- Resul, Ş. (1989). *Edebî Kurdî Û Hunerekanî Edeb*. hewlêr: Çapxana Xondinî Bala.
- Resul, Ş. (2005). *Teknîkî Gêranewe Le Çîrokî Marîf Berzincî Da*. Hewlêr: Çapxana Wezaretî Perwerde.
- Reuf, H. (1978). Seretay Çîrokî Kurdî Û Cîyawazî Nêwan Yekem Û Dûwemyan. *Roşanbîrî Niwê*, 69.
- Sahagî Vosganyan, H. (. (2012). *Letîfe*. Ankara: Lîs.
- Salih, S. R. (2005). *Şêwaz Le Kurte Çîrokî Kurdî da*. Silêmanî: Çapxaney Wezaretî Rewşenbîrî.
- Salih, S. R. (2010). Kilasîzim Le Çîrokî Kurdî. *Ekadimî*, 16.
- Salih, S. R. (2010). Kilasîzim Li Çîrokî Kurdî. *Ekadimî*, 16.
- Salih, X. (2010). *Kurte Çîroka Kurdî li Devera Behdînan 1960\_2005*. Duhok: Êkrtîya Nivîserên Kurd.
- Sebrî, O. (2017). *Li Goristaneke Amedê*. Dîyarbekir: Lîs.
- Sebrî, Z. R. (2010). *Çîrokî Mindalan le Edebî Kurdî da 1991\_2005*. Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim\_Hawlêr.
- Secadî, E. (1952). *Mêjûy Edebî Kurdî*. Bexdad: Çapxana Mearif.
- Secadî, E. (1978). *Deqekanî Edebî Kurdî*. Bexdad: Çapxana Korî Zanyarî Kurdî.

- Secadî, E. (2000). *Mêjûy Pexşanî Kurdî*. Hewlêr: Çapxana Wezaretê Perwerdê.
- Sedîq, A. (2009). *Nawnîşan le Çîrokî Kurdîda*. Silêmanî: Çapxaney Karo.
- Sedîq, A. (2011). *Despêk le Çîrokî Kurdîda Hetakan û Heşatakan Wek Nimune*. silêmanî: Çapxaney Yad.
- Şêlazî, C. M. (2005). *Çîrokên Millîyên Kurdî*. silêmanî: Înistuta Kelepura Kurd Çapxaney Şivan.
- Siwarî, M. S. (1989). Danustandin di Çîroka Kurta Kurdî da. *rewşenbîrî Niwê*, 23.
- Tahîr, . M. (2000). Çend em Berek Şaristanîyetê û Bajêrvanîyê Bicîn Hind dê Nêzikî Romanê bin. *Raman*, 50.
- Tahîr, A. M. (1998). Rolê Govara Hawar Bu Pêş Êxistina Çîroka Kurdî Ya Honerî. *Metîn*, 75.
- Tahîr, E. M. (2008). Serburamin ya çîrok nivîsînê. *Peyv*, 47.
- Tahir, N. S. (2009). *Navunîşan Weku Nasnama Têkistê Huzanê Huzanên (mihsin Qucan) Wek Nimune Vekulineka Sîmutîkî Şiluvekarîye*. Duhok: Jiwaşanên Metîn Çapxana Hawar.
- Talib, U. M. (1981). *Aser Al Bîe Fî Al Hikaye Al Şebîye Al Îraqîye*. Bexdad: Menşurat Dar Al Cahiz Lîl Neşir Dar Al Hurîye.
- Teha, E. I. (2002). *Rengdanewey Edeb Le Govarî Hawarda 1932\_1943*. Hewlêr: Çapxaney Wezaretî Perwerde.
- Usman, N. A. (2002). *Regezê Demî Di Dastana (Mem û Zîna Xanê da)*. DUhok: Guvara Zankuya Duhok .
- Wehabe, M., & Mihendis, K. (1984). *Micem Al Lmistelihat Al Adebîye fî Al Luxe û Al Adeb t2*. Beyrot: Mektebe Libnan.
- Xalib, S. (1979). *Afret Le çîrokî Kurdî Da (1925 - 1970)*. Bexdad: Al Dar Al Hirîye Lil Tabie.
- Xalid, E. (1986). *Alneqid altedbîqî altehlîlî*. Bexdad: Dar şîun alseqafîye.
- Xelîl, R. C. (2014). *Hunerê Çîroknivîsînê Li Cem ( Nuredîn Zaza )î Vekulîneka ( Wesfî, Şilovekarî ) Nama Masterê*. Duhok: Zaningeha Duhokê \_Fakultîya Zanstên Mirovayetî.

- Xeznedar, M. (1970). Hendê le Şîrazekanî Defterî Rexnem., *Rojnama Defterî Kurdewarî*, 3.
- Xeznedar, M. (2005). *Mêjûy Edebî Kurdî Bergî pêncem 1914-1945*. Hewlêr: Çapxana Aras.
- Xeznedar, M. (2016). Wezîrê naderî jîyan û berhemên wî. *Rêya Taze*, 1.
- Yuinsî, Î. (2005). *Gulbijêrêk le Hunerî Çîrok Nusîn*. Silêmanî: Çapemenî Çuwerçira.
- Yusif, M. (1976). Çîrok çîye. *Beyan*, 38.
- Yûsiv, H. (2001). *Romana Kurdî (Kurmçî û Zazakî) 1930\_2010*. Amed: Waşana Ronahî.
- Zekî beg, M. E. (1998). *Kürt Ve Kürdistan Ünlüleri ç2*. Sweden: Apec ve öz-Ge Yayınları.
- Zeytunî, L. (2002). *Micem Mistelihat Neqid Al Rîwaye, Erebî, Ênglîzî, Firensî*. Beyrut\_Libnan: Dar Al Nihar Lîl Neşir.
- Я, П. В. (1984). *Русская Сказка*. Ленинградского: Ленинградского университета.

## JINENÎGARÎ

### Agehiyên Şexsî

Paşnav, nav : KARZAN FARHAN SORI

Nîştevan : Iraq, Duhok, Akrê

Dîrok û Cihê Jayinê : 1/03/1992 Akrê

Telefon : 00964 750 722 25 24

Faks : \_\_\_\_\_

E-mail : Karzanmarhan8@gmail.com



### Perwerdehî

#### Derece

#### Cihê Perwerdehîyê

#### Dîroka MezûnBunê

Lisans

Zanîngeha Perwerda Binyat

2016-2017

Duhok - Akrê

#### Zimanê Biyanî

Erebî



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

*LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU*

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü



26/08/2019

Tez Başlığı / Konusu

**BAŞLANGIÇTAN 1939'A KADAR KÜRTÇE SANATSAL HİKÂYENİN OLUŞUM VE GELİŞİMİ**

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 115 sayfalık kısmına ilişkin, 26/08/2019 tarihinde şahsım/tezdanışmanım tarafından %1 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 1 (Yüzde Bir) dir.

**Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:**

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

  
26/08/2019

Karzan Farhan Sori Sori  
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Karzan Farhan Sori Sori  
Öğrenci No :99779788240  
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı  
Programı : Örgün Eğitim  
Statüsü : Y. Lisans  Doktora

**DANIŞMAN**  
Dr. Öğrt Üy. Kemal KAYA

26/08/2019



26/08/2019

  
ENSTİTÜ ONAYI  
U  
Doç. Dr. Mesim ŞONMEZ  
Anabilim Dalı Başkanı